



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

## **Folklora Kurdên Azerbaycanê**

Nofal Shirinov

14711044

Şêwirmend

Alk. Doç.Dr. Necat Keskin

Mêrdîn 2017

## TAAHHÜTNAME

### TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Folkloru Kurdên Azerbaycanê**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezinin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin 1 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezinin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../.....

**Nofal Shirinov**

## KABUL VE ONAY

**Nofal Shirinov** tarafından hazırlanan “**Folkloru Kurdên Azerbaycanê**” adındaki çalışma, Savunma Sınavı Tarihi tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[ İ m z a ]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

**Müdürü**

**Onay**  
**Enstitü**

**Doç. Dr. M. Nesim DORU**

## PÊŞGOTIN Û SPASÎ

Armanca vê xebatê li ser hinek nimûneyan danasîn û teswîrkirina folklorê kurdên Azerbaycanê ye ku wek “Kurdistan Qafqasyayê” jî tê dîtin. Cih û warên ku kurd lê dijîn di serdema “Sowyet”ê de wek “Kurdistan” dihat binavkirin ku di nav xwe de herêmanên Laçîn, Kalbajar, Qubatlî, û Zengîlan dihewandin. Kurd heta salên 1990î jî li van navçeyan dijîn, lê piştî şerê di navbera Ermenîstan û Azerbaycanê de ku piştî hilweşîna Sowyetê rû da piraniya kurdan koçî nava Azerbaycanê kirin.

Di nav demên borî de kurdan, ji ber sedemên siyasî û civakî zimanê xwe ji bîr kirine û îro bêhtir bi zimanê azerî diaxivin. Her weha hêmanên çandî jî rastî asîmîlasyonê hatine û car caran ji hêla azerîyan ve wek “hêmanên çanda azerî” tên dîtin. Aliyekî girîng ê vê xebatê jî li gorî me ev e ku derbarê folklorê “jîbîrbûyî” ya kurdên Azerbaycanê bidin naskirin.

Ev xebat, ji bilî pêvekê, ji sê beş û encamê pêk tê. Di beşa yekem de ku wek “destpêk”ê hatiye binavkirin, mijar, rêbaz, armanç û girîngî û her weha pirsgerêkên têkildarî xebatê hatine dayîn.

Beşa duyem, bi kurtasî li ser erdnîgarî û dîroka “Kurdistan Qafqasyayê” disekine. Di vê beşê de me behsa dîroka kurdên Qafqasyaya pêş kiriye. Ji bo ku were zanîn ka ji ber çî em dibêjin “Kurdistan Qafqasyayê” ev yek pêwîst bû.

Di beşa sêyem de me behsa hin nimûneyên folklorê kurdên Azerbaycanê kiriye. Di nava van nimûneyan de adet û toreyên, Newroz, cejna çarşema avê, cejna çarşema agir, cejna çarşema bayê, cejna çarşema axê, cejna Xidir Nebî û lîstokek ku di cejna Newrozê de tê lîstin cih digire. Di vê beşê de adetên dawetê, merasîma ji dayîkbûne, adetên şînê, baweriyên gelêrî, nimûneyên du lîstoka û sê şano cih digire. Her wisa di nava baweriyên gel de me cih daye bawerî û nojdariya gelêrî jî.

Di nivîsina vê xebatê de keda gelek kesî heye. Lê li vir taybet ez sipasiya şewirmendê xwe mamoste Dr. Necat Keskîn dikim ku di vê xebatê de gelek ked ji bo me daye. Her wisa ji bo hin sererastkirina sipasiya hevalê xwe Nihat Gûzûn dikim. Ji bo ked û alîkarîyan wan spasîyên xwe ji bo mamoste Kadrî Yildirim, Dr. Ramazan

Pertev, Mikail Bilbil, Mustafa Aslan, Malmisanij, Cahit Benek, Ferhat Demiralp û Çetîn Taş jî dikim. Dîsa ji bo ku di her warî de alîkariya min kiriye spasîyên xwe ji bo Hêjar Şamîl Askerov pêşkeş dikim.

Her çend kêmasî hebin jî em di wê baweriyê dene ev xebat dê derbarê folklorê kurdên Kurdistanê Qafqasyayê de jî agahiyên sîdewar pêşkeş bike. Em di we nêrînê de ne ev xebatê rê ber bi gelek xebatên vî warî de veke.

Li vir ji ber hin sedeman me navên gelek kesên ku di vê xebatê de keda wan heye hilneda. Lê ez bi giştî spasîya hevalên xwe yê li Azerbaycanê dikim. Her wisa di xebatên li ser qadê de ji ber ku gelek alîkariya min kirine ez spasîyên xwe ji Dûnyamalı Memedov, Tarana Gûliyeva, Ofelya Mecide, Menaf Sêvoyî û İsmayil Kurdoglû re pêşkeş dikim.



## KURTE

Mijara vekolînê ya vê tezê Folklara Kurdên Azerbaycanê ye. hatiye vekolînkirin. Ji ber ku folklor bi dîrokê ve jî giredayi ye bi awayeki gişti behsa dîroka kurdên Azerbaycanê jî hatiye kirin. Her wisa di tezê de adet, cejn, listok û şanoya ku nimûneyên folklorê kurdên Azerbaycanê ne bi riya lêkolîna qadê hatine tomarkirin. Bi vê yekê jî hatiye xwestin ku bi riya nimûneyan folklorê kurdên Azerbaycanê werin naskirin û zanîn.

**Bêjeyên Sereke:** Folklor, Dîrok, kurdên Azerbaycanê, Kurdistana Qafqasyayê



## ÖZET

Bu tezin araştırma konusu Azerbaycan Kürt'lerinin folklorudur. Folklor ile tarih sıkı bir ilişki içinde olduğundan Azerbaycan Kürd'lerinin tarihi ile ilgili bilgilere de genel hatlarıyla yer verilmiştir. Bununla beraber Azerbaycan Kürt'lerinin folklorunu örnekleyen adet, bayram, oyun ve tiyatro örnekleri alan araştırması ile toplanmıştır. Bu yönüyle Azerbaycan Kürt'lerinin folklorunun örnekler aracılığıyla tanıtılması ve bilinmesi amaçlanmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Folklor, Tarih, Azerbaycan Kürt'leri, Kafkas Kürdistan'ı



## ABSTRACT

The research subject of this thesis is the folklore of Kurds of Azerbaijan. Since the folklore is related to history, the history of Kurds in Azerbaijan were also discussed in general. However, in this thesis, customs, festivals, folk-games and folk-theatre which are examples of folklore of Kurds of Azerbaijan were collected via fieldwork research. With this aspect, description and introducing of folklore of Kurds in Azerbaijan were objected.

**Keywords:** Folklore, History, Kurds of Azerbaijan, Caucasians Kurdistan





<b>NAVEROK</b>	
<b>PÊŞGOTIN Û SPASÎ</b> .....	I
<b>KURTE</b> .....	III
<b>ÖZET</b> .....	IV
<b>ABSTRACT</b> .....	V
<b>LÎSTEYA NEXŞEYAN</b> .....	IX
<b>LÎSTEYA WÊNEYAN</b> .....	X
<b>KURTEBÊJE</b> .....	XI
<b>DESTPÊK</b> .....	1
<b>BEŞA YEKEM</b> .....	3
<b>MIJAR, ARMANC Û RÊBAZ</b> .....	3
1.1. Mijara Lêkolînê.....	4
1.2. Armanc û Girîngiya Lêkolînê .....	6
1.3. Rêbaza Lêkolînê û Teknîkên Hatine Bikaranîn .....	7
1.4. Çarçoveya Lêkolînê û Sînorên Xebatê.....	8
1.5. Pirsgirêkên Lêkolînê .....	9
<b>BEŞA DUYEM</b> .....	11
<b>KURTENÊRÎNEK LI SER KURDÊN “KURDISTANA QAFQASYAYÊ”</b> .....	11
2.1. Dîroka Kurdên “Kurdistana Qafqasyayê” di Serdemên Berê de .....	11
2.2. Avakirina “Kurdistana Qafqasyayê” û Hilweşîna Wê.....	16
2.3. Piştî Hilweşînê Rewşa “Kurdistana Qafqasyayê”.....	22
2.4. Kurdên Azerbaycanê.....	27
<b>BEŞA SÊYEM</b> .....	31
<b>NIMUNEYÊN FOLKLORA KURDÊN AZERBAYCANÊ</b> .....	31
<b>3.1. ADET Û TORE</b> .....	33
3.1.1. Adetên Dawetê .....	34
3.1.1.1. Beriya Dawetê Hin Adetên Nîşankirinê .....	35
3.1.2. Adetên Merasîmên Jidayîkbûnê .....	38
3.1.3. Adetên şînê .....	38
3.1.4. Cejnên Gelêrî û Pîrozbahî .....	40
3.1.4.1. Cejna Xidir Nebî.....	40
3.1.4.2. Cejna Newrozê .....	43
3.1.4.2.1. Amadehiyên ji bo Cejna Newrozê .....	44

3.1.4.2.2. Cejna Çarşema Avê .....	45
3.1.4.2.3. Cejna Çarşema Agir .....	45
3.1.4.2.4. Cejna Çarşema Bayê .....	46
3.1.4.2.5. Cejna Çarşema Axê .....	46
3.1.4.2.6. Roja Cejna Newrozê û Pîrozbahiyên Têne Kirin .....	48
3.1.5. Adetên Mêvanti, Cîrantî û Hevkariyê .....	49
3.1.5.1. Adetên Cîrantî û Hevkariyê .....	50
3.1.5.2. Hevkariya Hevrezê .....	51
3.1.5.3. Hevparî .....	52
3.1.5.4. Hav (Hev) .....	52
3.1.5.5. Adeta Hevkariya Ziyane .....	52
3.1.5.6. Umya .....	53
<b>3.2. BAWERİYÊN GELÊRÎ</b> .....	<b>54</b>
3.2.1. Cihên Ziyaretê .....	54
3.2.2. Baweriyên Derbarê Sirûstê de .....	56
3.2.2.1. Baran .....	56
3.2.2.2. Baweriyên Derbarê Girtina Roj û Heyvê de .....	58
3.2.3. Baweriyên Zayendî .....	58
3.2.3.1. Qedexyên li Ser Jinên Ducanî .....	59
3.2.4. Baweriyên Gelêrî Yê Din .....	60
<b>3.3. ZANYARIYÊN GELERÎ</b> .....	<b>61</b>
3.3.1. Nojdariya Gelêrî .....	61
3.3.2. Falên Newrozê .....	64
<b>3.4. EDEBIYATA GELÊRÎ</b> .....	<b>65</b>
3.4.1. Çîrokên Gelêrî .....	65
3.4.1.1. Nokere Tacîr .....	65
3.4.1.2. Maral, Qirrik, Çeqel .....	66
3.4.1.3. Temir .....	67
3.4.1.4. Dakka oge .....	67
3.4.1.5. Zergere be temah .....	68
3.4.1.6. Negele Dizan .....	68
3.4.1.7. Meymûn-i dûlger .....	69
3.4.1.8. Diz .....	69

3.4.2. Pêkenok .....	70
3.4.2.1. Merike Kasib.....	70
3.4.2.2. Mole .....	70
3.4.3. Gotinên pêşiyên .....	71
3.4.4. Bayati .....	71
3.4.5. Xapînok .....	73
<b>3.5. ŞANOYÊ GEL (ETNO-TEATİR)</b> .....	<b>73</b>
3.5.1. Şanoya di Navbera Xalîçe de .....	75
3.5.2. Şanoya Xezal .....	76
3.5.3. Şanoya Keftar .....	77
3.5.4. Mînaka Pêşkeşkirina Şanoyekê di Çarşema Axê de.....	79
3.5.4.1. Şanoya Kose .....	79
<b>3.6. LÎSTOKÊN GELÊRÎ</b> .....	<b>80</b>
3.6.1. Lîstokên Mezinan; Heft Huner .....	81
3.6.2. Lîstokên Zarokan; Lîstoka Golî Golî, Lîstoka Darê Darê, Lîstoka Hêkan ..	85
<b>ENCAM Û NIRXANDIN</b> .....	<b>88</b>
<b>ÇAVKANÎ</b> .....	<b>92</b>
<b>PÊVEK; BELGE, FOTO</b> .....	<b>105</b>

## LÎSTEYA NEXŞEYAN

Nexşe: 1.....	14
Nexşe: 2.....	19
Nexşe: 3.....	24
Nexşe: 4.....	25
Nexşe: 5.....	26
Nexşe: 6.....	26

هه و النامه  
کتب

## LÎSTEYA WÊNEYAN

<b>Wêne:1</b> .....	111
<b>Wêne:2</b> .....	111
<b>Wêne:3</b> .....	112
<b>Wêne:4</b> .....	112
<b>Wêne:5</b> .....	113
<b>Wêne:6</b> .....	113
<b>Wêne:7</b> .....	114
<b>Wêne:8</b> .....	114
<b>Wêne:9</b> .....	115
<b>Wêne:10</b> .....	116
<b>Wêne:11</b> .....	117
<b>Wêne:12</b> .....	117
<b>Wêne:13</b> .....	118
<b>Wêne:14</b> .....	118



## DESTPÊK

Weke ku ji navê xebatê jî tê fêmkirin di vê xebatê de folklorê kurdên Azerbaycanê tê vekolîn. Lê divê em di serî de vê yekê jî diyar bikin ku me di vê lêkolînê de hemû kurdên Azerbaycanê nexistin mijara vê lêkolînê. Têne bi riya çavkanî û hin hevdişan û hevpeyvînan me xwest em folklorê wê herêma di hin çavkaniyan de weke “Kurdîstana Sor” tê binavkirin tomar bikin. Dîsa divê ev yek jî were gotin ku em dê êdî di nava vê xebatê de vê herêmê weke “Kurdîstana Qafqasyayê” bi nav bikin û vê bêjeyê di nava vê xebatê de her tim bikar bînin. Ev xebata folklorê dê folklorê civateke ku nasnameya wan ber bi windabûnê ye derxe pêş. Loma em dikarin bêjin ku ev xebat dê di vî warî de yekem xebat be ku bi zimanê kurdî (kurmançî) hatiye kirin.

Ji ber vê yekê me ev xebat weke sê beşan jî hev dabê kir. Di beşa yekem de mijar, rêbaz, armanc û girîngî û her weha pirsgerêkên têkildarî xebatê hatine dayîn.

Di beşa duyem de ji b.z heya serdema îroyîn kurtenêrînek li ser dîroka kurdên Qafqasyayê hatiye kirin. Ev kurtenêrînek fikrêkî dide me bê ka Kurdîstana Qafqasyayê li ku derê ye, kurdên Qafqasyayê ji kengî ve li vir dijîn û kurdên li vê herêmê di dîroka vê herêmê de roleke çawa lîstine. Ev xebat her çend ne zêde berfireh be jî em di wê baweriyê de ne ku dê vê mijarê jî hin aliyan ve ronî bike.

Di beşa sêyem de ku me weke folklorê kurdên Azerbaycanê bi navkiriye em li ser folklorê kurdên Azerbaycanê sekinîne.

Divê were diyarkirin ku lêkolîn û xebatên derbarê kurdên vê herêmê de pir kêmtir in. Lê mixabin ji ber ku folklorê kurdên Azerbaycanê di dema xwe da nehatiye tomarkirin di warê berhevkirinê de gelek pirsgerêk derdikevin pêşberî mirov. Loma me jî nedikarî em hemî keresteyên folklorîk ên girêdayî gelê kurd e vê herêmê ne berhev bikin. Ji ber vê yekê jî me cih daye nimûneyên folklorê wê herêmê. Em pê bawer in ku me bi vê yekê jî bo giştî folklorê kurdên Azerbaycanê jî wêneyek xêz kiriye. Li gor gelek folklorên folklorê afirandina zanista gelêrî ye. Hemî merasîm, stran, toreyên gel û bûyerên civakî di nava xwe de dihevin. Di vê xebatê de edebiyata gelêrî, zanyariya gelêrî, baweriyên gelêrî, şanoya gelêrî, lîstikên gelêrî û

hin nimûneyên folklorê yê ku girêdayî adet û toreyên kurdên Azerbaycanê ne hatine berhevkirin.





# BEŞA YEKEM

## MIJAR, ARMANC Û RÊBAZ

Folklor hemî baweriyên ku di civakê de ji mêj ve hene di nava xwe de dihewîne. Nêrînên gel ên derbarê ol, civak û gerdûnê de ne jî di nava xwe de dihewîne. Bêjeya folklorê di sala 1846an de cara yekem ji aliyê lêkolînerê Brîtanî, William John Thoms ve hatiye bikaranîn û pişt re ji li hemî cihanê belav bûye. Gelek zanyaran ev bêje di gelek wateyan de bi kar aniyê. Di ferhenga folklor, mîtoloji û efsaneyan de bîst û yek pênaseyên folklorê hatine kirin.<sup>1</sup> Yek ji van jî ya Benjamin A. Botkin e ku folklorê wek baweriyên kevneşopî, adet û îdiyomên ku bi formeke vegotinê belav dibin şirove dike.<sup>2</sup> Folklorên Êrisî\* L. N. Gumilyov jî dibêje ku: "...ew şûra genetîke ku carna bi derketina karakterên nediyar ên binşûrî diyar dibe"<sup>3</sup> folklorê pêk tîne. Folklorên din ên Êrisî jî dibêje ku folklor; "afirandina zanista gelêri ye. Hemî merasîm, stran, toreyên gel û bûyerên civakî di nava xwe de dihewîne".<sup>4</sup>

Bi awayekî giştî di destpêkê de folklor ji bo bermayî, adet û kevneşopiyên nav gel de dihat gotin, yanî "zanîna gel" bû. Bi gotineke din, bêjeya folklorê di serî de weke "zanînen gel" an jî tiştên di nav gel de belavbûyî hatiye pênasekirin lê pişt re di heman demê de bûye navê wê "disîplin" a ku van "zanînen gel" bi awayekî zanistî vedikole.<sup>5</sup>

Zanista gel an jî folklor bi gelek beşên din re jî têkildar e. Wek ku zanyarê Êrisî Azbalev jî dibêje, folklor; "afirandineke kompleks e. Folklor bi riya hin zanistên din ên mîna dîrok, dêrûnasî, civaknasî, etnografyayê tê zanîn"<sup>6</sup> û ji ber ku bi hişmendiya

---

<sup>1</sup> Maria Leach (ed.), Funk and Wagnalls Standard Dictionary of Folklore, Mythology, and Legend, Harper & Row, 1959. Pênaseyên di vê ferhengê de cih digirin bi nave "Definitions of Folklore" di sala 1996an de, di kovara Journal of Folklore Research, cîlda 33, hejmara 3an de hatiye çapkirin.

<sup>2</sup> Journal of Folklore Research, "Definition of Folklore", cîld.33, j.3, r. 256-257.

\* Ji berku kurdên qafqasyayê li şûna bêjeya "rus" bêjeya Êrisî bikarînin di vê tezê de me jî bêjeya Êrisî hilbijart.

<sup>3</sup> L. N. Gumilyov, "Гумилев Л.Н. Биография научной теории, или Автонекролог", <http://gumilevica.kulichki.net/articles/Article11.htm> lênerîna dawî: 08.06.2017

<sup>4</sup> Ожегов С.И. Русский словарь, 1973, r 785

<sup>5</sup> Necat Keskin, "Pêşgotin", di nav Richard M. Dorson, Folklor û Teoriyên Folklorê yên Îroyîn (wer. N.Keskin) Avesta, İstanbul, 2017, r. 9-15.

<sup>6</sup> Азбелов С.Н. Исторических эпохи и особенности фольклора, Ленинград, 1982. r.23

“netewetî”yê ve jî girêdayî ye, xebatên folklorê di nav gelek “netewe”yan de cihekî sereke girtiye.<sup>7</sup>

Xebatên folklor û tşkildarî folklorê di nav kurdan de jî cihekî girîng girtiye. Di nav kovarên kurdan ên di destpêka sedsala 20mîn de yê wê *Rojî Kurd* û *Jîn*<sup>8</sup> de ev xebatên tşkildarî folklorê dikarin werin dîtîn.<sup>9</sup> Ji aliyê din ve jî bilî kurdan gelek kesên biyanî jî li ser folklorê kurdan xebat kirine, an jî derbarê folklorê kurdan de agahî dane. Di salên 1853 û 1856an de lêkolîner û kurdologên wê Peter Lerc, Albert Socîn, Eugen Prîyom (1887-1890), Hogu Makas (1892) Le Cok (1903) jî bo folklorê kurdan gelek xebatên baş kirine.<sup>10</sup>

Her weha derbarê xebatên folklorê kurdên Qafqasyayê de jî gelek xebat hatine kirin. Pirtûka Emînê Evdal û Heciyê Cindî ya bi navê “Folklorê Kurmanca” ku di sala 1936an de li Yerevanê hatiye çapkirin di vî warî de yek ji xebatên sereke ye.<sup>11</sup> Li aliyê din, xebatên derbarê folklorê kurdên Azerbaycanê de li gorî xebatên din kêmtir in û ev jî dibe mijara sereke ya vê xebatê.

### 1.1. Mijara Lêkolînê

Wek li jor jî hate gotin, ev xebat bi taybet li li ser nimuneyên folklorê kurdên Azerbaycanê disekine. Xebatên derbarê folklorê kurdên Qafqasyayê de bi piranî jî hêla kurdên Ermenîstanê ve hatine kirin. Emînê Evdal, Heciyê Cindî, Malbata Celîlan hinek kes û zanyarên sereke yê wê qadê ne. Ev xebat jî bêhtir di nav kurdên “Ermenîstan”ê de hatine kirin. Ji ber vê yekê jî kurdên din ên “Qafqasyayê” zêde di van xebatan de cih negirtine. Bi demê re jî ev hemanên ku nehatine berhevkirin rûbirûyê windabûn û jîbîrbûnê mane. Wek ku Celîlê Celîl gelek caran bilêv dike; “Dijminê folklorê dem e. Divê be yî ku dem li ser de derbas bibe folklor were tomar

<sup>7</sup> Ji bo tşkiliya netewetî û folklorê bnr. Arzu Öztürkmen, Folklor ve Milliyetçilik, İletişim, İstanbul, 1998.

<sup>8</sup> Ji bo kovara *Rojî Kurd* bnr. ; Ji bo kovara *Jîn* bnr.

<sup>9</sup> Derbarê folklorê kurdî û dîroka xebatên folklorê kurdî de jî bo agahiyên berfirehtir bnr. Kadri Yıldırım & Mustafa Aslan & Ramazan Pertev, Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî, Mardin, 2013; Necat Keskin, “Pirsgirêkên Giştî yê Folklorê Kurdî û Çend Pêşniyaz”, The Journal of Mesopotamian Studies, C.2, j.1, r.1-15. Di heman demê li ser vê malperê jî guncav e: <http://jms.artuklu.edu.tr/download/article-file/279004> 08.06.2017.

<sup>10</sup> Ədalət, Nofəl, Kürd Ədəbiyyatı və mətbuatı tarixinə qısa bir nəzər, Bakı, Elim və təhsil, r. 12, 2014

<sup>11</sup> Ji bo çapa nujen ya vê pirtûkê bnr. Heciyê Cindî & Emînê Evdal, Folklorê Kurmanca, İstanbul, Avesta, 2008.

kirin”.<sup>12</sup> Lê mixabin ji ber ku folklorê kurdên Kurdistanê Qafqasyayê di dema xwe da nehatiye tomar kirin di warê berhevkerinê de gelek pirsgerêk derdikevin pêşberî mirov. Hilbijartina vê mijarê jî ji pêwîstiyêke bi vî rengî derketiye meydana.

Mijara vê xebatê wek di serî de jî hatibû gotin nimuneyên folklorê kurdên Azerbaycanê ye. Folklorê wek beşeke zanistê, bi rêbaz û teknîkên zanistî berhevkerin, polînkirin, berawirdkirin û şirovekirina hêmanên çanda gel an jî herêmekê ye.<sup>13</sup> Di vir de berhevkerin û bicihirina van hêmanan cihekî girîng digire. Gelek ceribandînan polînkirinê hene û yek ji wan jî ya folklorên Emerîkî Richard M. Dorson e. Dorson bi giştî folklorê di bin van beşên sereke de polîn dike; 1. Wejêya devkî (Oral literature); 2. Çanda Madî (material Culture); 3. Adetên gel ên civakî; 4. Îcrakirina hûnerên gelêrî (performing folk art).<sup>14</sup>

Her weha, Yıldırım û hevalên wî jî ji bo beşên folklorê kurdî û dabêşkirinê bi kar tînin; 1. Edebiyata gelêrî; 2. Adet û tore; 3. Bîr û baweriyên gelêrî; 4. Zanyariyên gelêrî. Her weha di nav xebatên folklorê yên Tirkiyeyê de jî ceribandîna “mijar” an jî “beş”ên folklorê hatine kirin. Yêk ji wan ku di xebata Sedat Veyis Örnek de cih digire ji bîst û pênc sernavên serbixwe pêk tê.<sup>15</sup>

Di vê xebatê de her du dabêşkirin jî li ber çavan hatine girtin, û hinek hêmanên berhevkerî li gorî van dabêşkirinan hatiye kirin. Lê *lîstîk* û *şanoya gelêrî* ku di ya Yıldırım û hevalên wî de di nav “edebiyata gelêrî” de tê dîtin, di vê xebatê de wek hemanên serbixwe hatine nirxandin û li gorî wê yekê hatine polînkirin.

Lê li vir divê were gotin ku ji ber hinek sedeman –di “pirsgirêkên lêkolînê” de bi kurtasî hatine dayîn- derfetê berhevkerina hemû xalên folklorê û herêmekê nebû, û ji ber vê yekê jî tenê “nimune” dikarîbûn werin berhevkerin.

Di vê xebatê de li gelek cihan têgeha “Kurdistanê Qafqasyayê” hatiye bikaranîn ku ev herêmek wek “Kurdistanê Sor” jî tê nasîn. Ji aliyê din ve ev herêmek di belgeyên fermî Sowyetê de tenê wek “Kurdistan” tê xuyakirin. Ev “pirsgirêk” li gorî belgeyên dîrokî di beşa duyem de tê niqaşkirin. “Kurdistanê Qafqasyayê” û “Kurdistanê Sor” du

<sup>12</sup> Ji axaftina **Prof. Dr. Celile Celil** ya di 16ê Gûlan a 2013an de li 4mîn Fûara Pirtûka ya Amedê hatiye wergirtin. Bnr. [http://t24.com.tr/haber/cccc\\_230051](http://t24.com.tr/haber/cccc_230051). 21.05.2016

<sup>13</sup> Sedat Veyis Örnek, *Türk Halkbilimi*, (çapa 2mîn), Kültür Bakanlığı, Ankara, 2000.

<sup>14</sup> Richard M. Dorson, *Teoriyên Folklore yên îroyîn*, (wer. N. Keskin), Avesta, İstanbul, 2017, r. 22-28.

<sup>15</sup> Örnek, hb, r. 17-20.

têgehên ku ji hêla kurdan ve hatine bikaranîn, lê “Kurdistan” wek herêmeke fermî ji hêla rêveberiya Sowyetê ve hatiye binavkirin. Lê ev her sê “herêm” jî têkildar û girêdayî hev in, lê di vir de, her çiqasî ev her sê “nav” werin bikaranîn jî, bi giştî mijar dê li ser herêma “Kurdistan”a fermî ya serdema Sowyetê be.

## 1.2. Armanc û Girîngiya Lêkolînê

Wek li jor jî hat bilêvkirin folklor hemî hêmanên çandê ku di civakê de ji mêj ve hene di nava xwe de dihewîne. Di nav van hêmanan de adet û tore, baweriyên gel, zanyariya gel, lîstik, şanoya gelêrî, edebiyata gelêrî jî cih digirin ku di heman demê de nixên wî gelî jî bi riya wan dikare were dîtin. Heta niha kêr xebat li ser folklorên kurdên Azerbaycanê hatiye kirin. Ji hêla din ve lêkolînerên azerî piranî caran nimûneyên ku girêdayî folklorên kurdan in weke hêmanên folklorên xwe hesibandine.<sup>16</sup>

Lêkolînên dijberî van jî hêla hinek lêkolînerên Êris û kurd ve hatine kirin ku hejmara wan jî gelek kêr e. Xebata zanyarê Êris A. Buşqapan a bi navê Kurdên Azerbaycanê<sup>17</sup>; xebata Çerkez Bekoyev a bi navê Zimanê Kurdên Azerbaycanê (Azerbaycan Kûrtlerînîn Dîlî)<sup>18</sup>; û xebata T. Arîstova ya bi navê Kurdên Qafqasyayê (Kafkas Kûrtlerî)<sup>19</sup> sê xebatên sereke yên di vî warî de ne. Ev xebata me ku di nav xwe de tomarkirin, berhevkarin û nivîsandina hêmanên folklorên kurdên Azerbaycanê dihewîne, dikare weke yek jî berdewama van xebatên folklorê were dîtin.

Di vê xebatê de edebiyata gelêrî, zanyariya gelêrî, baweriyên gelêrî û hin nimûneyên folklorê yên ku girêdayî adet û tore yên kurdên kurdên Azerbaycanê hatine berhevkarin. Bi vê yekê jî, her weha, wêneyekî giştî yê derbarê folklorên kurdên Qafqasyayê de hatiye xêzkirin. Bi vê yekê jî me xwestiye folklorên kurdên vê herêmê neyê ji bîr kirin û xwe bigihîne nîşên nû ku armanc û girîngiya vê xebatê jî derdixe meydanê.

<sup>16</sup> Di beşa “pirsgirêkên lêkolîna” de behsa vê yekê tê kirin.

<sup>17</sup> Буқшпан, А. *Азербайджанские курды*, Баку, 1932.

<sup>18</sup> Бакаев, Ч.Х. *Язык Азербайджанских Курдов*, Москва, 1965

<sup>19</sup> Аристова Г. Ф. *Курды Закавказья*. — М., 1966

### 1.3. Rêbaza Lêkolînê û Teknîkên Hatine Bikaranîn

Di xebatekê de “rêbaz” rêya xebatê nîşan dike, bê xebat bi kîjan têgehan û li ser kîjan bingehan û çawa birêve diçe nîşan dike û her weha rengê xebatê jî diyar dike. Teknîk jî ew amûrên di çarçoveya rêbazê de tên bikaranîn in. Rêbaz û teknîk di xebatekê de hevdû temam dikin. “Bi kurtasî rêya ku digihîne armancê **rêbaz**, amûrên ji bo xwegihandina hedefan tên bikaranîn **teknîk** in”.<sup>20</sup>

Ev xebat li ser famkirin, naskirin û danasîna hêmanên folklorê disekine û ji ber wê yekê jî rêbaza “lêkolîna qadê (fieldwork) hatiye bikaranîn. Lêkolîna qadê rêbazeke sereke ye ku di beşên antropolojî, etnografya û folklorê de tê bikaranîn ku di nav xwe hevpeyvîn, hevdîtin û her weha çavdêriyên lêkolîner jî dihewîne. Di vê xebatê de jî ev teknîkên “lêkolîna qadê” hatine bikaranîn. Weke din ji “rêbaza lêkolînên sahê”<sup>21</sup> ku ji aliyê Zanîngeha Kamerovîskî ya dewletê ve hatiye amdekirin jî sûd hatiye wergirtin. Her weha, bi beşa nivîsîna dîrokê de bi taybet ji çavkaniyên nivîskî sûd hate wergirtin. Her wisa ji agahiyên arşîvan jî sûd hatine wergirtin.

Daneyên derbarê folklorê yê vê xebatê xwe dispêrin lêkolîna qadê ku bi giştî di navbera salên 2014-2016an de hatiye kirin. Li ser qada lêkolînê ya ku me xwest em li ser xebatê bimeşînin ji sala 1988an û vir ve şerê dewleta ermenî û azeriyan heye. Loma nepêkan bû ku em rasterast li ser qadê vê lêkolîne bikin. Ji hêla din ve îro li van cihan kurd jî nemane û hemû koçî bajarên Azerbaycanê kirine. Ji ber vê yekê jî “lêkolîna qadê” di nav kurdên ku ji herêmên kurdan koç kirine hatiye bi rêvebirin. Ev cih Gala, Masazir, Qeraçukur ku navçeyên girêdayî Bakûyê; Kampa penaberên kurdên ji Laçînê ku li Axçabelî ye; sê gundên bajarê Yevlaq û dû gundên girêdayî bajarê Aksu ne. Kurdên van cihan hemû ji Laçîn, Kalbajar, Qubatli û Zengilan in û di salên 1992-1993an de koç kirine. Di vê maweyê de pênc çaran ziyareta qadê hatiye kirin. Daneyên di tezê de hatine dayîn ji hevpeyvîn, hevdîtin û çavdêriyên van ziyaretan hatine berhevkirin.

---

<sup>20</sup> Prof. Dr. Birsan Gökçe, Toplumsal Bilimlerde Araştırma, (çapa 6mîn ya berfirehkirî), Savaş, Ankara, 2012, r. 33.

<sup>21</sup> «Кемеровский государственный университет» Факультет русского языка и литературы, программа учебной практики-фольклорная, Кемерово 2014; Forma dijîtal li vê dere dikarê were dîtin: [http://nbikemsu.ru/sites/files/u3/umk/bak/cpo/ped\\_obrazov/rus\\_lit/pract3.pdf](http://nbikemsu.ru/sites/files/u3/umk/bak/cpo/ped_obrazov/rus_lit/pract3.pdf) 15.04.2017

Ji aliyê din ve li Azerbaycanê 20 hezar kurdên misilman ku di salên 1989-90î de ji herêmên wek Elegez û Sevan ên Ermenîstanê koç kirine jî hene. Ji ber ku ev herêm derveyî sînorê dimînin, li derveyî xebatê hatine hiştin.

Di xebatê de amûrên wek kamera, mekîneya wêneyan, dengnivîsok hatine bikaranîn.

Wêne di dawiya xebatê de di pêvekê de hatine dayîn. Her wêneyek di nava metnê de bi jimareyekê hatiye destnîşankirin û di dawiyê de li gorî vê jimareyê hatiye rêzêkirin. Nexşeyên derbarê mijarê de jî di metnê de dîsa hatine dayîn.

Kesên jêder ku li qadê hevpeyvîn bi wan re hatiye kirin di hundirê metnê de di nava du kevanan de wek (j.d.r. 1) hatiye nivîsandin. Agahiyên jêderan di dawî de li gorî van jimareyan hatiye nivîsandin.

#### **1.4. Çarçoveya Lêkolînê û Sînorên Xebatê**

Çarçoveya lêkolîna vê xebatê folklorê kurdên Azerbaycanê ye ku her weha têkildarî “Kurdîstana Qafqasyayê” ye jî. Ji ber ku dema em dibêjin kurdên “Kurdîstana Qafqasyayê” em behsa kurdên li bajarên Laçîn, Kalbajar, Qubadli, Zengîlan û hin deverên Zengezûr û Dereleyezê dikin. Ji van kurdan yê ku li bajaran Laçîn, Kalbajar, Qubadli û Zengîlanê dijiyan piraniya wan piştî şerê di sala 1988an de sirgûnê Azerbaycanê bûne. Kurdên li herêma Zengezûr û Dereleyezê jî ji desthilatdariya dewleta Sowyetê ve di nava sînorên Ermenîstanê de dijîn. Loma di vê xebatê kurdên behsa wan têne kirin kurdên van bajaran in.

Divê were gotin ku ev xebat ji ber sedemên ku me qala wan kirine li ser qada ku xwestiye were kirin nehatiye kirin. Ev xebat (ji bilî çavkaniyên nivîskî) di nava kurdên li dewleta Azerbaycanê de bi awayekî belavbûyî dijîn hatiye kirin. Ev kurdên di roja me ya îroyîn li Azerbaycanê dijîn jî piranî ya wan di sala 1992 û 1993an de li kurdîstana qafqasyayê piştî şer hatine. Ji bilî van 20 hezar kurd jî di sala 1988an de ji Ermenîstanê hatine sirgûnkirin. Di berhevkirina nimûneyên folklorê de me piranî ji agahiyên kurdên li bajarên Laçîn, Kalbajar, Zengîlan û Qubadliyê hatine sirgûnkirin sîd wergirt. Her çend me xwestibe em xwe bigihînin kurdên Dereleyez û Zengezûrê yê ku di sala 1937-1953an sirgûnê herêma Aranê ya Azerbaycanê hatine kirin jî em serneketin. Loma ev yek weke kêmasiyekê vê xebatê jî dikare were dîtin. Dîsa ji ber

ku hema bêje êdî edebiyata gelêrî di nava kurdên sirgunbûyî de nemaye, nimuneyên edebiyata gelêrî ku di xebatê de cih digirin piranî ji jêderên nivîskî ku berî niha hatine kirin in. Li vir divê ev yek jî were gotin ku di gelek çavkaniyên me ji wan sûd wergirtin de em çav bi bêjeya kurd û kurdistanê nakevin. Taybet di çavkaniyên azeriyan de tê dîtin ku keresteyên girêdayî folklorê kurdên kurdistanê qafqasyayê ciheke berfireh digre. Lê hêmanên ku bi girêdayî folklorê kurdane weke ji folklorê xwe hesibandine û qet qala kurdan nekirine. Bi riya çavkaniyên din û jêderên xwe me xwestiyê em vê yekê jî diyar bikin.

### 1.5. Pirsgirêkên Lêkolînê

Di vê xebatê de ji ber sedemên li jor me qala wan kir em rastî gelek astengiyên hatin. Lê her çend ev rastiyeke be jî di dawiyê de em gihîştin encama xwe. Di vê xebatê de astenga herî mezin ya ku derket li hemberî me qanûnên<sup>22</sup> dewleta Azerbaycanê bûn. Ji ber ku li gor qanûnên dewleta Azerbaycanê yek kes nikare bi serê xwe xebateke wisa bike. Eger kesek xebateke wisa bike li gor van qanûnan dê rastî cezayê pereyan were. Ev cezayên pereyan ji 100 dolarê dest pê dibe û carna digihîje 40 hezar dolarî. Her wisa cezayên girtîgehê jî carna dikare were birîn. Loma di vê xebatê de agahiyên ku hatine wergirtin rastî astengiyeke wisa jî hat.

Divê ev yek jî were gotin ku piraniya tiştên ku hatine berhevkirin ne bi zimanê kurdî lê bi zimanê azerî ne. Ji ber ku kurdên vê herêmê ji aliyê ziman ve jî rastî asimilasyoneke pir dijwar hatine dikare were gotin ku kurdên ku bi zimanê xwe diaxivin hema bêje ku nemane. Lê hêjî hin gundiyên ku ji bajarê Laçînê ne kurdiya xwe ji bîr nekirine. Ev yek jî pirsgirêkeke din a vê xebatê bû.

Dîsa bi taybetî di hevpeyvînan de em rastî astengan hatin. Ji ber ku di nava gel de tirsek heye gelek kesî nexwestin agahiyên derbarê folklorê de bidin. Gelek kesî jî xwestin ku em navên wan nedin û hinek wana jî nedixwestin em vîdeoyên wan bikişînin. Loma me soz da wan kesan ku em dê di xebata xwe de li gor nasnavên navên wana bidin û em dê qet dîmenên wan belav nekin. Ji bo ku ev astengî werin fêm kirin em dikarin vê mînaka jêrîn bidin;

---

<sup>22</sup> Hejmara qanûna 460an a dewleta Azerbaycanê ya ku derbarê parastina nimûneyên folklorê de, ("Azərbaycan" qəzeti, 09, 08, 2003-cü il, № -181)

Di sala 2013an de di bin sîwana komeleya Navenda Çanda Kurd (Ronahî) de (ku yekem komeleya kurdan bû ku li Azerbaycanê kar dikir) me bi çend hevalan xwest ku em xebatên çandê bikin. Wê demê serokê enstîtuya folklorê ya akademiya zanistî ya azerbaycanê Îlkîn Rûstemov ji bo berhevkirina folklorê kurdên ji Kalbajarê penaber bûne ji me alîkarî xwest. Min xwest ku ez wan agahiyên li ser navên kurdan berhev bikim û wan bi awayekî dîmenkî tomar bikim. Wî kesî jî ev pêşniyara min qebûl kir. Piştê çend rojan me ev keresteyên derbarê folklorê kurdên Kalbajarê bûn tomar kir. Min xwe jî gelek ji wan li ba xwe bi awayekî dîmenkî tomar kir. Lê mixabin ewan piştê ev tiştên ku me tomar kirî weke keresteyên folklorê Azeriyan dan nasandin û ew weke pirtûk jî çap kirin.<sup>23</sup> Ev xebata ku qet navê kurdan tê de derbas nabe piranî ji nimûneyên folklorê kurdan pêk tê. Lê weke me diyar kir ne li ser navên kurdan lê li ser navên folklorê azeriyan ev xebat hate çap kirin. Heta ew gotinên ku bavê min li ser folklorê gotine jî weke nimûneyên folklorê azeriyan hatiye pêşkeş kirin. Piştê dema me xebat kir me dît ku ev yek ji bo kurdên Laçîn, Zengilan û Qubadli jî hatine kirin.<sup>24</sup>

Li girêdayî vê yekê xwe gihîştina arşîvan de jî gelek pirsgirêk derketin pêşberî me. Lê dîsa jî me karîbû em bi saya hin tîkiliyên xwe agahiyên derbarê beşa dîrokê de piştrast bikin. Lê ji ber ku xetere çêdikir me nikarîbû em belgeyên girîng ji nava wan arşîvan derxînin an jî wêneyên wan bikişînin. Her çend ev pirsgirêk hebin jî em di wê baweriyê de ne ku me gelek rastî û berahî derxistine holê. Her wisa em di wê baweriyê de ne ku me folklorê kurdên kurdîstana qafqasyayê bi riya nimûneyan be jî berhev kiriye û me nehiştîye ku ev keresteyên folklorê bi tevahî ji holê rabin.

---

<sup>23</sup> Azərbaycan Milli Elmlər Akademiyası, Qarabağ folklorunda bir tarixdir, (Kəlbəcər rayonundan toplanmış folklor örnəkləri), Cild.VIII, Bakı, 2014

<sup>24</sup> Azərbaycan Milli Elmlər Akademiyası, Qarabağ folklorunda bir tarixdir, (Laçın, Qubadlı və Zəngilan rayonlarından toplanmış folklor örnəkləri), Cild.IV, Bakı, 2013



## BEŞA DUYEM

### KURTENÊRÎNEK LI SER KURDÊN “KURDISTANA QAFQASYAYÊ”

Kurdên `Kurdistana Qafqasyayê` wek hejmar beşeke zêde ji kurdên Qafqasyaya Pêş pêk tînin. Di çavkaniyên Azerî yên fermî de axa ku kurd lê dijîn weke “Kurdistanê”<sup>25</sup> tê binavkirin. Kurdistan ji bajarên Laçîn, Qubatli, Kalbajar û Zengîlan pêk tê. Ji bilî van bajaran herêma Zengezûr û Dereleyez a li ser axa Ermenîstanê ye jî weke axa kurdan tê pejirandin. Di heman demê de li Naxçivana Xweser ku giredayî Azerbaycanê ye jî kurd dijîn. Li Naxçivanê, bajarê Şerûr û gundên derdorê kurd niha jî hene. Kurd ji berê ve li herêma Gence û navenda Aran û Mogan jî bi awayekî belavbûyî be jî jiyan e.

#### 2.1. Dîroka Kurdên “Kurdistana Qafqasyayê” di Serdemên Berê de

Ev cihên ku li jor hatine diyarkirin di gelek çavkaniyên cuda de jî weke cihên ku kurd lê dijîn hatine destnîşankirin. Pirtûka Li Ser Çavkaniyên Dîroka Azerbaycanê ya ji hêla Akademiya Zanistî ya Azerbaycanê ve hatiye çapkirin vê yekê wisa diyar dike:

“Di sedsala 7an de di bin femandariya Selman îbn Rebiyye de artêşa ereban êrîş bir li ser Azerbaycanê. Li wir li rastê robara Kûrê kurdên Balasacan lê dijîyan. Kurdên Balasacan her çend di dawiyê de têk çûbin jî berxwedanek mezin nîşan dan”.<sup>26</sup>

Ji vê yekê diyar dibe ku li herêmên Mîl û Moganê hejmareke kurd hebûn. Di çavkaniyeke din de dîroknasê ereb Belazûrî van bûyeran wisa vedibêje:

“Di sedsala 18an a Hicrî de Xuzeyfe ibn el Yemen Azerbaycan dagir kir. Piştî dagirkirinê li Merzîbana Azerbaycanê ereb û gelên azerbaycanê peyman morkirin. Li gor vê peymanê Merzîban dê ji bo her salî 800.000 dîrhem bac bidabûna ereban. Li hemberî vê yekê jî ereban dê gelên herêmê nekuştibûna, dê dil negirtibûna, dê dest

<sup>25</sup> Azerbaycan komnîst partiyasının qərarı. 7 mart 1923-ci il. 4247/s №-li məruzə

“Azərbaycan tarixi” Azərbaycan Milli Elmlər Akedemiyası. A. Bakıxanov adına tarix institutu. berg VI. Elm, Bakı, 2008. r 130

<sup>26</sup>Azərbaycan milli elmlər akedemiyası, “Azərbaycan tarixi üzərinə qaynaqlar”, Bakı 1989, r 68, 69

nedabûna atêşgedeyên Zerdûştiyan û dê tevlî kurdên Balasacan, Savalan û Saturda nebûna. Dê hurmet bidana çanda civaka Şîz\*<sup>27</sup>.

Her çend îro dîroknasên azerî bi awayekî vekirî nepejirîn jî diyar e ku kurdên van herêman jî dîrokeke kevin ve li vir jiyane.

Divê em vê yekê jî destnîşan bikin ku di wê serdemê de kurdên ku dîyalektên cuda diaxivîn jî hebûn.<sup>28</sup> Ji bilî vê yekê jî di gelek çavkaniyên din ên kevin de hatiyê destnîşankirin ku kurd jî serdemen berê ve li Qafqasyayê jiyane. Dîroknasê navdar ê Yewnanî Herodot<sup>29</sup> dema qala zimanên Îranî dike nexşeya Kardukên ku weke bavikên kurdan tê nasîn xêz dike. Ev nexşe axa kurdên Azerbaycanê jî di nava xwe de dihevine. Ji berhemê diyar dibe ku kurd jî herêmên Îsfahanê û Mukriyê û heya deşta Mogan û gola Gokçe bi awayekî belavbûyî dijyan.

Ji bilî van dîroknasan dîroknasê Gurcî *Şota Mesxiya* jî diyar dike ku kurd b.z di sedsala 10an de li Qafqasyaya pêş dijyan.<sup>30</sup> Berhema Moîsey Qalanqat a bi navê “Dîroka Albaniyan” a navdar û berhema Mixîtar Qoş a bi navê “Salnameya Alban”<sup>31</sup> qala gelek karmend û fermanarên kurdên ku di xizmeta dewletê de ne dikin. Ji heman berheman diyar dibe ku di dawiya sedsala 7an de kurd li van deveran xwedîhêz bûn. Di navbera salên 706-707an de li herêma Partavê di civînekê de di navbera Xirîstiyanan de peymanekê tê morkirin. Di vê peymanê de navê eşîra kurdên Kurdayan balê dikşîne ser xwe.<sup>32</sup> Divê ev yek jî were gotin ku weke ku ji peymanê jî xuya dike kurdên li vir dijyan piranî Xirîstiyân bûn. Ji van agahiyan jî xuya ye ku kurd li gel hin dijderketinan li Qafqasyayê gelekî kevnar e.

Dewleta xirîstiyân a Mihranî ku kurd bûn<sup>33</sup> di navbera salên 590-705 de li Qafqasyaya Pêş dijyan. Di sedsala 9an de dewleta Deysemî<sup>34</sup> ya paytexta wê Berdeyê bû bi awayekî serbixwe hatibû damezrandin. Di damezrandina dewletê de Ebu Selîm Deysen Îbn Îbrahîm el Kurdî têkoşîneke dijwar dabû. Ewî di sala 935an

\* Niha herêmê devlata Îranê.

<sup>27</sup> Bünyadov, Ziya “Azərbaycan VII-IX əsrlərdə” Bakı, 2007, r 102

<sup>28</sup> Azərbaycan milli elmlər akademiyası, “Azərbaycan tarixi” III-XIII əsrin I rübü berg II . Bakı, 2007. r .22

<sup>29</sup> Herodot. “истори”. Москов, 2001.

<sup>30</sup> Kürd xalqının tarixindən səifələr, “Diplomat” 07 (32) Bakı 2006

<sup>31</sup> Kalankatuklu, Moisey, “Albaniya tarixi”; Qoş, Mxitar “Alban salnaməsi”, Avrasya Pres, Bakı 2006. r 295, 300, 317

<sup>32</sup> Moisey, K; Mxitar Q, 2006. r. 398, 399, 399

<sup>33</sup> Галлямов, С. ДРЕВНИЕ АРИИ И ВЕЧНЫЙ КУРДИСТАН, Москва, 2007. r 173

<sup>34</sup> Поладян, Аршак. Курды. Курды в VII - X веках (по арабским источникам) Ереван, 1987 r.8.

de dawî li desthilatdariya Mifilîh el Sacî ku serokê dewleta Sacî bû anî. Heya sala 938an bi vî awayî kontrola gelek deverên Qafqasyaya Pêş xistibûn kontrola xwe de. Deysem xwedî hêzeke mezin bû. Ewî heya sala 941ê dawî li şerê navxweyî anî ku ji bo desthilatdariyê bû. Sînorên dewletê berfirehtir kirin. Hêza mezin a ku dewleta Deysenê pêk dianî kurdên Dîvînê (Dereleyez, Zengezûr- Kurdistana Sor) bûn.<sup>35</sup> Hin çavkaniyên azerî<sup>36</sup> dewleta Deysemê weke dewleteke girêdayî dewleta Sacî binav dikin. Lê weke ku me li jor jî bi çavkaniyan diyar kir Deysem dewleteke kurd bû.<sup>37</sup> Piştî ku di sedsala 10an de dewleta Deysem hilweşiya desthilatdarî derbasî dewleta Salarî bû. Ev guhertina desthilatdariyê nebû sedem ku kurd ji vê herêmê biçin. Niha jî devera Berde ya ku piraniya wan kurdên ku niha xwe wek azerî dibînin lê hebin jî em rastî gelek deverên ku bi navên wan bi zimanê kurdî ne tên. ( Kurdboraçî, Kurdler û hwd ).

Di sedsala din li Qafqasyaya Pêş li deverên kurd lê dijiyan de Mîrektiya Alban Xaçin hate damezirandin.<sup>38</sup> Heya sedsala 16an jî ji hêla leşkerî ve kurdan hêza xwe li vê deverê diparast.

Sedsalên din di navbera dewletên Êris û Îran û di navbera dewletên Êris û Tirkan de şeran dest pê kir. Ji ber van şeran gelek kurdên li Îran û Tirkiyeyê dijiyan koçî van deveran kirin. Ji ber ku kurd li vê herêmê zêde bûn dewleta Safeviyan kete nava metirsîyeke mezin. Di sala 1736an de Nadîr Şah Evşar bû desthilatdar. Kurd li dijî desthilatdariya wî derketin. Loma Nadîr Şah li dijî kurdên vê herêmê dest bi komkujiyan kir. “Niştecihên vê herêmê sirgûnî Afxanîstan û Xorasanê kirin”.<sup>39</sup> Di roja me de jî hebûna kurdan a li Xorasan û Afxanîstanê û nêzîkbûna ziman û çanda kurdên Xorasan û Kurdistana Qafqasyayê jî ve rastiyeke piştrast dikin. Ev nayê wê wateyê ku kurd berê li Xorasanê tunebûn û kurdên li Xorasanê hemû ji kurdistana Qafqasyayê hatine sirgûnkirin. Jixwe dîrokname ereban El Estexîrî di sedsala 4an a Hicrî de qala hebûna kurdên Xorasanê dike.<sup>40</sup>

<sup>35</sup> Бартиякян.” Г.М, Источники для изучения истории павликианского движения”, Ереван 1961. r.32-33

<sup>36</sup> Azərbaycan Milli elimlər Akademiyası, Azərbaycan Tarixi-III- XIII, berg II, Bakı 2007. r 244,284

<sup>37</sup> Gümüş, Çimen, “Ermenistan, Kürd edebiyatının vatanı”, <http://www.basnews.com/index.php/tr/news/193451> . 05.04.2016

<sup>38</sup> Şamil, Hejare, Diaspora Kurtleri,peri yayınları, İstanbul 2005

<sup>39</sup> Bünyadov Ziya, “Azərbaycan v11-ix əsrlərdə” Bakı, 2007, r 280

<sup>40</sup> المسالك والممالك، وزارة الثقافة والارشاد القومي، جمهورية العربية المتحدة 196 : ص، 155

Dema behsa kurdên qefqasyayê were kirin divê teqez qala dewleta Şeddadiyan jî were kirin. Dewleta kurd<sup>41</sup>, a Şeddadî piraniya axa Azerbaycan, Ermenîstan û Gurcîstanê ya niha dabû ber xwe. (Nexşe: 1) Dewleta Şeddadî ya kurd di vê herêmê de roleke girîng lîstiye. Ji nava sedsala 10an dest pê bike heya sedsala 12an dewleta



Nexşe: 1 Dewleta Şeddadî ya Kurd (951-1174)

[http://www.azerbaijan.az/portal/History/HistoricalMaps/images/hist\\_map\\_12\\_e.jpg](http://www.azerbaijan.az/portal/History/HistoricalMaps/images/hist_map_12_e.jpg)

Şeddadî li ser mîrekiya Gence, Naxçivan û Dîvîn desthilatdariya xwe saz kiribû. Serokê eşîrê Mihemed Îbn Şeddad îbn Qurtak di sala 951an de Dîvîna ku di bin desthilatdariya Merzîban îbn Mihemed de bû bi dest xist. Bi vê yekê bingeha mîrekiya Debilê avakir. Piştî vê yekê dewleta Şeddadî sînorên xwe berfireh kir û li ser axake berfireh de desthilatdarî kir. Ji aliyê leşkerî, çandî û hunerî de jî xwe bi pêşve biribû. Îro gelek zanyarên azerî jî dema qala çand û wêjeya azerîyan dikin xwe dispêrin dewleta Şeddadîyan. Ji bilî vê yekê gelek zanyarên biyanî jî pêşvaçûna dewleta Şeddadî ya ji aliyê çandî û hunerî piştrast dikin. Mînorsky wisa vê yekê destnîşan dike: “Şeddadiyên ku gelek ronakbîr bûn gelek berhem dîv xwe hiştin”.<sup>42</sup> Mixabin dîroknasên azerî vê yekê napejirînin lê tenê vê yekê diyar dikin ku eşîra

<sup>41</sup> Minorsky V. , Studies in Caucasian History, CUP Archive, 1953, r 78,89

<sup>42</sup> Minorsk, V. TH. Bois, D.N. Mac Kenzie. “Kürtler ve Kürdistan”, İstanbul, 2004, r 59

Şeddadiyan eşîreke kurd bûn.<sup>43</sup> Lê berhemên wê serdemê gotinê dîroknasên azêrî piştrast nakin. Wek mînak helbestvanê navdar Nîzamî Gencevî yê ku azêrî wî weke helbestvanê xwe yê netewî dibînin di berhema xwe ya “Leyla û Mecnûn” de wisa dibêje:

گر مادر من رئیسہ کرد

مادر صفتانہ پیش من مرد<sup>44</sup>

Ger dayîka min serokeka kurd bû

Dayîksifetane\* li ber çawê min mir

Li gor agahiyên Mînorsky dide Mesûd îbn Namîdarê ku di serdema Nîzamî Gencevî de dijiya qala xwe dike û wisa dibêje: “ji bilî zimanê erebî, tirk û farisî bi zimanekî herêmî (zimanca) wî berhem nivîsandiye.<sup>45</sup> Zimanê ku Namîdar weke zimanê herêmî qal kiriye li gor Minorsky zimanê kurdî ye.<sup>46</sup> Ev yek jî dide xuya kirin di dewleta Şeddadiyan de bi zimanê kurdî berhem hatine dayîn.

Di serdema Fezil îbn Mihemed (985-1030) de dewleta Şeddadî hêza xwe zêdetir kir. Di herêma Gence de hemî mîrekiyên biçûk ji holê rakir û ew bi navendê ve girêda. Bajarê Debîla warê bavikên wî bû ku ji hêla Gurciyan ve hatibû dagirkirin cardin stand. Di heman demê de desthilatdarê Ermeniyên jî neçar ma ku bacê bide dewleta Şeddadiyan<sup>47</sup>. Pira Xûdaferîn a li ser çemê Arasê hatiye avakirin ku dikeve başûr rojavayê Kurdistana Qafqasyayê mîna keke herî bedew a avahiya kurdên dewleta Şeddadiyan e.

Di sala 1130an de dewlata Şeddadî ji hêla dewleta Selçûkiyan ve bi tevahî hatê dagirkirin. Ji vê serdemê pê de tirkên Oguz li Qafqasyaya Peş dest bi desthilatdariyê kirin. Her çend Selçûkiyan herêma Qafqasyayê dagir kirin bin jî ew deverên di bin desthilatdariya dewleta Şeddadiyan de bûn hê jî weke Kurdistanê dihat binavkirin.

---

<sup>43</sup> Öməröv Vahid. Orta əsrlərdə Azərbaycanca müstəqil feodal dövlətlərin yaranması, ‘Səs’, 09. 18 2012, r 14. Bakı,  
21 <http://blog.leomoon.net>. 41. نظامی گنجوی، لیلی و مجنون، ص. 23.06.2016

\* Yanî weke dayîkeka rastîn.

<sup>45</sup> Minorsky, V. Studies in Caucasian History, CUP Archive, 1953,, r 34

<sup>46</sup> Масуд ибн Намдар. Сборник рассказов, рисем и стихов (факсимиле текста; предисловие и указатели В.М. Бейлиса). Москва, 1970

<sup>47</sup>

Em di çavkaniyan de jî rastî van agahiyan tên. Hekîmê Îskoçî Bel yê ku li Êrisê karê nûnertiya sekreteriya welatê Îngilîstanê dikir di rojnivîska xwe ya gernameyî de ya ku sala 1716an de nivîsiye wisa dibêje:

“ Em di ser çemê Arasê re derbasbûn û ketin deşteke vala ku ji hêla Êrisan ve weke deşta Mûgan dihat binavkirin. Lê heman der ji hêla Farisan ve jî weke Kurdistan dihat binavkirin. Niv mîlê li jora pirê, çemê Arasê û Kûra (çemê kûr) digihîjin hev dû. Çemê Kûrê eyaleta Kurdistanê dixê du parçe û di navê re diherike. Kurd navê xwe ji vî çemî digrin. Ev gel, gelekî pir kevnar e. Li gor min ev gel gelê Kardux ê ku Ksanefon qala wan dikir û digot li dijî Grekan têkoşiyane bixwe ne. Niha jî ew pir wêrek in. Ew hem bi sîmayên xwe hem jî bi hêza xwe ji farisan bedewtirin. Ev kurdên li virê dijîn jiyana koçeriyê dikin”.<sup>48</sup>

Di serdemên din de jî axa Kurdistana Qafqasyayê ji hêla gelek dewletên cuda ve hate rêvebirin. Taybet di serdema dewleta Moxolan de Kurdistana Qafqasyayê hatiye wêran kirin. Gelên li herêmê dijîyan rastî komkujiyê hatine.

## 2.2. Avakirina “Kurdistana Qafqasyayê” û Hilweşîna Wê

Piştî vê dagirkirinê kurdan careke din ji hêla siyasî û leşkerî ve hêza xwe ya berê bi dest nexistibin jî ev yek nayê wê wateyê ku kurd li wir tune bûne. Sowyeta ku piştî hilweşîna rejîma Çarî ya Êrisa hatibû li ser kar bala xwe dide Kurdistana Qafqasyayê. Lê li ser axa Kurdistana Qafqasyayê di sala 1918an de di navbera dewleta Ermenîstanê û Azerbaycanê de şer destpê dike. Dewleta Ermenîstanê eyaletên Zengezûr û Dereleyezê bi axa xwe ve girêdidin. Li ser vê herêmê dewleta Sowyetê jî heman polîtîkayê heya sala 1953an dimeşîne. Kurdên ku li eyaleta Zengezûr û Dereleyezê dijîyan heya sala 1953an rastî vê polîtîkayê hatin. Piştî vê polîtîkayê li vê herêmê hebûna kurdan pir qels bû. Heta em dikarin bêjin ku hatibû asta tunebûnê. Çavkaniyên azerî yê demên dawî doz dikin piştî ku Kurdistan ji hêla Sowyetê ve tê damezirandin navên van deveran weke Kurdistan tê binavkirin. Lê di navbera salên 1918-1920an de (5 sal berî biryara Kurdistan) di serdema serxwebûna dewleta Komara Azerbaycanê de di belgeyên Bolşevîk de jî ev herêm weke Kurdistan hatiye binavkirin.

Di wan belgeyan de tê diyar kirin ku gelên di vê herêmê de dijîn kurd in. Em ji belgeyên wê demê dixwînin:

<sup>48</sup> Seyyahlar Azerbaycan haqqında”. Bakû, 1961, r 397

“ Bajarê Xanê ku yekîneyên artêşa Azerbaycanê xwe tê de cih kir heya ku yekîneyên artêşa Ûrisan hat ji hêla general Şixlinîskî ve bi alîkariya fermandarên din 8 hezar leşker, 24 polemyot, 8 topên çiya, 2 topên deştî û gelek alavên leşkerî ji bo Kurdistanê hate şandin”.<sup>49</sup>

Xuyaye ku di vê serdemê de kurd xwedî hêzeke siyasî û leşkerî bûn. Em ji belgeyên sergeneralê herêmê X. B. Sultanov (ew bi xwe jî kurd e-**Foto: 1**) ku di arşîvên neteweyî yên dewleta Azerbaycanê<sup>50</sup> de tê parastin çav bi van agahiyan dikevin:

“Ermeniyan êrîş bir ser çeperên leşkerên ku bajarê Xankendiyê diparast. 5 hezar hêzen leşkerî yên kurd ku ev agahî standin ber bi Xankendiyê ve ketin rê. Min pêşî li wan girt û bi vê yekê îhtîmala şerekî mezin jî ji holê rabû”.

Ji vê belgeyê jî diyar dibe ku 5 hezar leşkerên kurd di wê serdemê de ji bo şerekî amade ne. Ev yek jî nêrînen me yên derbarê salên 1920an piştrast dike. Belgeyê<sup>51</sup> din a balkêş de ku di 25ê Hezîrana 1920an de ji rapora fermandarê keşfê ya Lîva 32a Kurdistanê hatiye amadekirin de wisa tê gotin. Fermandarê keşfê çû herêma Kurdistanê. Li navçeya Pîçanîsê de bi serokê kurdan Sultan Beg Sultanov (**Foto: 2**) re civiya. Ji tabûra 12. artêşa sor raporek amade kir. Di vê raporê de jî ev yek hatibûn diyar kirin:

“ Kurdistan vê herêma Azerbaycanê pêktîne. Heya ji bakurê gundê Zabuxa Zengezûrê û ji çemê Axoglan û ber bi keviyên bakurê gola çitlikê û ji jêdera çemê Terterê heya sînorên başûr dikeve nava vê herêmê. Kurdên li vê herêmê sewal xwedî dikirin û bi awayekî baş çek bikartanîn”.

Em ji vê raporê derbarê serokê kurdistanê de jî hin agahiyan fêr dibin. Li gor vê belgeyê Sultanov xwedî mîlkên berfireh e û di nava kurdan de jî xwedî nufûzeke girseyî ye û girêdayî gelê xwe ye. Bi 2 hezar kesên hêza xwe ya leşkerî li hemberî êrîşên Ermeniyan sekiniye. Diyare ku di we serdemê de jî hêj kurd xwedî hêz in û di heman demê de keseke ku pêşewatiyê ji wan re bike jî heye. Ji bo me tişteke din a girîng heye ku ew jî derbasbûna bêjeye Kurdistanê ya di vê raporê de ye. Heya wê serdemê her çend di nava gel de û ji hêla hin lêkolînvan û gerokan ve bêjeya Kurdistanê ji bo vê herêmê hatibe bikaranîn jî em cara yekem di raporeke fermî de çav bi bêjeya Kurdistanê dikevin.

<sup>49</sup> Respubilika Dövlət Xalq Arxivi, kar. 7940.r 31-43.

<sup>50</sup> Milli Dövlət Arxivi -MDA.F. 970, rêz. 1, kar 163, 49, r 18-19

<sup>51</sup> Azərbaycan Respublikası Dövlət Siyasi Partiyalar və ictimai Hərəkətlər Arxivi f. 1, rê. 74, k. 121, r 68-69. “Azərbaycan Tarixi” berg VI, Elm, Bakı, 2008. r 38

Wek mînak em di helbestên hozanên gel de jî çav bi bêjeya kurdistanê dikevin. Aşîk Qurbanê ku di sedsala 19an de jiyaye derbarê welatê xwe de di helbesteke xwe de wisa dibêje:

*“Qurban şad olmadı bu qəmli yasdən,*

*İnciyib küsmüşəm bevəfa döstdən.*

*Sakinin Ağdaban, elim Kürdüstan...”*

**Wergera wê:**

*“Qurban şad nebû ji vê jana şînê*

*Ez xemgîn û şikiya me ji dostên bêwefa*

*Nişttecihê Axdaban warê Kurdistan”*<sup>52</sup>

Heya vir qala Kurdistana qafqasyayê ya dîrokî ku axa wê dikeve nava sînorên Ermenîstan û Azerbaycanê û sînorê wê jî digihîje Gurcîstanê hate kirin. Tê dîtin ku kurdan dewleteke otonom jî li vir avakirine. Li jêr dê qala yekem dewleta nûjên a kurdan Kurdistana Qafqasyayê were kirin.

Di sala 1917an de dewleta Sowyetê ya sosyalîst hate damezirandin. Di dawiya salên 1920an ve li ser tevahiya qafqasyayê careke din desthilatdariya xwe ava kir. Li gor îdeolojiya dewleta Sowyetê her gel xwedî maf bûn ku dikarî çarenûsa xwe diyar bikin û bi çand û hunera xwe bijîn.<sup>53</sup> Loma di 7ê Tîrmeha 1923an de biryara avakirina Kurdistanê hate dayîn. Li jêr dê bi awayekî berfireh qala vê yekê were kirin. Lê divê di serî de hinek qala bûyerên siyasî û dîrokî yên ku di we serdemê de hatine jiyîn bê kirin. Azerbaycan sala 1920an heya 1991an girêdayî dewleta Sowyetê bû. Yekem serokê Azebaycana Sowyetê Nerman Nermanov jî ji ber îdeolojiya sosyalîst dixwest ji bo gelên din xweseriyê ava bike. Li gor Nermanov herêma Zengezûrê divê girêdayî dewleta Ermenîstanê bûna. Lê divê li wê herêmê Kurdistaneke otonom a girêdayî dewleta Ermenîstanê jî bihatina damezirandin. Di heman demê de dewleta Azerbaycanê dixwaze kedkarên herama Çiyayê Karabag çarenûsa xwe bixwe diyar bikin.

<sup>52</sup> Aşîq Qurban; “Mohnət”, Bakı, 1972, r.77

<sup>53</sup> Viladimir, Lenin, Ulusların Kaderlerini Kendilerinin Tayin Hakkı, Agora Yayınları, İstanbul, 2012



Daxwazên Nerimanov ji hêla Hikûmetê ve jî bi awayeke fermî tên pejirandin.<sup>54</sup> Serokê Komîteya Şoreşa Ermenîstanê Ş. Î. Kasyan dijî avakirina Kurdistaneke otonom a girêdayî Ermenîstanê bû. Li gor Kasyan li herêma Zengezûrê kurd kêmetew bûn. Ev nêrîn ji hêla dewleta Sowyetê ve jî tê pejirandin.



**Nexşe: 2 Sînorên Kurdistana Xweser a Sowyetê (1923-1930)**

[https://upload.wikimedia.org/wikipedia/commons/4/46/Red\\_kurdistan\\_1923\\_1929.png](https://upload.wikimedia.org/wikipedia/commons/4/46/Red_kurdistan_1923_1929.png)

Lê divê li vir ev yek jî were gotin ku li gor jimariya di sala 1886an ji 326 gundên Zengezûrê tenê 81ên wan gundên Ermenîyan bûn.<sup>55</sup> Ev nêrîn ji hêla dîroknasê Ermenî A. Lalayan<sup>56</sup> û kurdnasê Êris A. Bukuşpan<sup>57</sup> ve jî tê diyar kirin.

Di destpêka salên 1922an de Hikûmeta navendî ya Azerbaycanê ji bo otonomiya Kurdistana Sor ava bikin dest bi xebatê kiriye. Nîqaşên pir gur di nava navenda partiya komûnîst ya Azerbaycanê de çebûn. Her çend piştî çend mehan biryara avakirina Kurdistana Sor hatibe dayîn vê cavê jî li ser sînorên herêmeke wisa nîqaşên din derketin holê. Hin endamên Komîsyona ji bo avakirina Kurdistana Sor hatibû damezirandin di tîrmeha 1923an de biryara avakirina Kurdistana Sor da. Hin

<sup>54</sup>“ Azərbaican Respublikası Prezidentinin İşlər İdarəsinin Prezident kitabxanası” -“Dağlıq Qarabağ münəqışəsi”, BAKI – 2005. r. 43.

<sup>55</sup> Kafkaziski Kalendarlarda, Tıblisi 1886

<sup>56</sup> Большой советский энциклопедия Москва 1937, r 532-535

<sup>57</sup> Bukuşpan, 1932, r 67

endamên komîsyonê jî pêşniyar dikin ku divê ev otonomî girêdayî otonomiya Çiyayê Qarabaxê ya ku dê ji bo Ermeniyên bihata damezirandin bibûna. Loma biryarek nayê standin û ev nîqaş bê encam dimînin. Ji ber ku Komîsyon bê encam dimîne di 7ê Tîrmeha 1923an careke din dicivin. Di wê rojê de biryara Otonomiya Kurdistanê Sor a hatî bi hêzkirin tê dayîn. Em vê yekê di belgeyê de wiha dibînin.

### **Belgeya Sînorên Avakirina Otonomiya Karabax û Kurdistanê**

**07.07.1923**

**Hate Bihîstin: 1. Derbarê diyarkirina organên rêveberiya beşa Arana Karabaxê.**

**2. Derbarê Kurdistanê de**

**Biryar hate standin.**

**Bila Kurdistanê Otonom were damezirandin.**<sup>58</sup>

Ev biryara ku ji hêla pêşengên partiya komûnîst a Azerbaycanê E. H. Garayev û A. G. Karayev ve tê erêkirin temendirej nabe. 16ê tîrmeha 1923an de li ser navê sekreterê komîtaya navendî ya partiya komûnîst a Azerbaycanê S. Kîrov biryara li jêr tê pejirandin:<sup>59</sup>

**Belgeya Konseya Partiya Komûnîst a Azerbaycanê.**

**16.7.1923**

**Biryar Hate Standin:**

**Deverên ku kurd lê niştecihbûyîne bila Eyaleta Kurdistanê were damezirandin.**

**Destnîşan: Sekreterê Partiya Komûnîst a Azerbaycanê S. Kîrov**<sup>60</sup>

*Rojnameya Karkerên Bakûyê* avakirina eyaleta Kurdistanê ji bo xwînerên xwe bi vî rengî parvekiribû:

<sup>58</sup> Azerbaycan Respublikası Dövlət Siyasi Partiyalar və ictimai Hərəkətlər Arxivi ( ARDSPİHA), k 1, r. 74, k. 133, r. 166.

<sup>59</sup> ARDSPİHA, r 125,k. 303, r. 33.

<sup>60</sup>ARDSPİHA. r. 13, r. 1,k. 264, r. 12.

“Navend Konseya Rêveber a Azerbaycanê derbarê avakirina Çiyayê Karabaxê de biryar stand da ku Karabaxa Aran (deşt) bibe du eyalet. Dê Kurdistan jî weke eyaleteke otonom were damezirandin”.<sup>61</sup>

Di 21ê Tîrmeha 1923an de di civîneke hevpar de Navenda Konseya Reveber a Azerbaycanê û Sowjeta Komîseran a Gelên Azerbaycanê<sup>62</sup> biryara avakirina eyaleta Kurdistanê erê kirin. Paytexta eyaleta Kurdistanê weke Pîrcahan<sup>63</sup> hate pejirandin û pişt re jî bajarê Laçîn li ser Abdallarê hate avakirin. Bolşevîkê Azerî Hûsnû Hacîyev weke serokê rêveberê a eyaleta Kurdistanê hate tayînkirin. Navçeyên Kariqışlak, Kalbajar (*Kalbajar*), Qubatli, Kutirlî, Kurdhaci û Miradxanlı jî bi kurdistanê ve hatin giredan.<sup>64</sup>

Li gor çavkaniyên wê demê bi giştî li Azerbaycanê 41 hezar<sup>65</sup> kurd dijîyan. Ji wan kesan 37.182 hezar<sup>66</sup> kurd li eyaleta Kurdistanê dijîyan. Kurdên li kurdistanê qafqasyayê dijîyan ji sedî 72.3 nûfusa herêmê pêk dianîn<sup>67</sup>. Niştecihên Karqışlak, Kalbajar, Kutirlî, Kurd Hacî û Miradxanlı ji rêjeya sedî 99 ji kurdan pêk dihat.<sup>68</sup> Avakirina otonomiya Kurdistanê bi xwe re perwerdeya kurdî jî di navê de gelek derfet afirand. Di sala 1923an de ji bo mamosteyên kurdî bînan gihandin di bin baskê Dîbistana Bilind a Şuşayê de beşa kurdî hate vekirin.

Mûseyîb Axundov di sala 1930an de di vî dibistanê de li gor prensîbên alfabeya latînî pirtûkek ji bo alfabeya kurdî amade kir.<sup>69</sup> Di dibistanên kurdan de ku nû vedibûn bi vî alfabeyê perwerdeya kurdî dihat dayîn. Di heman demê li gor şanoya

---

<sup>61</sup> Сборник узаконений и рас поряжений рабоче-крестьянского правительства Азербайджанской ССР . "Бакинский рабочий", 07июля 1923 г., №157

<sup>62</sup> Yekîtiya Lîjneya Gel a Azerbaycanê

<sup>63</sup> ARDSPİHA, d. 1, r. 74, ki. 134, r. 2-3.

<sup>64</sup> Территориальное и административное деление Союза ССР на 1-е января 1926 года. — М Издательство Главного Управления Коммунального Хозяйства НКВД, 1926. — г. 191 284

<sup>65</sup> -Всесоюзная перепись населения 1926 г., берг, 14, Москва, 1929; Arşîva Navendî ya Dewletê 2511; Итоги Всесоюзной переписи населения 1959 г., Азерб. ССР. Москва, 1963; Итоги Всесоюзной переписи населения 1970 г., 4-сü cild; «Вестник статистики», №10, Москва, 1980. -Первая всеобщая перепись населения Российской империи 1897 года: бергê; 61, 63, 69, 71. Народное хозяйство Азербайджан-ской ССР к 60-летию Великого Октября, Баку, 1977, г. 7 -Всесоюзная перепись населения 1926 года, берг 14, Москва 1929,

<sup>66</sup> Заря Востка, 1925,22,10 (№1009)

<sup>67</sup> Muradov, Şahbaz; Çingiz, Вахış . Azərbaycan Respublikasında etno-demaqrafî proseslər- tarixi dəyişikliklər və reallıqlar. Bakı 2013. r 62, 72

<sup>68</sup><http://www.ethno-kavkaz.narod.ru/kurdistan26.html>.24.07.2016

<sup>69</sup> - “Dengê Kurd” 28 .1. 2004, (58).

-Şamil, Hejarê, Kürdçe ilk şiirler kitabının yazarı: Mûseyib Axundov, <http://www.kurdistan-post.eu/ru/kurdce-ilk-siirler-kitabinin-yazari-museyib-axundov>. 12.07.2015.

girêdayî çanda nûjen şanoya kurdî hate damezirandin. Ev yek hem ji bo kurdên qafqasyayê bi taybet jî ji bo kurdên Kurdistanê Qafqasyayê derfeteke mezin bû.

Kurdan di sedsala 20an de bi awayekî fermî otonomîyek bi dest xistibû, lê ev rewş zêde dom nekir. Hem ji ber nêrîna dewleta Sowyetê hem jî ji ber ku sînorên Kurdistanê Qafqasyayê nêzîkê kurdên Îranê û kurdên Tirkîyeyê bû dewleta Îran û Tirkîyeyê ji bo statûya Kurdistanê ji holê rakin pêkûtiyên xwe zêde kirin. Xuyaye ji ber ku di vê serdemê de têkiliyên dewleta Tirkîyeyê û dewleta Sowyetê pir xurt bûn,<sup>70</sup> dewleta Sowyetê ji bo statûya Kurdistanê Qafqasyayê ji holê rabe biryar stand. Loma di sala 1929an de mafên otonomibûnê ji Kurdistanê hate standin. Lê dîsa jî weke Kurdistan ma. Di sala 1931an de ax û sînorên dewleta Sowyetê li gor taqşîmkirineke nû hate dabeşkirin. Navê Kurdistanê bi awayekî fermî ji holê hate rakirin û li dewsa Kurdistanê jî bajarên Kalbajar, Qubatli, Zengîlan û Laçîn hatin avakirin. Her çend Kurdoğlu Mihemed (Əhmədov Məhəmməd İbrahim oğlu **Foto.3.**) li hemberî vê taqşîmkirina nû serî rakiribe û di sala 1931an de navenda bajarê Kalbajarê dest xistibe jî meheke zêde nikariye li ber xwe bide û vekîşiyaye çiya. Di sala 1936an de jî Kurdoğlu Mihemed tê kuştin û têkoşina leşkerî li Kurdistanê Qafqasyayê bi dawî dibe.<sup>71</sup>

### 2.3. Piştî Hilweşîna Rewşa “Kurdistanê Qafqasyayê”

Demeke dirêj li Kurdistanê Qafqasyayê tevgera siyasî an jî leşkerî nayê dîtin. Di sala 1947an de ji hêla Stalîn ve gelek kurdên di derdora Kurdistanê sor dijiyan ber bi Asyaya Navîn ve hatin sirgûn kirin<sup>72</sup> (**Belge: 1**). Di vê serdemê de nasmameya kurdî li Kurdistanê Qafqasyayê ji holê tê rakirin û kurdên li vir rastî polîtîkayên dijwar ên dewletê tîn. Ji sala 1927an şûn de di dibistanan de waneyên kurdî tîn rakirin û gelek kesên ronakbîr ên Kurdistanê Qafqasyayê tîne sirgûnkirin.<sup>73</sup> Ji Stalîn dest pê bike heya roja me ya îro jî polîtîkayên asimilasyonê di nav kurdên Kurdistanê Qafqasyayê berdewam kiriye. Kurdên ku ji derdora Kurdistanê qafqasyayê hatibûne

<sup>70</sup> Azərbaycan Respublikası Mərkəzi Dövlət Arxivi (AR MDA), d.s.28, r.4 ; AR MDA, d.s. 28, r. 4, i. 3, v.6;

-Qasimov. M. Xarici dövlətlər və Azərbaycan, Bakı1998 r. 139-180 ;

-Həsənli Cəmil, SSRİ-Türkiyə : Soyuq müharibənin sınaq meydanı, "Adiloğlu", Bakı 2005, r 12

<sup>71</sup> Abdullayev. A. Ə., Dağlaro dağlar deyil, Bakı Gənclik, 1984.

<sup>72</sup> SSRİ Nazirlər Sovetinin 1947-ci il 23 dekabr tarixli 4083 nömrəli və 1948-ci il 10 mart tarixli 754 nömrəli qərarları

<sup>73</sup> ADSİ Arxivi-Tam məxvi. 7.03.1927. 4247

sirgûn kirin her çend rastî gelek pêkûtiyan hatibin jî dev ji doza azadkirina Kurdistana Qafqasyayê bernedan. Di sala 1961an de di bin serokatiya Mihemed Babayevê<sup>74</sup> ku sirgûnê Asyaya Navîn bûbû de ronakbîrên kurd ên navdar Huseyînê Nebo, Mihemed Emîn Ezîz, Huseyîn Sadikov, Tîmûrê Elî û Çerkezê Beko lijneyek avakir. Ev lijne ji 9 kesan pêk dihat û armanca wan ya sereke ew bû ku kurdên ber bi Asyaya Navîn ve hatibûn sirgûnkirin bikaribin vegerin Kurdistana Qafqasyayê û dîsa Kurdistaneke Otonom bê avakirin ji bo kurdên herêmê.<sup>75</sup>

Lijne di heman salê de diçe Moskowaê û dixwaze bi serokê Yekitiya Komarên Sowyeta Sosyalîst Nikita Kruşçev (Xruşov-Xruşçyov) re civînekê pêk bîne. Lê Kruşçev vê daxwazê napejirînê. Loma lijne bi alîkarên wî Vader û Şîmonovsky re dicivin û daxwaznameya xwe pêşkeşî wan dikin. Derbarê vê bûyerê de Huseyîn Sadikovê ku di lijneyê de cih digirt nêrînên xwe wisa bilêv dîke:

“... Me ji sekreter re got em gelege xwedî çand, dîrok û hunereke kevnare ne. Em dixwazin ku Kurdistana Sora ku ji bo me hatibû damezirandin careke din ji bo me were avakirin”.<sup>76</sup>

Mihemed Emîn Ezîz jî diyar dîke ku ewan gotiye em dikarin 6 otonomiyê çandê (navendên çandê) ji bo we vekin. Her wisa Mihemed Emîn Ezîz diyar dîke ku pêşniyar kiriye ku ji van navendên çandê 3 heb li Qazaxistanê yek li Tirkmenîstanê yek li Azerbaycan yek jî li Kirgizîstanê werin avakirin. Li ser vê yekê Mihemed Babayev bi awayekî vekirî vê bersivê dide:

“Ji me re navendên çandê ne lazim in ji me re dewletek lazim e”<sup>77</sup>.

Ji van dîyalogan jî diyar dibe, her çend piştî mirina Stalîn gelên din dikaribûn vegerin welatê xwe jî dewlete Sowyetê nedixwest kurd vegerin li ser cih û warên xwe. Piştî van nîqaşan alîkarên Kruşçev dibêjin ku em dê van daxwazên we ji bo serokê xwe ragihînin û ji bo çareserîya pirsgerêkê jî em dê bi partiya Komûnîst a Azerbaycanê re bikevin têkiliyê. Piştî demeke kin bersivê ji lijneyê re tê û di vê bersiva Komîsyona dewleta Sowyetê de tê destnîşankirin ku daxwazên wan hatine red kirin. Lê disa jî komîsyon diyar dîke ku eger bixwazin ew dikarin navendên çandê ji bo wan vekin.


<sup>74</sup> Bêwar Barî Teyfûrî. Mehemedê Siloyê Bava (Babayêv Mamêd Sulêymanovîç) kî ye? Kiyê?. <http://hertist.com/1448/29/Befranbar2016>

<sup>75</sup> Mehemedê Siloyê Bava Vido rêportaj. <https://www.facebook.com/Enst%C3%AEtuya-kurd%C3%AE-ya-Qafqas%C3%AA-417476475257350/>. 04.01.2017

<sup>76</sup> Evren, Seyit, Sovyet Kürdlerinin Büyük Özlemi: Kızıl Kürdistan-1 <https://www.sosyalistforum2.net/showthread.php?t=5738> . 28. 05.2016

<sup>77</sup> h.v.r

Heya sala 1989an ji bo daxwazên siyasî yên kurdan ti gav nehatin avêtin. Piştî siyaseta Gorbaçov a “jinûveavakirina Sowyetê” kurd dîsa dikevin nava hewldanan de. Di heman salê de li ser axa Kurdistanê û Karabaxê şerê ermen û azeriyan rû dide. Di vê salê de dîsa di bin serokatiya Mihemed Babayev de Komîteya Yekbûnê<sup>78</sup> hatê avakirin. Komîteya Yekbûnê ji bo dîsa damezirandina Kurdistanê û kurdên ku ji Ermenîstanê di sala 1988-1989an hatibûn sirgûnkirin vegerin welatê xwe dikeve nava liv û tevgerê. Mihemed Babayev bi wezîrê hundirîn ê Azerbaycanê re dikeve têkiliyê û dibêje eger hûn ji kurdan re deriyê xwe vekin ez soza 13 hezar leşker didim ku li dijî Ermenîstanê şer bikin. Lê Azerbaycan vê daxwaz wî napejirîne.<sup>79</sup>



Nexşe: 3 Bajarê Laçîn

<http://tarix.info/maraqli/tarixi-meqaleler/2475-lan-hri.html>

Dema Babayev di van hevdîtinan de sernakeve careke din berê xwe dide Moskowayê. Babayev ji bo xebata ku di salên 1960î de bi serneketîbû careke din dikeve nava tevgerê. Lê nêrînên Babayev hatine guhertin û li gor wî yekne riya azadkirina Kurdistana Sor êdî şereke. Lê endamên Komîteyê vê yeke napejirînin.

Di 11ê Gulana 1989an de kurdan 8 rojan di qada navdar a Moskowayê li qada Puşkînê çalakiya rûniştinê li dar xistin. Her çend dewleta Sowyetê bertekek tund li hemberî van çalakvanan nîşan dabe jî kurdan dev ji daxwazên xwe bernedan. Loma piştî 8 rojan serşewirmendê serokê dewleta Sowyetê Gorbaçov Papov neçar dimîne ku heyeteke kurdan pêşwazî bike.

<sup>78</sup> h.v. r

<sup>79</sup> h.v. r

Papov di civînê de ji vê heyetê re dibêje şerek di navbera dewleta Azerbaycanê û Ermenîstanê de heye, lê ji bo ku şereke duyem ji bo kurdan jî dernekeve soz dide ku ew dê komîsyonekê damezirînin. Piştî vê yekê çalakiya kurdan bi dawî dibe. Heyeta kurdan ji Moskowê diçe Qazaxistanê û li vir li benda avakirina komisyonê dimînin. Lê dewleta Sowyetê Komîsyonekê ava nake an jî ava kiribe jî ev komîsyon nakeve nava tevgerê. Di sala 1991an de dewleta Sowyetê hildiweşe û dewletên ku giredayî Sowyetê bûn serxwebûnên xwe radigihînin.



Di heman demê de Şerê di navbera ermenî û azeriyan de ji bo Kurdistana Qafqas jî geştir dibe û di 17ê Gulana 1992an de Laçîn<sup>80</sup> bi tevahî dikeve bin kontrola hêzên ermenîyan. Di 03-06.04.1993an de leşkerên Ermenîstanê dikevin bajarê Kalbajarê.<sup>81</sup> (Nexşe: 4) Di 30-31.08.1993an de bajarê Qubatlî<sup>82</sup> (Nexşe: 5) û di 29-30.10.1993an de jî Zengîlan<sup>83</sup> (Nexşe: 6) dikeve bin serweriya dewleta Ermenîstanê. Piştî vê yekê kurdên vê herêmê di nava 64 bajar, navçe û gundên Azerbaycanê de têne belavkirin.<sup>84</sup>

<sup>80</sup> M.F Axundov adına Azərbaycan Milli Kitabxanası, Yaddan çıxmaz Qarabağ . 2007. r 13

<sup>81</sup> Qan yaddaşı. / <http://tarix.info>.14.06.2016

<sup>82</sup> İşğal faciəsi. <http://www.azerbaijans.com>.14.06.2016

<sup>83</sup> Əliyeva, Leyla, "Xocalıya Ədalət". berg I. Bakı 2014. r 6


<sup>84</sup> Azərbaycan Respublikası Prezidentinin İşlər İdarəsi, Prezident kitabxanası. İnzibati-ərazi vahidləri. PDF, r 106,124,130,213

Niha jî Kurdistanana Qafqasyayê di bin kontrola ermeniyana de ye û li ser wê di nava ermenî û azeriyana de hê jî şerek heye. Piraniya kurdên Kurdistanana Qafqasyayê niha li Azerbaycanê dijîn û ev kurd niha di bin asîmîlasyonê giran de ne. Piraniya wan zimanê xwe jî wînda kirine.



Nexşe: 5 Bajarê Qubadli

<http://www.virtualkarabakh.az/menu.php?lang=4&id=134>



Nexşe: 6 Bajarê Zəngilan

<http://www.virtualkarabakh.az/menu.php?lang=4&id=134>

هه و النامه ی کینێر



## 2.4. Kurdên Azerbaycanê

Kurdên ku li bajarên Laçîn, Kalbajar, Qubatli, Zengîlan û Naxcivana Xweser dijîn weke kurdên Azerbaycanê têne binavkirin.<sup>85</sup> Piştî ku di sala 1988an de di navbera dewleta azerî û ermeniyana de şerê Karabaxê dest pê dibe kurdên li herêma Kurdistanê jî naçar dimînin ku ji welatê xwe derkevin. Piştî ku di sala 1992-1993an de artêşa ermeniyana kontrola herêma xweser a Karabaxê dixwe destê xwe kurdên li herêma Kurdistanê jî koçî deverên cuda yên Azerbaycanê dikan.

Piraniya kurdên ku li Naxcivana girêdayî Komara Azerbaycanê dijîn beriya sedsala 19an rastî asimilasyonê hatine. Kurdên ku di destpêka sedsala 19an û dawiya sedsala 20an de niştecih bûne jî di sala 1937an de ji hêla Stalîn ve (siyaseta departasyonê) ber bi Kazaxîstan û Asyaya Navîn hatine mişextkirin. 20 hezar Kurdên din yên ku li Naxcivana dijîyan jî ji ber sedemên aborî û siyasî koçî Ûrîsyaya û Asyaya Navîn kirine.<sup>86</sup>

Piştî hikûmeta Sowyetê tê demezirandin kurd cardin vedigerin warê xwe. Piştî sala 1926an kurd bi girseyî li dora Araratê fitilîn û li bajarê îstasyona Arazdayanê bi cih bûn.<sup>87</sup> Li gor hejmara Komara Azerbaycanê ya salên 1920î de li Naxçivanê 3180 kurd dijîyan. Ji agahiyên Bukşpan jî diyar dibe ku di vê hejmartinê de tenê kurdên ku bi kurdî diaxivîn weke kurd hatine qebûl kirin.

Kurdên ku Bukşpan wan weke kurdên “Zîlanê” bi nav dibe piraniya wan girêdayî eşîra Burukî û Celaliyan in. Kurdên ku di sala 1937an de ji hêla Stalîn ve têne mişextkirin jî ev kurd in. Di payîza sala 1937an de 18 herêmên ku niştecihên wan hemî kurd bûn beyî ku yek kes li cihê xwe bimîne li îstasyona Arazdayanê têne komkirin û bi trênen barkêş têne mişextkirin.<sup>88</sup> Li gor agahiyên ku Hejarê Şamîl dide kurdên Şewlîka, Banoka, Beşka, Qotka, Elka, Pîrka, Hîçîmka, Mîsîrka, Hesanka û hwd. ku li gundên Borelan, Qîqaç, Axêyar, Qerebiru, Yanix, Demerlî, Gorêvan, Mentîka Şêvîka, Gorêvanêyî, Kelafel dijîyan û her wisa endamên eşîra Celaliyan jî hatine mişextkirin. Piştî sala 1937an li Naxcivana tenê li gundê Derekendê kurd mane û ev gund weke gundê kurdan tê naskirin.

<sup>85</sup> Şamil, Hejare, Diaspora Kurtleri, peri yayınları, İstanbul 2005

<sup>86</sup> h.p

<sup>87</sup> h.p

<sup>88</sup> h.p

Xuya ye ku kurdên li Azerbaycanê dijiyan serdema Sowyetê jî di nav de her demê rastî politikayên asimilasyon û mişextkirinê hatine. Her wisa di serdema Êrîsa Çarî de jî kurd rastî politikayên zordariyê hatine.

Di daneyên fermî yên ku li jêr dê werin dayîn de hejmara kurdên li vê herêmê hatiye diyarkirin. Ev yek dê derbarê hejmara kurdan de agahiyên zelatir bide.

<b>Li gor Daneyên Dewletê di Êrîsa Çarî de Hejmara Kurdên ku di nava Sînorên Azerbaycanê de Dîjiyan.<sup>89</sup></b>					
1855	1873	1886	1897	1902	1909
12,248	15,366	33,830/34,162	3,042	44,00	52,000

<b>Di sala 1926an de hejmara gelên ku di nava sînorên Xweseriya Kurdistanê de dijiyan.<sup>90</sup></b>								
<b>Gelên Li Herêmê</b>	<b>Hemu herêmê</b>	<b>Laçin</b>	<b>Qarqışlaq</b>	<b>Kalbajar</b>	<b>Qoturî.</b>	<b>Kubadî</b>	<b>Kurdhacî</b>	<b>Muradxanî.</b>
<b>Hemû</b>	51 426	435	6 050	12 046	4 888	13 533	8 285	6 189
<b>Kurd</b>	37 182	110	6 003	11 967	4 873	1	8 169	6 059
<b>Azerî</b>	13 745	164	21	62	13	13 367	99	19
<b>Ermen</b>	373	66	8	12	2	162	13	110
<b>Êris</b>	81	57	15	4		1	3	1
<b>Ukraynî</b>	20	18	2					
<b>Gûrcî</b>	3	3						
<b>Elman</b>	2	2						
<b>Tatar</b>	1		1					
<b>Avar</b>	1	1						
<b>Lezgî</b>	1	1						

<sup>89</sup> b.n.r. Hajar Şamîl, Dîaspora Kurdlerî

<sup>90</sup> Ethno-Caucasus, Этнодемография Кавказа <http://www.proxtik.com/browse.php?u=UHKasu5Jmg3b722sI3Ya6DiiQP%2FsBJVg1KeMnK58k7%2FwPcUkpK51enL3fMnI&b=5>

<b>Li gor danayên dewletê di serdema Sowyetê de hejmara kurdên ku di nava sînorên Azerbaycanê de dijiyan.</b>							
1921	1926	1937	1939	1959	1970	1979	1989
32,780 <sup>91</sup>	40,900 <sup>92</sup>	10,878 <sup>93</sup>	6,000 <sup>94</sup>	15,000 <sup>95</sup>	5,488 <sup>96</sup>	5,700 <sup>97</sup>	12, 200 <sup>98</sup>

<b>Di navbera salên 1979,1999, 2009an de li gor daneyên fermî bajar û navçeyên Azerbaycanê yên ku kurd lê dijîn.<sup>99</sup></b>			
<b>Nevên Bajaran û Navçeyan</b>	<b>1979</b>	<b>1999</b>	<b>2009</b>
<b>Di nava welêt de bi giştî hejmara kurdan</b>	5 676	13 075	6 065
<b>Laçîn (Niha hamû mîşextî bûne. N. Ş)</b>	2 437	5 073	1 914
<b>Naxçivan Xoser</b>	1 696	2 282	1 321
<b>Samux</b>		865	753
<b>Xaçmaz</b>	485	607	603
<b>İsmayilli</b>		382	498
<b>Yêvlax</b>		879	210
<b>Bajêrê Baki û li derdora wê</b>	51	760	185
<b>Goranboy</b>	...	162	102
<b>Qazax</b>		102	100
<b>Axstafa</b>		67	68
<b>Kalbajar (Niha hamû mîşextî bûne. N. Ş)</b>	4	1 248	38

<sup>91</sup> Обзор деятельности Совета народн. комиссаров ЗСФСР, Тбилиси, 1923, стр. 16

<sup>92</sup> Əliyeva, F.Ə. Azərbaycan SSR Cənubi Qafqazın ən çox millətli respublikasıdır, (1920-1930-cu illər), Bakı Universtetinin xəbərləri-humanitar elmlər seriyası, № 2, 2012

<sup>93</sup> Всесоюзная перепись населения 1937 года: общие итоги. Сборник документов и материалов. М.: РОССПЕН, 2007 г. г 107

<sup>94</sup> Əliyeva, F.Ə, 2012

<sup>95</sup> Всесоюзная перепись населения 1959 года. Национальный состав населения по республикам СССР: Азербайджанская ССР---Источник: РГАЭ РФ (быв. ЦГАНХ СССР), фонд 1562, опись 336, ед.хр. 1566а -1566д

<sup>96</sup> Всесоюзная перепись населения 1970 года. Национальный состав населения по республикам СССР: Азербайджанская ССР---Источник: РГАЭ РФ , фонд 1562, опись 336, ед.хр.3998-4185 (Таблица 7с. Распределение населения по национальности, родному и второму языку.)

<sup>97</sup> STATE STATISTICAL COMMITTEE OF THE REPUBLIC OF AZERBAIJAN, POPULATION OF AZERBAIJAN, BAKU 2017

<sup>98</sup> h.p

<sup>99</sup> h.p

<b>Goygol</b>	299	123	34
<b>Bajarê Gence</b>		122	31
<b>Terter</b>		77	27
<b>Abşêron</b>		...	27
<b>Şekî</b>	115	47	26
<b>Şemkîr</b>	...	68	22
<b>Oguz</b>		...	21
<b>Agcabedî</b>		1	18
<b>Lenkeran</b>		...	14
<b>Zengîlan (Niha hamû mîşextî bûne. N. Ş)</b>		...	14
<b>Bajarê Sumqayit û li derdora wê</b>		...	9
<b>Daşkesan</b>		20	8
<b>Bajarê Mîngeçêvîr</b>		5	7
<b>Salyan</b>	3	4	4
<b>Şuşa (Niha hamû mîşextî bûne. N. Ş)</b>		33	3
<b>Gedebey</b>		32	1
<b>Tovuz</b>	1	47	...
<b>Goyçay</b>		6	...
<b>Berde</b>		3	...
<b>Xocali (Niha hamû mîşextî bûne. N. Ş)</b>		2	...
<b>Fuzulî (Niha hamû mîşextî bûne. N. Ş)</b>	...	1	...
<b>Saatli</b>			1

<b>Li gor daneyên fermî yên dewletê hejmara kurdên ku di nava sînorên Komara Serbixwe ya Azerbaycanê de dijîn.</b>	
1999	2009
13,100 <sup>100</sup>	6,065 <sup>101</sup>

<sup>100</sup> h.p

<sup>101</sup> h.p

## BEŞA SÊYEM

### NIMUNEYÊN FOLKLORA KURDÊN LI AZERBAJCANÊ

Xebatên derbarê folkloro kurdan de hatine kirin pir berfireh in. Li vir ji bo xebatên di serdema Êrîsa Çarî û dewleta Sowyetê de yên li ser folkloro Kurdên Qafqasyayê hatine kirin xwedî giringiyê cuda ne. Loma divê gava behsa xebatên folkloro kurdî were kirin, divê qala xebatên ku di serdema dewleta Uris û Yekitiya Sowyetê de hatine birêvebirin de jî were kirin. Di serdema Sowyetê de lêkolînên zanyarî di navendekî de dihat birêvebirin. Loma jî weke gelek zanyarên Êrîs, azerî, gürcû û ermenî, zanyarên kurd jî gelek xebatên li ser kurdolojiyê kirine. Em dikarin taybet qala xebatên kurdologa Êrîs T.F. Arîstova û etnografê azerî Elekberov bikin. Ji bilî van kesan dehan etnograf û folklornasê azerî li ser axa ku dikeve di nava sînorên Kurdistana Qafqasyayê de gelek xebat kirine. Lê ew keresteyên hatine tomarkirin ne weke hêmanên folkloro kurdî lê weke yên azerîyan nîşan dane.<sup>102</sup> Êro jî di nava xebatên li ser folklor û dîroka Azerbaycanê tenê kirin de em çav bi heman tiştî dikevin.<sup>103</sup>

Di sala 1787an de cara yekem li Êrîsyayê P. S. Pallas ji 300 bêjeyên kurdî ferhengê amade kir.<sup>104</sup> Di dawiya sedsala 18 û destpêka sedsala 19 de gelek gotar hatine nivîsîn û hin xebatên cur bi cur hatine kirin.<sup>105</sup> S. A. Êqîazarov di warê hinbûna folkloro kurdên qafqasyayê de weke kesê yekem tê nasîn. Bi lêkolînên xwe wî gelek agahî ji bo me hiştiye.<sup>106</sup>

<sup>102</sup> Rəhimli İlham, Azərbaycan Tətvir Tarixi, Bakı 2005, r 19,

<sup>103</sup> -Azərbaycan Milli Elmlər Akademiyası, Qarabağ folkloruda bir tarixdir, (Ağdam, Füzuli, Ağcabədi, Cəbrayıl, Zəngilan, Qubadlı,Laçın və Kəlbəcər rayonlarından toplanmışfolklor örnəkləri), Ber.I,III. Bakı 2012;

-Azərbaycan Milli Elmlər Akademiyası, Qarabağ folkloruda bir tarixdir, (Laçın, Qubadlı və Zəngilan rayonlarından toplanmış folklor örnəkləri), Ber.IV, Bakı 2013;

- Azərbaycan Milli Elmlər Akademiyası, Qarabağ folkloruda bir tarixdir, (Kəlbəcər rayonundan toplanmış folklor örnəkləri), Ber.VIII, Bakı 2014.

<sup>104</sup> Паллас, П.С. *Сравнительные словари всех языков и наречий*, ч. I-II, СПб, 1787.

<sup>105</sup> «Библиографию по курдоведению», М., 1963.

<sup>106</sup> Егiazаров С.А. Краткий этнографический очерк курдов Эриванской губернии; Егiazаров С.А. Курманджийские тексты; Егiazаров С.А. Краткий этнографическо-юридический очерк езидов Эриванской губернии; Карцев Ю.С. Заметки о турецких езидях. - Егiazаров С.А. Извлечение из заметок Сиуффи о езидях; Егiazаров С.А. Краткий Курманджийско-русский и русско-курманджийский словари, XIII, вып. 2, Тифлис, 1891 (далее- ЗКО ИРГО)

Di serdema sowyetê de ev xebat hîn berfirehtir bûn. Di vê serdemê de cara yekem di 1930an de ji F. B. Rostopçîn derbarê kurd û Kurdistanê de berhem derxistin. Piştî Rostopçîn J.S. Mosaelyan derbarê kurdan de berhemeke din a giring nivîsandîye. Ji bilî vankesan fêrbûn û hînbûna folklorê kurd de xebatên van kesan jî pir hêja ne. X. Abovyan, P.Î. Avêryanov, Î. Bêrêzîn, D. Bêlyayêv, V. Dîtêl, A.D. Jaba, Y.S. Karsêv, P.Î. Lêrx, V.F. Mînskîy Derbarê hînbûn û lêkolîna pîrsgirêkên kurdolojiyê de keda Î.A. Orbêli<sup>107</sup>, N.Y. Marru<sup>108</sup>, V.F. Mîllêr<sup>109</sup>, B.V. Mîllêr<sup>110</sup>, V.A. Qordlêvskîy<sup>111</sup>.

Di serdema desthilatdariya Sowyetê de kesên xwedî berhemên mîna H. Cîndî, I.O. Farîzîv, Emînê Evdal, Î.T. Sukêrman, Q.B. Akopov, N.A. Xalfîn, Ç.X. Bekoyev, Y.L. Vîlçêvskîy, M.S. Lazarov, A. Memednezêrov, N.X. Mahmudov, K. K. Kurdayev<sup>112</sup>, Ş. Mîkoyan, M.B.Rudênko, X. Çatoyêv, A. Şamîlov hebû. Ji bilî van

<sup>107</sup> О заслугах . «Иосиф Абгарович Орбели», Ереван, 1957; Н.Я.Март, С.Ольденбург, И.Крачковский, *Записки об ученых трудах И.А.Орбели*, «Известия Российской академии наук», т. 18, 1924; К.Н.Юзбашян, *Академик Иосиф Абгарович Орбели*, М., 1964; Б. Н. Аракелян, *Орбели И.А. Избранные труды*, Ереван, 1963.

<sup>108</sup> Март, Н.Я. «Записки Восточного отделения императорского Русского археологического общества», т. XX, 1912; Н.Я.Март, *Племенной состав населения Кавказа. Классификация народов Кавказа*, - «Труды комиссии Российской Академии наук по изучению численного состава населения России», Пг., 1920. О Марте см.: В.А.Миханкова, *Николай Яковлевич Март*, М.-Л., 1949; О.Л.Вильчевский, *Н.Я.Март и курдоведение*, - «Язык и мышление», берг. VIII 1937.

<sup>109</sup> Миллер, В.Ф. *Систематическое описание коллекций Дашиковского этнографического музея*, вып. I, М., 1887-1893; вып. II, М., 1889; В.Ф.Миллер, *Отголоски Ростемиады у курдов*, - «Этнографическое обозрение», т. IX, 1891, №2. Б.А.Калоев, В.Ф.Миллер- кавказовед, Орджоникидзе, 1963.

<sup>110</sup> Миллер, Б.В. *К вопросу об языке населения Азербайджана до отуречения этой области*, - «Ученые записки Института этнических и национальных культур народов Востока», т. I, М., 1930; Б.В.Миллер, *Курдский язык*, - «Литературная энциклопедия», т. V, 1931; Б.Миллер, *Курдская литература*, - там же; Б.Миллер, *Показатель множественности «ан» в иранских языках*, - в кн.: «Памяти академика Н.Я.Марра», М.-Л., 1938; Б.В.Миллер, *Труды русских ученых в области иранского языкознания*, -«Ученые записки МГУ», вып. 107, т. III, 1946, оп. 2; Б.В.Миллер, *О некоторых проблемах курдской фонетики*, - в кн. «Иранские языки», т. II, М.-Л., 1950; Б.В.Миллер, *Образцы говора курдов Советского Азербайджана*, - «Труды Института языкознания», т. VI, 1956.

<sup>111</sup> Гордлевский, В.А. *Из жизни курдов*, - «Известия Кавказского отделения Русского географического общества», т. XXII, 1913-1914, № 4; «Русские ведомости», (М), 1915, № 12; В. А. Гордлевский, *Из истории Вана*, - «Известия Кавказского отделения императорского Русского географического общества», т. XXIII, Тифлис, 1915, № 2 (далее- ИКО ИРГО); В. А. Гордлевский, *У сипандагских курдов*, - «Мусульманский мир», год 1, Пг., 1917; В. А. Гордлевский, *Государство Сельджуков Малой Азии*, М.-Л., 1941; В. А. Гордлевский, *Из религиозных исканий в Малой Азии*, - «Новый Восток», кн. 1, М., 1922.

<sup>112</sup> Kurdo, Qanatê, *Met û Zîn, Duwanzde Variyant*, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1996.

kesan E. Pçêlînan<sup>113</sup>, A. Elekberov<sup>114</sup>, T.F. Arîstova, Q.F. Çursîn<sup>115</sup>, A. Bukşpan<sup>116</sup> jî ji bo xebatên kurdolojiya li sowyetê hatiye kirin gelek berhem dane.

Ev xebatên li jor qala wan hatine kirin ji bo kurdolojiya Ûrisa Çarî û dewleta Sowyetê dewlemendiyeke mezin ava kirine. Lê ji bo Kurdistana Qafqasyayê xebatên Tatîana Fyodorovna Arîstova<sup>117</sup> û Çerkez Bekoyev<sup>118</sup> pir giring in. Di warê etnografya Kurdistana Qafqasyayê de dikare were gotin ku xebatên Arîstovayê yekane xebatên zanîstî ne. Çerkez Bekoyev jî li ser zimanê kurdên Kurdistan Qafqasyayê lêkolîn kiriye û di xebata xwe de hin nimûne ji çîrok û kurte çîrokan daye.

Ji van agahiyan jî diyar dibe ku gelek xebat li ser folkora kurdên Qafqasyayê hatine kirin. Lê îro ew derfet hinbihin winda dibin Ev yek jî derfetê dide ku li ser folklorê kurdên Kurdistana Qafqasyayê xebatek bê kirin. Li jêr girêdayî vê yekê hin nimûneyên ji folklorê kurdên Kurdistana Qafqasyayê werin dayîn.

### 3.1. ADET Û TORE

Adet û tore bi giştî raman û tegihîştina gel a li ser jîyanê di nava xwe de dihewînin. Mirov bi van adet û toreyan di nava civakê de dijî û wan diparêze. Ev adet û tore di her serdemê de kirinên civakê jî diyar dike. Her wisa adet û tore di serdemên berê ve di nava qanûnên civakî de jî cih girtine. Derbarê ve yekê de L. Morgan wisa dibêje: “rêzikên eşîrî yên berê bingeha xwe ji adetên ku di hêza qanûnan de bû distandin”<sup>119</sup>. Di dîrokê de adet û tore weke “rêzikên tevgerên civakî yên runîştîne ku ji nîşan derbasî nîşên nû bûye û bi vê yekê jî vîna gel a civakî parastî ye”<sup>120</sup> tê dîtin. Ligel ku kurdên Azerbaycanê ji zû de ne xwedî statûyekê jî bin, û li gel ku –ne bi zimanê kurdî jî bin-, hîna jî adet û toreyên xwe diparêzin.

<sup>113</sup> Пчелина, Е. По Курдистанскому уезду Азербайджана, - «Советская Этнография», 1932, № 4.

<sup>114</sup> Алекперов, А. К вопросу об изучении культуры курдов, - «Труды Азербайджанского филиала АН СССР», çar. 25, Баку, 1936.

<sup>115</sup> Чурсин, Г.Ф. Азербайджанские курды (Этнографические заметки), -«Известия Кавказского историко-археологического института», т. III, Тифлис, 1925..

<sup>116</sup> Буқшпан, А. Азербайджанские курды, Баку, 1932.

<sup>117</sup> Аристова Г. Ф. Курды Закавказья. Moskov, 1966

<sup>118</sup> Бакаев, Ч.Х. Язык Азербайджанских Курдов, Moskov 1965

<sup>119</sup> Морган, Л. Древнее общество. Ленинград, 1934. р. 26

<sup>120</sup> Şükürov, A. İslam, adət, ənənə. Bakı, Azərənəşr, 1981. r. 8

### 3.1.1. Adetên Dawetê

Ji van adet û toreyan jî adetên dawetê ji ber ku gelek hêmanên folklorê di nava xwe de dihewîne xwedî girîngiyekê ne. Di adetên dawetan de tiştên giredayî civakê ne bi cewhera xwe derdikevin pêş. Dawet di nava adetan de bi serê xwe qadeke cuda pêk tîne. Loma divê em li ser adetên dawetê yek bi yek bisekinin.

Di nava kurdên Azerbaycanê de dema qala adetên zewacê tê kirin di serî de divê qala adeta dîtina keçan ji bo zewacê were kirin.

“Di serdemên berê de keçên (jin) berzewac an li ser kaniyan, an di dawetekê de an jî di karekî hevpar de li qismetên xwe digeriyan” (j.d.r 7). Piranî jî malbatên xortan keç didîtin û pişt re jî ji bo kurên xwe diçûn xwezgîniyan. Lê di serdema nûjen de weke gelek deverên cîhanê di nava kurdên Azerbaycanê jî ev adet ji holê rabûne. Ev adet jî weke gelek tiştên din ji aliyê civakê ve hatin nûjenkirin, an jî em dikarin bêjin bi şêweyê nûjen girtin. Xort û keçên niha yê piştî hevdîtinan hev ecibandî mijarê ji dê û bavê xwe re vedikin. Eger malbat naskirî bin mala xortan ji bo zewacê bi malbata keçan re dikeve têkiliyê. Eger malbat jî li hev bikin zewac pêk tê. Lê eger li hev nekin û xort û keç ji biryara xwe venegerin her çend kêmbê jî bûyerên revandinê derdikevin pêş:

*“Di xwestina keçan de em dibînin ku jin pêşengiyê dikin. Ji bo xwestinê her çend jin pêşengiyê bikin jî mêr jî bi awayeke veşartî di nava pêvajoyê de cih digrin” (j.d. 8).*

Di xwestina keçan de hin adet balkêş in. Ji bo dîtina jin sibê zû diçûn mala keçan û dixwestin bi çûneke zû piştî ku keç hişyar be wê bibînin. Armanca ew bû ku keç di xwezayî ya xwe de were dîtina. Malbata xortan beyî ku armancên xwe diyar bikin diçûn li ber derê malbatên keçan û diketin hundir. Dema dibûn mêvan û bi malbatê re diaxivîn jî qet qala armanca hatina xwe nedikirin. Di nava axaftinê de jî malbatên xortan ji keçan tiştêk daxwaz dikirin û bi vê yekê jî dixwestin rewş û tevgerên keçan bibînin. Ewan bala xwe didan li ser hatin, çûyin, rûniştin û rabûna keçan. Heta ji bo kifşkirina dîtina û bihîstina keçan malbatên xortan diketin nava hewldanê. Ewan bi vê yekê dixwestin ezmûna keçan pêk bînin. Di ezmûna keçan de hin tiştên balkêş jî hebûn. Wek mînak jinan şelpeyêkê spî û paqij beyî ku keç bizane diavêtin ber lingên keçan. Dema keçan pê şelpeyê dikir jinan ew ji erdê radikirin. Bi vê yekê ewan



dixwestin paqijiya lingên keçan hîn bin. Dîsa jinan dema xatir ji keçan dixwestin ew ji lêvên wan maç dikirin. Bi vê yekê jî ezmûnek li ser bêhnê dikirin. Li gorî bêhn paqijiyê jî biryar didan. “Jinên ku diçin malbatên keçan dema vedigerin dîtînen xwe ji bo malbata xortan par ve dikin. Eger keç were ecibandin pîrejinekê ji bo xwestinê dişînin malbata keçan. Pîrejina diçe malbata keçikê dixwaze ev xwestina wan ji bavê keçikê re jî were gotin” (j.d.r 7). Carna ev daxwaz ji aliyê malbata keçan ve nayê pejirandin. Hingê jî kesê herî navdar ê gund an jî herêmê ji bo xwestinê dikeve navberê.

Li gor adetê bavê kêçikê di cara yekem a xwestinê de an zewacê napejirîne an jî diyar dike ku ew dê bi xizmên xwe re mijarê bişewrîne û pişt re biryara xwe bide. Di vê cara yekem de malbatan xortan dest vala vedigerin malên xwe. Ev hatin û çûyîn heya keçik jî vê zewacê erê bike dom dike. Di vê hatin û çûyînê de jî hin adetên xwezgîniyê ku niha jî di nava kurdên Azerbaycanê de hene pêk tên. “*Wek mînak eger bavê keçikê destûr nedabe ji bo zewacê kesên diçin çayê venaxwin. Bav ji bo nêrîna keça xwe hîn bibe hevsera xwe dişîne*” (j.d.r6). Li gor adetê eger keçik vê zewacê bixwaze deng dernaxe. Ev bê dengî tê wateya erêkirinê. Piştî dayîk vedigere civatê û li gor adetê dibêje ya girîng ew e ku bav vê zewacê erê bike. Piştî vê gotina dayîke bav jî zewacê erê dike û ji bo keç û xortan şadiyê dixwaze:

“Pişt re jî mêvanên ji bo xwezgîniyê hatine xwarina xwe dixwin û çaya xwe jî vedixwin. Roja nîşanê tê diyarkirin û ji bo nîşanê dest bi amadekariyan tê kirin”(j.d.r. 9).

Kes û belgeyên ku em weke çavkanî wan bi kar tînin gelek agahî derbarê adetên dawetên de ji bo me pêşkeş kirin.

### **3.1.1.1. Beriya Dawetê Hin Adetên Nîşankirinê**

Nîşan beriya dawetê qonaxa herî girîng e. Di merasîma nîşanê de divê teqez gustîlk ji bo bûke were standin. Ji bilî gustîlkê ji bo bûkê gelek kinc û alavên xwestî têne birin. Ev alav ji çend xalîçe, çend lehîf û balgîn û sandoqa bûkê pêk dihat. “Di nava sandoqa bûkê de jî heft heb desmal, derzî û gelek alavên bi vî rengî cih digirt” (j.d.r.10). Lê divê teqez çarîkeke jî ji bo bûkê were standin. Di serdemên berê de ji bilî pîvaz, îsot û tiştên bi vî rengî hemî xwarin ji hêla mala zavê ve ji bo mala bûkê dihate birin. Lê di roja me ya nûjen de êdî pîranî mala bûkê xwarin û vexwarinê

nîşanê amade dikin. Di destpêka merasîma nîşanê de sifreyên xwarinê tê amadekirin û mêvanên ku tên li ser van sifreyan xwarinê dixwin. Piştî xwarinê te rakirin û bûkê tînin û li ser deverê raserê civatê rûdinînin. Li pêşberî bûkê neynikek û çirayeke vêketî tê danîn. Diyariyên ji bo bûkê hatinê standin li pêşberî mêvana tê danîn. Çarika nazik a ji bo bûke hatiye standin bi serê bûke ve tê giredan. Pişt re gustîlkê dixin tiliya bûkê. Dema gustîlkê dixin tiliya bûkê jinek van gotinên li jêr dibêje:

“Xwedê şad bike.

Xwedê heft kura bide.

Bi kur û keç bibe”(j.d.r. 6). Piştî van gotunan, êdî merasîma nîşanê jî bi dawî dibe.

Navbera nîşan û dawetê carna çend rojan nabihure, lê carna jî çend sal di navbera nîşan û dawetê re derbas dibe. Eger cejn bikeve navbera nîşan û dawetê de hingê malbata zavê di diyariya de cejnê ji bo bûkê dişînin, taybet jî di cejna newrozê de zava ji bo bûkê gelek diyariya distîne. Dema malbata zavê ji bo dawetê amadekariyên xwe diqedîne bi malbata bûkê re dicivin û Ji bo daweta zavê û bûke rojên cuda tene diyarkirin, ji ber ku li gor adetên kurdên qafqasyayê du dawet tene lidarxistin (j.d.r.10) Yekem dawete bûke tê kirin.

Di daweta ku li cem bûkê dihat kirin tenê jin tevlî dibûn û ji bo bûkê diyarî distandin. Carna jî şirînahî ji bo bûkê dianîn. Hin jinan jî piştgiriya maddî ji bo bûkê dikirin. Li gor nîştecihekê herêmê *“berê malbata zavê xwarina ku li mala bûkê dihat dayîn amade dikir. Ev diyarî û pereyên di daweta bûkê de dihat komkirin ji bo ji bûkê û zavê re bimîne dişandin malbata zavê”*(j.d.r.7). Dema êvarê daweta bûkê dawî dibû ji mala bûkê ji bo mala zavê divê gerdek\* bihatina şandin. Lê divê ev gerdek ji hêla siwarên ciwan ên ku ji mala zavê hatibûn ve bihatina birin. Ji wan siwarên ciwan kî berî hevalên xwe bigihîştîya mala zavê diyarî ji bûkê distand. Piştî vê yekê destê bûkê dihat hinekirin. *“Dema destê bûkê tê hinekirin û ciwan ji mala bûkê derdiketin bi ser wan de av dihat rijandin. Ev av rijandina li ser ciwana dihat wateya paqijiyê”* (j.d.r.6).

Roja din sibê zû ji mala zavê dihatin, bûk û cihêzên wê dibirin mala zavê. Xizmên bûkê jî bi bûkê re diçun mala zavê. Berê dê û bav û birayê mezin bi bûkê re

---

\* Gerdek: Navê perdeya sor a ji mala bûke ji bo cihê taybet ê bûkê û zavê diyar bike hatiye anîn.

nediçûn mala zavê. Divê ev yek were gotin di nava kurdên Azerbêycanê de kêma cara dihate dîtin ku qelenê bûkê dihate standin. Dema qalanê bûkê dihate standin jî tenê di asteke sembolîk de dima. *“Cihêzên dê û bavê bûkê didan bûkê jî girîng dihate dîtin. Bavê bûkê di heman demê sewalên malê jî dida bûkê. Ev sewal weke milkên bûkê dihate hesibandin”* (j.d.r.5).

Ji agahiyên jor jî diyar dibe ku her du rojên dawetê yê ku di nava piranî kurdan de weke roja desthinekirin û roja dawetê tê zanîn di nava kurdên Azerbaycanê de weke daweta bûkê û daweta zavê tê binavkirin. Ji ber ku mêvan bêhtir diçin daweta zavê malbata zavê jî ji ber vê yekê amadekariyên berfirehtir dikin. Sibê zû daweta zavê destpê dike. Dema daweta zavê dest pê dike karwanê bûkê jî digihîşt mala zavê. *“Piştî ku bûk li ser hesp an jî ji maşînê dihate piyakirin pezek qurban dikirin. Xwîna ji qurbanê diherikî jî li eniya bûkê dixistin”* (j.d.r.7). Ev yek tiştêkî ku teqez divê hatiba kirin bû. Piştî vê yekê jî bûk diçû odeya xwe ya di mala zavê de. Heya ku diyarî ji bav û dayika zavê nestandibûna bûk li cihê xwe nedirûnişt. Piştîre bûk diyariyê xwe distîne di baxçe de dawet dest pê dike. Heya derengiya şevê dawet dom dike. Li gor adetan bûk di dawetê de naleyze. Kêma cara tê dîtin ku bûk di daweta xwe de dileyze. Ji bo lîstina bûkê divê diyariyeke pir baş bê dayîn. Lê divê qet rûyê bûkê di lîstinê de neyê xuyakirin. Derengiya şevê dawet bi dawî dibe. Aşiq\* li tembûrê dixê tê û tevî dawetê dibe. Di dawetê de ev aşiq kilam, destan an jî çîrokekî dibêje. Zava di mala ciranekî de heyra vê demê bi hevalên xwe re dema xwe diborîne. Du kes ji bo zava berzava/birazavayiyê dikin. Ev kes divê zavê biparêzin. Di vê adetê de eger beyî birazava kesek were û zavê bibe nabe. Wek mînak kesek bê zavê bibe zavê neçar ku xwestinê wan kesan pêk bîne. *“Yên ku zava birî çî bixwaze birazevayên zavê neçarî bidin. Dibe ku tiştêkî zavê jî bibin. Dive were gotin ku gelek mesrefên dawetê jî ji hêla birazavayên zavê dihate dayîn”* (j.d.r.7).

Dem a aşiq gotinên xwe bi dawî dike ji civatê hin ciwan argûr (meşale) di destan de diçin û zavê tînin dawetê. Ji bo zavê devereke taybet tê amadekirin û sêniyekê datînin nik zavê. Di her du kêlaka zavê divê birazava bisenin û ji bo her yekî an çira an jî mûmek tê pêxistin. Piştî vê yekê dîsa aşiq ji bo zavê kilamên xwe dibêje. Ji bo zavê bexşîşan dixwaze. Pere tê komkirin. Aşiq cara dawî kilamekî dibêje û dawet dawî dibe.

Ev adetên ku li jor me behsa wan kir, bêhtir adetên berê ne. Îro gelek ji wan adetan nemane, ne tenê ji ber asîmîlasyonê lê ji ber guherîna civakî jî ev yek pêk tê. Kurd ji ber ku ji hev dûr ketine û gelek deverên qafqasyayê belavbûne em êdî çav bi van adetan jî nakevin. Dîsa jî divê ev yek were gotin ku ev nirxên kurdan di nava folklorê gelên qafqasyayê û taybet jî di nava folklorê azerîyan de cih digire. Lê ji ber sedemên me li jor qala wan kir jî zanyarên azerî loma van adetan li ser folklorê gelê xwe dihesibînin.

### 3.1.2. Adetên Merasîmên Jidayîkbûnê

Di nava mirovan de çêbûna zarokan dibe sedema şadiyê. Dema di malbatan de nîfşên nû hatine dinyayê ji bo wan merasîmên cuda peyda bûne. Di nava folklorê kurdên Azerbaycanê de jî merasîmên adetên jidayîkbûnê hene. Heta di çavkaniyên nivîskî de jî xuya dibe ku ji bo kesên zarokên wan çenabî jî ev merasîm dihatine kirin. Wek mînak li gundê Qerecalliya ku girêdayî navçeya Qubadliyê ziyaretgeha şikefta Humay hebû.<sup>121</sup> Jinên ku zarokên wan çenedibûn ji bo zarokên wan çêbin diçûn vê ziyaretgehê. Jinan bawer dikirin ku piştî vê serdanê zarokên wan dê çêbin. M. Seydov<sup>122</sup> di pirtûka xwe de dinivîse ku, ev deverên pîroz li navçeya Laçîn û Kalbajarê jî hene.

Li ser merasîmên jî dayîkbûnê di nava civakê de gelek bawerî têne dîtin. Dê li beşa baweriyên gel de qala hin baweriyên li ser adetên jidayîkbûnê were kirin.

### 3.1.3. Adetên Şînê

Mîrov jî weke hemî giyananeweyên din tê li ser rûyê dinyayê zarokatiya xwe derbas dike ciwan dibe dibe û di dawiyê de jî dimire. Dîroka merasîmên ji bo miriyên digihîje wextê gelek dûr. Wek mînak neandertalan<sup>123</sup> miriyên xwe bi merasîmê vaşartine. Di şikefta Şanîdar a Herêma Kurdistan de dîsa em rastî nişaneyên ve merasîmê tîn.<sup>124</sup> Di vê şikeftê de gora miriyê ku hatiye veşartin bi gulan hatiye xemilandin. Ev yek jî nîşan dide ku di wê dema de jî merasîmên veşartinê hatine kirin. Di nava kurdan de jî ev yek wisa ye. Berê jî hatibû diyarkirin

<sup>121</sup> Seydov, M. Azərbaycan mifik təfəkkürünün qaynaqları. Bakı.Yazıcı nəşriyyatı.1983.

<sup>122</sup> h.p

<sup>123</sup> Francesco d'Errico, Palaeolithic Origins of Artificial Memory Systems: an Evolutionary Perspective. Cognition and Material Culture: the Archaeology of Symbolic Storage. McDonald Institute for Archaeological Research University of Cambridge, 1991.r 25, 28

<sup>124</sup> Insoll Timothy, Archaeology, Ritual,Religion. New York, 2004, r.29

ku kurdên li ku Azerbaycanê dijîyan mislimanên şî ne. Loma jî şîne wan jî giredayî ola wan e. Niha li jêr çend mînak derbarê adetên şîne kurdên Azerbaycanê de dê were dayîn.

Di nava kurdên kurdistana Qafqasyayê de dema kesek dimire ev rîtûel têne dîtin. Termê Kesa/ê mirî di nava odayekê de tê dirêjkirin. Jin tene û dest bi şîne dikin. Jin serê xwe vedirûn, kincên xwe diqetînin û mistan li singa xwe didin. Mêr jî di baxçe de ji bo termê kesê/a mirî bîşûn şûstingehê demkî amade dikin. Ev amadekarî ji hêla xizmên herî nêz ên kesê/a mirî vê tene kirin (j.d.r. 2). Dema termê tene şûstin li gor adetên termê kesê mirî divê piştî çûyîna rojê neyê binaxkirin. Eger roj neçûbe ava termê ji bo binaxkirinê ber bi goristanê ve tê rê kirin. Veguhastina termê li ser milên mêran pêk tê. Jin jî heya goristanê dimeşin. Di meşê de jin bi dengeke bilind şîna xwe dikin. Dema digihîjin li ser goristanê merasîma binaxkirinê ji hêla mêran ve tê kirin. Jin jî li deverê kom dibin û şîna xwe berdewam dikin. Dema serê gorê tene girtin eger kesê/a mirî ciwan be li ser gorê rûpîşteke rengê wê sor tene raxistin. Piştî re mêr xwe didin aliyekî û jin tene li ser gora kesê/a mirî û şîne dikin. Li gor rewşa kesê/a mirî (ciwanî, hevserî, xwdî zarok) kêma cara tene dîtin jin hin pûrta pora kesê/a mirî li ser gorê datînin.

Piştî merasîma binaxkirinê kesên tevlî merasîmê dibin sersaxiyê jo bo malbatê dixwazin. Kêma kesên ku tevlî merasîma binaxkirinê dibin diçin mala şîne. Li gor agahiyên çavkaniyên me heya sala 1960î adetek hebû ku mala şîne xwarin ji bo kesên dihat şîne amade nedikir (j.d.r.9). Ciranên malbatê ji bo kesên dihatin şîne xwarin dibirin. Ji sê rojîya kesê/a mirî destpê bike hefte û çileyê wî/wê de xwarin tene dayîn. Ji bo ku malbata şîne tengasiya nekişîne kesên tene şîne alîkariyê dikin. Ji bo kesa/ê mirî di şûstingeha demkî ya ku di roja yekem de hatibû avakirin de her roj çirayek tene pêxistin. Li gorî baweriyên wan rihê kesê/a mirî li dora xanî digere. Ji bo ku riya mirî ronî bike û ew riya xwe şaş neke ev çira sê rojan tene pêxistin. Heya çileyê wî/wê biqede jî jin tene mala şîne û li ser kinc û bergên kesê/a mirî şîne dikin. Divê ev yek jî li vir were diyarkirin ku şîngirtin li gor statûya kesên mirî naguhere. Lê eger mirî ji 6 salî biçûktir be ev rîtûel nayên kirin. *“Bawerî ew e ku ji ber ku zarokên vî temenî bêşûç in û ji bo wan ji Xwedê re dûa nayê kirin. Ji ber vê yekê dûakirina ji bo zarokan jî weke gunehkarî tene binaxkirin”* (j.d.r.2). Li gor van agahiyên xuya dibe ku

şîngirtin li gorî statû, rol û temenê kesan tê guhertin û eger ji şeş salî biçûktir be şîn naye girtin û eger mezin be jî şîn wextekî dirêj dom dike.

### 3.1.4. Cejnên Gelêrî û Pîrozbahî

Derbarê cejnên gel de gelek zanyaran agahiyên cur bi cur dane. A. F. Yeremev di berhema xwe de cejnên gel bi du awayî rave dike. Li gor Yeremev cejna gel bi awayê yekem de wisa tê pênasekirin:

“Ev yek pîrozkirina çosê ye. Rizgarbûna ji hestên negatîf in û pêşveçûyîna afirîneriyê ye. Di heman demê de mezinkirina yekitiya civaki ye”.<sup>125</sup>

Bi awayê duyem jî “dema bi cavekî fonksiyonel cejnê were nêrin tê dîtin ku dîrketina ji pêdiviyên jiyanê yên rojane”<sup>126</sup> diyar dike. Ji ramanên Yeremev diyar dibe ku cejn di demên nadîr ên ku mirov ji rêzika jiyanê dûr dikeve derdikeve holê. Valdênfêls jî bi vî awayî cejnên gel pênase dike: “hin rewşên ne rojane hene ku em kêma cara çav bi wan dikevin (cejn, festîval, ayînên û cur bi cur) rêkûpêkî ji xwe qanûnan dûr dikeve”<sup>127</sup> li gor Valdênfêls jî diyare ku cejnên gel di derasayiya rojane de derdikeve. Xuya ku cejnên gel bûyereke civakî û çandî rave dike û gel folklorê gelan radixîne ber çavan loma jî xwedî girîngiyekê ne.

Din nav kurdên Azerbaycanê de jî geleg cêjnên bi vî rengî hene, cejna Xidir Nebî, cejna Nevroz, cejna çerşama ax, cejna çerşama ba û hwd.

#### 3.1.4.1. Cejna Xidir Nebî

Cejnên gel ji wan cejninan ku xwedî dîrokeke herî kevnar in. Yek jî van cejninan cejna Xidir Nebî an jî Xidir Îlyas e. Ji agahiyan jî diyar dibe Xidir Nebiyê qala wî tê kirin karektereke mîtolojîk e. Lê gel baweriyê bi hatina Xidir Nebî tîne. Li qafqasyayê jî her gel li gor xwe vê cejnê pîroz dikan. Di nava kurdên kurdistanê qafqasyayê de jî ev cejn di nava gel de tê pîroz kirin.<sup>128</sup>

<sup>125</sup> Ермеев, А. Ф. Первобытная культура Ч 2 Саранск, 1997

<sup>126</sup> Ермеев, А. Ф. 1997

<sup>127</sup> Вальденфельс, Б. Повседневность как плавающий тигль рациональности // СОЦИО-ЛОГОС, Москва., 1991 Gündəlik

<sup>128</sup> Elekberov, E. Alavên tomarkîrî, Azərbaycan MEA Tarix Institutunun elmi arxivi. F.I.C.I. Qovluq 128. 1935

Cejna Xidir Nebî tê wateya hişyarbûna xwezayê, şînbûna axê, paqijbûna çem û robaran û h.w.d. Ji lêkolîna diyar dibe ku Xidir Nebî weke parêzvanê av, ax û hewayê hatiye pejirandin.<sup>129</sup> Xidir Nebî û Xizir Nebî jî wek yek kes tê hesabandin. Ji serdemên kevnare heya niha ev cejn di navbera çileyê pêşîn û çileyê paşîn \* de tê pîroz kirin. Ji gotinên pîr û kalan diyar dibe ku ev cejn berê bi çostir dihat pîroz kirin.<sup>130</sup>

Di lêgerîn û lêkolînên li ser qadê de hate dîtin ku ev cejn di nava deh rojên pêşî ya meha Sibatê de tê pîroz kirin.<sup>131</sup> Ji lêkolînan diyar dibe ku cejana Xidir Nebî bi çandinê re zêdetir têkildar e. Cejna Xidir Nebî sê rojan pêk dihat. Roja yekem ya cejnê de ji bo pesnê axê were dayîn stran dihatin gotin. Li ser axê ji bo bêhna bihare were lotik dihatin avêtin. Bexçe têne paqijkirin. Ji darên hişkbûyî yên di baxçeyan de êzing û gelaş têne komkirin û ew di nava bexçeyan de têne şewitandin. Di roja duyem a cejnê de ji bo her gayekî malbat xwedî dikin sê nanê kevir xistî\*\* tê pijandin. Di roja sêyem a cejnê de ji bo cotkaran stran dihatin gotin. Di van stranan de dihat gotin ku, “Xidirê ku agir di dest dê li ser hespê xwe yê boz were”. Ew dê ax germ bikiribûna û bi vê yekê jî av û rojê dê tendûristî bidabûna mirovan. Di heman demê de di şeva roja dawî ya cejnê de genim li ser sêlan dihat sor kirin. û xwarineke taybet (Xaşil) ji vî genimî di hat çekirin. Beyî vê xwarinê nabe ku cejna Xidir Nebî were pîroz kirin. Di sehera sibê de ciwan çira di dest de stranan dibêjin û cihê çandinê digerin û bawer dikin ku dê Xidir Nebî bibînin (J.d.r.4).

Etnografê azerî E. Elekberov ku yekem kesê li ser bajarê Laçin û Kalbajarê xebat kiriye van gotinên me yên li jor piştrast dike û diyar dike ku ev cejn ji cejneke ku di nava kurdan de jî tê pîroz kirin e.<sup>132</sup> Piştî lêkolînên li ser qadê û ji çavkaniyan jê sûd hatine wergirtin diyar dibe ku di nava gel de baweriyên bi vî rengî derbarê cejna Xidir Nebî de peyda bûne: “Eger dema Xidir Nebî were bibîne cejn nayê pîroz kirin dixeyîde û diçe. Çûyîna Xidir Nebî tê wateya çûyîna bereketê. Hatina biharê dereng dimîne” (j. d. r. 9 ). Kurdologa Ūris T . F. Arîstova dema li ser bajarê

<sup>129</sup> Məhərrəmovə, Solmaz “Xıdır İlyas” xalq bayramı haqqında, <http://www.musigi.dunya.az/new/added.asp?action=print&txt=312> . 02.07.2016

\* 21 berfenbar û 30 rêbendan - çileyê pêşîn, 31 rêbendan û 19 reşmî

<sup>130</sup> Azərbaycan MEA Tarix Institutunun elmi arxivi. F.I.C.I. Qovluq 128. 1935

<sup>131</sup> Аристова Г. Ф. 1966. r, 177

\*\* Kombe- Nanê kevira

<sup>132</sup> Azərbaycan MEA Tarix Institutunun elmi arxivi. R.I.c.I. d.s. 128. 1935

Laçın, Qubatlı, Kalbajar û Zengîlanê lêkolîna dike û ji bilf gotinên li jor van agahiyan dide:

“Di şeva vê cejna zivistanê tê pîrozkirin jin çalakiyeke bi vî rengî dikin. Her jinek bi hêkeke reng bi reng cuda diçin ber çem û daxwazên xwe dibêjin û wan hêgan datînin li nik çêm. Roja din jin tîn û her yek ji wan hêgên xwe dîsa tînin. Kijan hêg bi rengê sor bigre ew tê wê wateya ku kismetê xwediyê wê hêgê vedibe. Jina ku hêga wê rengê reş girtî jî weke bê siûd tê dîtin”.<sup>133</sup>

Ev yek ji hêla etnografên azerî wek cejneke “azerî” tê binavkirin. Ev yek jî tşkiliya “netewebûn û folklore” careke din dide xuyakirin. Ji ber ku gava mirov li wan dinêre, dibîne ku wan ev agahî rasterast ji Aristova ya ku vê cejnê wek “ya kurdan” binavdike, digirin.<sup>134</sup>

Taybetiyeke din ya vê cejnê ew e ku xwarinên taybet tîn çêkirin, û ev xwarin bi bereketê ve tîn girêdan.

“Li gor agahiyên Kûbra Şekerelîyêva ku ji bajarê Qubatliyê ye, di vê cejnê de divê teqez xwarinên ji birinç û arvan hatiye pijandin werin çêkirin. Di heman demê de arvan di nava teştêkî de dibirin holeke ku kes di tê de nerûdinişt. Roja din eger şûna destekî li ser vî arvanî de derkeve ew tê wê wateyê ku Xidir Nebî hatiye û bereket ji wê malê re aniye”<sup>135</sup>.

Quba Hesnova (**Foto: 4**) ya ji gunde bajarê Laçînê Qarakêşê ye van agahiyan dide:

“Di şeva cejna Xidir Nebî de ciwan tûrik di destê wan de li ber derên malên niştêcihên gund digeriyan û ji bo Xidir para cejnê kom dikirin. Eger wê şevê ba hatinek çêbe tê wê wateyê ku Xidir Nebî hatiye. Dengê wî bayê jî weke dengê hespê Xidir Nebî tê dîtin”<sup>136</sup>.

Divê li vir em vê yekê bibêjin ku ev bawerî di nava gelên din ên ku li Qafqasyayê dijîn de jî hene<sup>137</sup>.

<sup>133</sup> Аристова Г. Ф. 1966. r, 177

<sup>134</sup> Azərbaycan folkloru antologiyası. II kitab (toplayanı Ə.Axundov) Bakı. Azərbaycan EA nəşriyyatı. 1968.r 11

<sup>135</sup> Аристова Г. Ф. 1966. r, 178

<sup>136</sup> h.p. r, 177

<sup>137</sup>- Paşayev, Məhəbbət, Azərbaycanın qədim diyarı Xınalıq, Bakı, 2006;

-Hacıyev, Maqşud, Azərbaycan tatlarının dili-Tatların tarixi-Etnoqrafik oçerki, Mutercim, Bakı, 2009



### 3.1.4.2. Cejna Newrozê

Hin nivîskarên kurd dîroka newrozê digihînin serdema dewleta Babîl.<sup>138</sup> Li gorî Ethem Xemgîn<sup>139</sup> b.z 612an dikare weke destpêka newrozê were binav kirin. Naveroka cejna newrozê pir dewlemend e û ji gelek aliyen ve jî xwedî kûrahiyekê ye. Ji aliyekê ve li dijî zilma Dehaq berxwedana Kawayê Hesinkar simbolîze dîke ji aliyekê din ve jî tê wateya ew têkoşîna di navbera pakî û nepakiyê de heye.<sup>140</sup>

Cejna newrozê di formên cuda de di nava folklorê gelek neteweyan de heye. Derbarê wate û dîroka cejna newrozê de di gelek çavkaniyan din de jî gelek agahî hatine dayîn. Omer Xeyyam,<sup>141</sup> Mahmûd Qaşkarli,<sup>142</sup> Yusuf Has Hacib,<sup>143</sup> Nîzamûlmûlk,<sup>144</sup> Nîzamî Gencewî<sup>145</sup> û gelek kesên din di berhemên xwe de derbarê cejna newrozê de agahiyên cuda cuda didin. Di heman demê de gelek nivîskarên kurd di berhemên xwe de bi awayekî berfireh qala cejna newrozê kirine. Taybet jî helbestvanê mezin ê kurd Ehmedê Xanî<sup>146</sup> derbarê cejna newrozê de di Mem û Zîna xwe de agahiyên balkêş dide.

Dewra felekê ji bextê firûz

Dîsan ku numa ji nû ve Newrûz

Mebnî li wî adetê mubarek

Şehrî û sipahîyan bi carek

Bajêr û kelat û xanî berdan

Teşbîhê bi nijdîyan û cerdan

Sef sef dimeşîne kûh û deştan

Ref ref dixuşîne seyr û geştan...

<sup>138</sup> Bender, Cemşid., Kürt Uygarlığında Alevilik, İstanbul, 1991, r. 409.

<sup>139</sup> Xemgîn, Ethem, Kürdistan'da Dini İnançlar ve Etkileri İslamiyet Öncesi, İstanbul., 1992, r. 42.

<sup>140</sup> Xemgîn, Ethem, 1992

<sup>141</sup> Хайям, Омар. Трактаты. Москва, 1961

<sup>142</sup> Kaşgarlı, Mahmud. Divanü Lugat-it türk. Ankara, 1985

<sup>143</sup> Balasaqunlu, Yusif. "Qutadqu bilik-xoşbextliyə aparana elm". Bakı, Azrənəşir 1994

<sup>144</sup> Nizamülmülk. Siyasətnamə. Bakı, 1989

<sup>145</sup> Gəncəvi, Nizami. İsgəndərnəmə. Bakı, 1983

<sup>146</sup> Xanî, Ehmedê, Mem û Zîn, (Wer. û latîni, Kurdîya xwerû: Bozarslan, M.Emîn), Deng, Stenbol, 2005, r. 224

Di nava kurdên Azerbaycanê de cejn ew çend pîroz tê dîtin ku di serdema cejnê de pêvçûn, ji hev xeydîn û roja newrozê li derveyî malbatê mayîn tiştên nayên gebûlkirin. Di vê cejnê de her wiha serdana nexweşan û gorên miriyan tê kirin. Di nava kurdên Azerbaycanê de cejna Newrozê mehekê tê pîroz kirin. Ji Çarşema Avê destpê dîke heya roja newrozê (sibeya 21 Adarê) pîrozbahî didomin.

Cejna newrozê gelek baweriyên mîtolojîk jî di nava xwe de dihewîne. Em van baweriyên mîtolojîk di heman demê de, di her çar cejnên çarşamê yê beriya newrozê tê pîrozkirin de jî dibînin. Ev her çar cejnên çarşemê bi çar hêmanên (av, ba, agir û hewa) ku mirov pêk tîne re têkildar in. Di serdema Sowyetê de li ser hêcata ku bi olê re girêdayîye hatiye qedexekirin. Di sala 1967an de hikûmeta navendî ya Azerbayca Sowyetê navê “cejna newrozê” diguherîne. Navê cejna newrozê weke cejna biharê diguherînin. Sedema vê yekê jî ew bû ku li himber hemî pêkûtiyên heyî jî gelan dev ji pîrozkirina newrozê bernedida. Her çend hin mollayên şîi xwestibin vê cejnê bi ola îslamê ve girêbidin jî gelek zanyarên Ewropî jî di navê de zanyarên rojhilatî li dijî vê yekê derdikevin.<sup>147</sup>

Niha em êdî dikarin lê binêrin ku ka di nava kurdên Azerbaycanê ev cejn bi çi awayî tê pîrozkirin. Em dê li jêr bi awayekî kurt li ser adet, xwarin, bawerî û pîrozbahiyên qala cejna newrozê bikin.

### 3.1.4.2.1. Amadehiyên ji bo Cejna Newrozê

Em dikarin bêjin ku derbarê amadehiyên cejna newrozê de heya niha xebat di nava kurdên Azerbaycanê de nehatine kirin. Kêma xebatên heyî ji hêla etnografên azeriyan ve hatine kirin. Loma jî azeriyan ev pîrozbahî jî weke folklorê gelê xwe nîşan dane. Heya pîrozbahiyên cejna newrozê gelek amadekarî têne kirin. Xanî û baxçe têne paqijkirin. Cil û berg têne şûştin. Ji bo hatina biharê sembolar bike genim di nava camekî de tê çandin (**Semenî-Foto: 5**).

Li gor baweriyên di nava gel de heyî di nava vê mehê de her hefteyekî guhartinek çêdibe. Li gor baweriyê din jî divê di vê pêvajoyê de şîn neyê girtin. Beyî cejnê kesên ku li derveyî malbatên xwe dijîn divê vegerin malên xwe. Li gor

<sup>147</sup> Мец, А. Мусульманский ренессанс. Москва, "Наука", 1966

baweriyê eger kesek newrozê di nava malbata xwe de pîroz neke dê heft sala nikaribe newrozê di nava malbata xwe de pîroz bike.

Wek li jor jî hatibu behskirin, cejna newrozê bi cejnên çarşeman ên berî xwe re têkildar e. Loma ji bo famkirina newrozê divê di derheqê wan de jî hinek agahî werin dayîn. Dê li jêr bi avayekî kronolojîk ev .....beriya Newrozê tene pirozkin verin dayîn.

### 3.1.4.2.2. Cejna Çarşema Avê

Ji çarşema Avê mîzginiya cejna Newrozê ye. Wan cejnên beriya newrozê yek ji wan a pîroz cejna çarşema avê ye. Li gor baweriyê di vê rojê de av xwe paqîj dike. Ji avê care yekem bêhna biharê belav dide. Teqez divê di şeva duşemê li her malê de agir were dadan. Ev agir di nava gel de pîroz tê dîtin. Nabe ku av li ser vî agirî de were rijandin. Ti kes nikare li nik vî agirî dijûnan bike. Heta piştî agir ditefe jî xweliya wî agirî nayê belavkirin. Di nava camekê de hin ava paqij tê parastin. Li ber berbanga sibê mirov diçin ber çêm. Dest û rûyên xwe dişûn. Hin ava çêm diavêjin rûyê hev dû. Ji bo cejna çarşema pêş jî di nava xweşiyê de were derbaskirin daxwazan dikin (j.d.r.11). Piştî cejna Çarşemê Avê cejna Çarşemê Agir e.

### 3.1.4.2.3. Cejna Çarşema Agir

Ji serdemên kevnare heya roja me ya îro agir pîroz tê dîtin<sup>148</sup>. Ji ber ku agir di cewhera xwe de gelek tiştî dihevwîne di nava kurdên Azerbaycanê de jî gelek tişt li ser têgeha agir tê barkirin.<sup>149</sup> Li gor baweriyaya kurdên Azerbaycanê agir mirovan ji hemî cure nepakiyan û nebaşiyayan diparêze. Agir tê wê watayê ku dê pakî li ser rûye dinyayê serbikeve.<sup>150</sup> Ev bawerî di nava kurdên Azerbaycanê de hê jî weke nirxekê cih digre. Çarşema agir jî weke çarşema avê di derdora pêta agir tê pîrozkin.

<sup>148</sup> -Bittel, K. "Kappadokia'da Bulunan Bir Ateş Sunağı". *TAD VI* (1956) r 40.

-DE CHOLET, Le Comte; Voyage en Turquie d'Asie: Armenie, Kurdistan et Mesopotamie, Paris, E.Plon, Nourrit et Cie, 1892.

-Can, Derya, Hind Ateş Tanrısı AGM, [http://ktp.isam.org.tr/pdfdrgr/D02424/2002\\_II\\_7/2002\\_II\\_7\\_CANHD.pdf](http://ktp.isam.org.tr/pdfdrgr/D02424/2002_II_7/2002_II_7_CANHD.pdf). 05.02.2016

<sup>149</sup> Dr. Medyalı, A. Antik Kürdistan'da dinsel yapılanma zerdüş ve öğretisi, Stockholm 1991

<sup>150</sup> -Hacı, Asif, Mifopoetik tefekkür felsefesi, Mütercim, Bakı, 2002;

-İSMAYILOV, Hüseyin, Novruz:Etnik-mifoloji semantikasi və tarixi təkamülü, Azərbaycan Milli Elmlər Akademiyası Folklor institutu, <http://www.folklor.az/04.htm>. 21.05.2016

“Divê hemî endamên malbatê di der dora wî agirî bicivin. Bawerîyek din jî ew e ku divê her kes teqez sê carî xwe li ser wî pêda agirî re bavêjin” (j.d.r.4).

Bawer dikin ev agir dê pîstayiyê ji wan bikişîne. Di nava kurdên qafqasyayê de bawerîya agir di vê cejnê de behtir derdikeve pêşberî me. Taybet jî sûndxwarina li ser agir di nava kurdên Azerbaycanê de pir tê dîtin. Divê em ve yekê destnîşan bikin kurdên Azerbaycanê mislimanên şîî ne. Dîsa jî bawerîya agir ew çend pîroz e ku ew sûndxwarina li ser agir û sûndxwarina li ser pîrozîyên ola Îslamê wek hev dibînin. Niha jî sûndxwarina li ser agir û rojî di nava kurdên qafqasyayê de pir tê dîtin. Ev nimûneyên li jêr yê sûndxwarina li ser agir vê yekê dide xuya kirin.

“Sûnd li ser agir”

“Eger ez vir bikim bila agir min bikeve” (j.d.r.12).

Piştî vêya Çarşema Agir cejna Çarşema Bayê tê.

#### **3.1.4.2.4. Cejna Çarşema Bayê**

Çarşema bayê cejna sêyemin a beriya newrozê ye. Li gor baweriyê di vê cejnê de ba hişyar dibe û ew ba tevgerê dide agir û avê, ji bo xwezayê zindî bike ev ba cîhanê dihejîne. Di vê cejnê de jî weke cejnên din mirov beriya şevê li der dora agir kom dibin û xwe jî ser agir re diavêjin û bi vî awayî dixwazin xwe paqij bikin. Di vê cejnê de bawerîyeke din ku pir di nava kurdan de belavbûye heye. Li gor vê baweriyê jî “*mirov şêva cejnê diçin li ber dara bîyê û her yek ji wan daxwazekê digrin û bangê Xwedayê Bayê dikin*” (j.d.r.7). Eger ba were û çixlên darê bigihîje axê dê hingê daxwazên wan werin cih.

#### **3.1.4.2.5. Cejna Çarşema Axê**

Çarşema axê ji wan çarşemên beriya newrozê ya dawî ye. Di vê çarşemê de ax hişyar dibe. “Tiştên li bin û li ser axê ne careke din zindî dibin. Mirov hemî ji bo cejnê pîroz bikin amade dibin. Jin dest, ling û porê xwe hine dikin. Kincên xwe yê paqij xwe dikin” (j.d.r.2). Ev çarşeme ji çarşemên din berfirehtir û bi çostir tê pîroz kirin. Ayînên cur bi cur tene kirin. Çûyina li ser avê, pêxistina çirayê. Pîrozbahiyên bi agir re têkildarin bi şêv dest pê dikin. Dîsa di nava bexçe de agir tê dadan. Mîrov li

derdora agir dicivin. Xwe ser agir re diavêjin û êşa salê bi çošî li dûv xwe dihêlin. Gogên agir\* têne amadekirin. Ciwan diçin devera herî bilind a gund û van gogên agir ber bi asîmanan ve diavêjin. Sifreya vê cejnê cuda tê amadekirin. Divê teqez li ser sifrê hêkeke bi rengê sor hatiye boyaxkirin û Semenî\*\* (foto 5) şînbûyî hebe. Şîrînahiyên cuda cuda têne li ser sifrê. Li gor baweriyê divê herî kêr heft cure xwarin were li ser sifrê. “Di şeva vê cejnê de gotinên nepak nayên kirin. Divê guh gotinên baş bibihîse. Di vê çarşema dawî de ax, av, agir û ba yekgirtinekê çêdikin” ( j.d.r.1.). Mirov bi şînbûna giyanewêyan şad dibin. Tê dîtîn ku cejna çarşema axê ji cejnên her çar olên mezin cudatirin. Ev cejn ji mîtolojiya ku dîroka wê digihîje deh hezar salî jî ne serbixwe ye û di nava gel de hêjî di forma xwe ya kevin de tê pîrozkirin.<sup>151</sup> Cejna Çarşemê ne tenê cejneke şahiyê ye di heman demê de cejneke wisa ye ku bi riya alîkariyên tê kirin jî civakê bi hev re girêdide.

Ji bilî her çar cejnên beriya newrozê di nava kurdên Azerbaycanê de hin adetên din jî hene. Kurd pîranî di nava cejna çarşema axê de van adetan bi cih tînin. Yek ji van adetên jî “avêtina piştênê”\* Piştî agirê cejnê dîtefe ciwanên gund li hev kom dibin. Ev ciwan mal bi mal digerin. Berê van ciwanan di kulekên de piştênên xwe diavêtin nava malan. Piştî xaniyên nû hatin avakirin û kulek di wan xaniyan de neman ciwan deriyê malan vedikin û piştênan diavêjin hundirê malê. Divê dema ciwan piştênan bavêjin xwediyê malan qet wan nasnekin. Piştî dema derî derî digerin para cejnê kom dikin. Ew tiştên tîn komkirin dibin û datînin li ber derê kesê herî xizan ê gund. Lê vê yekê bi xef dikin da ku kes pê nebihîse. Armanca vê rîtuêlê ew e ku ti malbat ji xwarinê cejnên bêpar nemînin û li hemberî mêvanên xwe nekevin rewşa şermiyê de. Dema ev rîtuêl pêk tê ciwan hemî di devereke têne cem hev û heya sehera sibeyan ranazên. Li gor baweriyê bi saya vê yekê hemî êşên salê bi dûv xwe dihêlin. Ji bo şeva xwe çoš û şeng bikin ciwan hin şanoyan didin temaşekirin ( j.d.r.5.). Di çarşema axê de lîstokek bi navê kose tê lîstin. Derbarê vê lîstikê de dê li beşa şanoya gelêrî de agahî bînin dayîn. Dîsa di cejna newrozê de divê teqez lîstika hêkan were lîstin. Dê derbarê vê lîstokê de jî di beşa lîstokên gelêrî de agahî bînin dayîn.

\* Şemal an ji meşale

\*\* Simbîleke nû

<sup>151</sup>. Orucova, Səhər . İlxır çərşənbə –Torpaq çərşənbəsi. Xalq qezeti, 14.03.2017

\* Piştên: Kember an jî tûrikê ku ciwanan dema pere kom dikir ber deriya mala datanî. Carna jî ev piştên di kulekên xaniyan de diavêtin hündürên malê.

### 3.1.4.2.6. Roja Cejna Newrozê û Pîrozbahiyên Têne Kirin

Ev pîrozbahiyên heya vê derê me qala wan kirin tev beriya cejna newrozê pêk tên. Em dikarin bêjin ku di nava kurdên Azerbaycanê de pîrozbahiyên newrozê di beriya roja newrozê tenê kirin. Ev yek jî nîşan dide ku kurdên Azerbaycanê gelek girîngiyê didin cejna newrozê. Heta em dikarin bêjin ku cejneke di asta newrozê de tê pîrozkirin tuneye. Niha jî dê derbarê roja cejna newrozê de hin agahî werin dayîn û bi vê yekê jî dê were diyarkirin ka ev cejn di nava kurdên Azerbaycanê de bi çi awayî tê pêşwazîkirin.

Ji bo ku karên xwe yên malinî bi awayekî zû biqedînin û mêvanên bê jî bikarin di nava paqîjîyê de pêşwazî bikin. Di sibeya cejna newrozê de mirov pir zû radibin. Divê teqez keç cilên rengên sor li xwe bikin û sifreya cejnê amade bikin. Di sifreya cejnê de divê teqez çerezên cur bi cur, hêkên boyaxa sor lê kirî, şerbetên rengê sor û simbeleke nûşînûyî\* hebe. (Foto: 7) ji bilî van ji bo jin kevaniya xwe nîşan bidin ji bo xwarinê kilor û kadeyên cuda amade dikin. Eger xwarina birincê tunebe nabe ku di malekê de ev cejn were pîrozkirin. Her mal divê xwarina birincê amade bike û bakleyên biçûk û hevîrê hişkbûyî yên ku dezî bi dezî hatine birîn divê tevî vê birincê bike. Dema jin van amadekariyan dikin mêr jî di qadeke navendî ya gund de li hev re kom dibin û diçin serdana goristanan.

“Her kes li ser gorê xizmên xwe dûayan dikin û pişt re ev kes hemî bi hev re diçin serdana malbatên ku di nava salakê de xizmekî xwe winda kirine. Li wir cejna wî pîroz dikin û teqez ji xwarina wî ya cejnê jî tam dikin” (j.d.r.2.) .

Pişt re kom bi kom mala hemî gundiyan digerin û teqez her mala ku diçin divê tiştêkî tam bikin. Di cejnê de divê her kes werin cem hev û ti kes ji hev nexeyîdin. Heta yên dijminên hev bin jî di pêşengiya rûsipayan de li hev tên û aşitî di nava wan de tê çekirin. Cejn heya derengiya şevê dom dike. Piştî vê cejnê kurdên Azerbaycanê bawer dikin dê bikevin di serdemeke nû de. Em dibînin ku her çend kurdên Azerbaycanê mislimanên şî bin jî cejna newrozê li ser hemî cejnan re pîroz dikin. Hêjayî gotinê ye ku cejnên olî jî di vê astê de nayên pîrozkirin.

---

\* Semenî

### 3.1.5. Adetên Mêvanti, Cîrantî û Hevkariyê

Mêvantî û edetên mêvantiyê jî wek insurek ji folklorê her wisa di nav kurdên Azerbaycanê de jî tê dîtin. Ev adet di çavkaniyên kevin de jî derbas dibin. Erdnîgarnasê Yewnan Strabon di derheqê gelên qafqasyayê de van agahiyan dide:

“Ewan ne tenê li hemberî kal û pîrê xwe lê li hemberî kal û pîrên din jî hurmet nîşan didan”.<sup>152</sup>

Di nava folklorê kurdên Azerbaycanê de jî adetên çanda mêvantiyê têne dîtin. Wek kurdên li deverên din dijîn kurdên vê herêmê jî li gor taybetiya xwe ev adet li gor xwe afirandine. Li jêr hin adetên mêvantiyê ku di nava kurdên Azerbaycanê de tên dîtin dê were hene.

Nava kurdên Azerbaycanê de hurmeteke zêde ji bo mêvanan tê dayîn.

“Di her malê de odeya herî xweşik hatî raxistî ji bo mêvanan dihate hiştin. Kî çî çaxî bihatina ber deriyê malekî ew kes weke mêvan dihate dîtin. Mezinê malê mêvanê ku dihat mêvandariyê pêşwazî dikir. Eger di malê de mêr tunebûna jî kevaniya malê mêvan pêşwazî dikir. Ciwanên malê ji bo mêvan dest û rûyê xwe bişûştina av amade dikir. Mezinê malê jî gelek caran av li dest û rûyê mêvan dikir”(j.d.8). Di adetên mêvantiyê de tiştê herî balê dikişand sifra xwarinê ye. “Mêvan kî be bila bibe ji bo wî xwarinên herî xweş dihate amadekirin”(j.d.r.9).

Divê di serî de xwediyê malê dest bi xwarinê bikirina. Ti car pirsê dema çûyîne li mêvan nedihate kirin. Ev yek weke pîrseke herî şerm dihate pejirandin. Divê xwediyê malê ewlekariya mêvan bîstandina. Her wisa alavên mêvan jî divê bihatina parastin. Dema mêvan dihate bi rêkirin daxwaza wî dihate pîrskirin. Eger daxwaze mêvan hebûna divê xwediyê malê ev daxwaz bîandina cih. Xwediyê malê heya derekê bi mêvan re diçû. Li wir ew oxir dikir.

Giringiya mêvantiyê di nava edebiyata gelêrî de jî tê dîtin. Wek mînak gotinên pêşyan ên kurdên Azerbaycanê ji bo giringiya mêvantiyê nîşan bide li vir derdikeve holê. Hin ji wan pêşgotinan ev in:

Mala bê mêvan weke aşê bê ave.

---

<sup>152</sup> Латышев, В.В.. Известия древних писателей греческих и латинских о Скифии и Кавказе, т. L, СПб., 1890, с.143

Mêvan bihara malê ye.

Rizqê mêvan berî mêvan tê.

Kesên ji mêvana hez bike sifra wan vala namîne.

Hatin ji mêvan rêkirin ji mêvandar (j.d.1;9).

Li gor van agahiya tê dîtin ku mêvantî di nava adetan kurdên li vê herêmê dijê de ciheke girîng digirin. Xwediyê malan ji bo dilên mêvanên xwe xweş bikin çî ji destên wan tên dikin.

### 3.1.5.1. Adetên Cîrantî û Hevkariyê

Cîrantî û hevkarî di nava civakê de têkiliya mirov û civakê saz dikin. Her çend cudahî hebin jî di nava hemî gelan de wateyêke taybet ji bo cîrantî û hevkarîyê hatiye dayîn. Di nava gelên qafqasyayê de jî ev yek derbasdar e. Ji ber ku gelên qafqasyayê di nava hev de dijîn adetên wan jî nêzî hev bûne. Em vê yekê di adetên cîrantî û hevkarîya civakî de jî dibînin. Lê her çend rastî ev be jî di nava kurdên Azerbaycanê de em çav hin adetên cuda jî dikevin. Ji van adetan hin ji wan ji holê rabûne lê hin ji wan jî heya roja me hatine. Kesên li bajaran Laçin, Kalbajar, Qubadlî, Zengîlan li ser folklorê xebat kirine zêde li ser vê mijarê nesekînîne. Li vîr bi riya çavkaniyên ûrisî û azerî çavkaniyên ku ji man wergiritin di derheqê adetên cîrantî û hevkarîyê ev tişt dikarin werin gotin. Êtnogarî Êquazarov berhehema xwe de wisa dibêje;

“Dema qala cîrantiye bê kirin di serî divê qala hevkarîya cîranan were kirin. Ji wan hevkarîyan jî hevkarîyên sewalan û çandiniyê ciheke taybet digire”.<sup>153</sup>

Kesê yekem ê derbarê adetên cîrantî û hevkarîyê de li qafqasyayê agahiyan dide S. Yegîazarov e. Ewî di pirtûka xwe de qala hevkarîya çandî ya di nava gelên qafqasyayê de kiriye. Di heman demê de S. Şaverdov<sup>154</sup> û G. Çursîn<sup>155</sup> jî derbarê van

<sup>153</sup> Егуазаров, С.А.. Исследования по истории учреждений Закавказья. Часть 1-ая. Сельская община, Казань, 1889

<sup>154</sup> Шавердов, С.. Тамазлук или обычай взаимно вспомоществования домашним скотом. Сборник материалов по описанию местностей и племен Кавказа (СМОМПК), т. VII, Тифлис, 1889

<sup>155</sup> Чурсин, Г.Ф. Очерки по этнологии Кавказа. Тифлис, 1913



adetan de agahî ji nava gelên qafqasyayê dane. Li jêr dê qala çend heb ji van detên cîrantî û hevkarîyê were kirin.

### 3.1.5.2. Hevkariya Hevrezê

Hevrez dihat wateya hevkarîya mirovan. Di hevrezê de xwediyê kar bangî cîran û gundiye xwe dikir da ku werin hevkarîya wî. Lê ji bilî vê yekê jî gundî carna ji bo hin malbatên tu kesên wan tunebûn jî dihatin cem hev ji bo hevrezê. Tu kesî nikarî bi serê xwe biryara hevrezê bidana. Ji bo hevrezê divê di serî de rûsîpiyên gund destûr bidana. Gundî ne mecbûr bûn ku tevlî hevrezê bibin. Lê her kesî hevrez weke erkekê didît. Wek mînakekê dema biryara hevrezê bihata dayîn hingê mirovan ji bo hevkarîyê çî di destê wan de hebûn ji bo xwediyê kar didan. Hinan ji wan sewal hinan ji wan alavên çandinîyê didan. Hevrez ji berbanga sibê dest pê dikir û heya êvarî jî dom dikir. Kar qedîya ba jî, neqedîya ba jî hevrez ji bo roja din kom nedibû. Ji bo xebatekê tenê rojekê kom dibûn.

Derbarê dîroka hevrezê de di gelek çavkaniyan de agahiyên cuda hene. Ji wan agahîyan diyar dibe ku çanda hevrezê çandeke pir kevin e. Zanyarê ûrisî Î.Petruşînsky vê çandê têkildarî serdema feodaliyê dibîne û dibêje ku hevrez di heyama navîn de di nava Îran û Qafqasyayê de belavbûyî bû.<sup>156</sup> Ji hêla din ve zanyarê Azerî M. Efendîyev jî diyar dike ku hevrez di navbera sedsala 18an û 19an de weke kareke fermî dihate kirin.<sup>157</sup> Lê kesên ku li herêmê hevdîtin bi wan re hat kirin dibêjin ku hevrez ne tiştêkî fermî bû. “Herkes bi awayekî dildarî tevlî hevrezê dibûn”(j.d.r.11). Ev gotin di berhema Q. Karakaşli de jî wisa tê dayîn. Li gor agahiyên Karakaşli “ di sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de hevrez bi awayekî fermî ne dihate kirin”<sup>158</sup>.

Xuya dibe armanca hevrezê ew e ku kar û berên gundiyan bi awayekî kolektîf were kirin. Ev yek jî di nava civakê de hestên cîrantiyê xurtir dike.

<sup>156</sup> Петрушевский, И.П.. Очерки по истории феодальных отношений в Азербайджане в XVI - начале XIX века. Ленинград, 1949. сәh.278

<sup>157</sup> Эфендиев, М.М.. Повинности и правовое положение владельческих райятов в Азербайджане в первой половине XIX века. Вакі, 1957.

<sup>158</sup> Каракашлы, К.Т.. Материальная культура азербайджанцев северо-восточной и центральной зон Малого Кавказа (историко-этнографическое исследование). Баку, 1964. г, 261

### 3.1.5.3. Hevparî

Ji wan formên hevkarîyê yek ji wan çanda hevparîyê ye. Di çanda hevparîyê de çend kes (herî kê m du kes) ji bo karekî dicivîyan. “Kesê sewalê wî heyî sewal dianî kesê alavê wî yên çotkarîyê heyî ew dianîn û bi vi rengî kareke hevpar dihate kirin”(j.d.r.3) Ev adet niha jî di nava kurdên Azerbaycanê de gelek caran tên dîtin.

### 3.1.5.4. Hav (Hev)

Di nava kurdên kurdîstana qafqasyayê de yek ji adetên hevkarîyê ku herî berfireh tê dîtin jî adeta *hav (hev) e*. Hav piranî di avakirina xaniyan, dawetan, merasîmên şîne û xebatên çandîniyê de dihate dîtin. Li ser qada lêkolînê lê hatî kirin hate dîtin ku herî zêde jî di çandîna de ev adet dihate dîtin. Carna jî bo havê ji çilî zêdetir kes kom dibûn (j.d.r.3). Q. C. Cavadov dema qala folklorê herêma kurdên Azerbaycanê dike di derheqê havê de van agayîyan dide. “Gundî bi dildarî diçûn havê. Ev hevkarî di nava mirovan de dibû weke cejnê”.<sup>159</sup> Her çend ev lêkolîn li ser kurdên Azerbaycanê hatibe kirin jî Cavadov ev adet weke adeta azerîyan nîşan daye. Xuya dibe ku ne tenê di nav azerîyan de her wisa di nav kurdan de jî ev adet hebûye.

### 3.1.5.5. Adeta Hevkarîya Zîyanê

Di nava kurdên Azerbaycanê de adetek jî bo hevkarîya zîyanê gel jî hebû. Weke ku tê zanîn mirovên civakê pêk tînin jî bo debara xwe bikin karên cur bi cur dikin. Nabe ku mirov di hemî karên xwe de bi ser kevin. Carna tê mirov di xebatên xwe de dikeve zîyanê de. Hingê jî civak jî bo ku ew mirov careke din bikare debara xwe bike bi hevkarîyê jî bo zîyana wî jî holê rakin dixebitin. Li gorî niştecihên herêma ev mînak dikare bê dayîn.

Eger gundîyekê ku debara xwe tenê bi xwedîkirina dewaran dikir hebûna û sewalên wî nexweş biketibana û ew sewal bihatina serjêkirinê rûsipiyên gund dihatin û ew goşt jî bo hemî gundîyan belav dikirin. Ev agahî jî hêla K. T. Karakaşlı ku di sala 1960an de li ser herêma lêkolînê kiriye jî bi vî awayî tê bilêvkirin:

---

<sup>159</sup> Cavadov, Q. C.. Azərbycanda el kōmōyi adōtləri, Bakı, 1993.

“Ti gundiyan nikarîbû ew para goştê ji bo wan hatî li şûn de vegeîne. Ev yek weke tişteke pir şerm dihate qebûl kirin. Gundiye ku par ji sewal distandin an pere di nava xwe de kom dikir û zîyana xwediyê sewal dida an jî her yekî ji bo wî gundiye mihek distand”.<sup>160</sup>

Lê Karakaşli di xebata xwe de navê kurdan hilnedaye.

### 3.1.5.6. Umya

Umya jî adeteke ku di nava kurdên Azerbaycanê de dihate dîtin. Rûsipiyên gund di gundan de ji bo alîkariyê bikin bi şev diçin mêvaniya malbateke xizan. Piştî xwarinê an jî vexwarina çayekê rûsipiyên gund armanca hatina xwe vedibêjin. Di vê adeta bi navê umya tê zanîn de her rûsipiyek di wê mêvandariyê de soza dayîna sewalekê ji bo malbata xizan dide. Piştî rûsipî vedigerin mala xwe an di heman rojê de an jî roja din soza xwe tînin cih û sewalan ji bo malbata xizan dişînin. Di gelek çavkaniyan de jî qala vê adetê hatiye kirin. Di gotara S. Şaverdov<sup>161</sup> ya ku di sala 1889an de hatiye nivîsîn de qala adeta umyayê tê kirin. Li gor agahiyan wî dane adeta umya di nava gelên Qafqasyayê de pir zêde dihate dîtin. Zanyarê azerî K. T. Karakaşli jî qala adeta umya dike û dibêje: “Ev adet piranî li herêma Laçîn û derdora wê dihate dîtin”.<sup>162</sup> Ji bilî van agahiyan Karakaşli qala formeke din a vê adetê jî dike. Di vê formê de gundiye ku rewşa wî ji aliyê aborî ve nebaş e mal bi mal digere. Diçe ber deriyê kîjan malî alavekê cuda datîne ber deriyê wê malê. “Xediyên malê yê ku ew didît dizanîbû ku rewşa wî kesî nebaş e. Loma ji bo alîkariyê bikin tevdiqeriyên. Piranî jî sewal ji bo kesê rewşa wî nebaşbûyî dihate dayîn” (j.d.r.11).

Ev adetên ku li jorê qala wan hatine kirin di nava kurdên Azerbaycanê de weke adetên cîrantî û hevkarîyê derdikevin pêş. Ji van adetan jî diyar dibe ku çanda cîrantî û hevkarîyê di nava kurdên Azerbaycanê de pir belavbûyî ye. Divê ev yek jî were destnîşankirin ku di van adetan de armanc piştgiriya civakî ye. Kesên tevlî van xebatan dibin xwe weke endamê wê civatê dibînin. Alîkariya ji bo malbatên xizan jî dîsa tîkiliyên civakî xurt dike. Bi riya alîkariyê malbatên rewşa wan nebaş xwe aîde civakê dibînin û ev yek jî civakê bihêztir dike. Mînakên hatine dayîn û çavkaniyên sîd jê hatî wergirtin jî dide xuya ku dema ev hevkarî tê kirin civak bi hişmendî

<sup>160</sup> Cavadov Q.C., r 60-61. 1993.

<sup>161</sup> Шавердов, С. 1889

<sup>162</sup> Каракашлы, К.Т.,1964. р.258

tevdigere û nahêle alozîyek di nava van xebatan derkeve holê. Ji bilî adet û toreyan baweriyên gelerî ji beşeka serbixwe ya folklorê ve ku di nav kurdên Azerbeycanê de ji em rastî wan tîen.

### 3.2. BAWERİYÊN GELÊRÎ

Baweriyên gel xwedî dîrokeke kevnare ye. Ji peydabûna mirovahiyê vir ve mirovan bawerî bi gelek tiştan aniye. Mirovên ku dixwestin xwe ji şert û mercên xwezayê û nepakiyê biparêzin bawerî gelek hêmanên xwezayê dianîn. Derbarê vê yekê de her çend gelek zanyaran xebat kiribin jî li vir gotinên Marks û Engels zêdetir balê dikşîne li ser xwe. Marks û Engels wiha dibêjin:

“Hêzên xwezayê ji bo mirovan tirsnaq û veşartî bûn.(...) Ev yek jî bû sedema peydabûna baweriyên olî di nava mirovan de”.<sup>163</sup>

Her çend piştî her çar dînen mezin ev bawerî di nava civakê de hinek qels bûbin jî ev yek nayê wê wateyê ku ev bawerî ji holê rabûne. Di nava hemî gelan de digel baweriyên olî baweriyên gel jî hene. Di nava kurdan de jî ji bilî baweriyên olî baweriyên gel jî ciheke berfireh digre. Di navan baweriyên de zîyaret û pratîka derdora wan cihekî girîng digire

#### 3.2.1. Cihên Ziyaretê

Di vê qadê de A. Elekberov xebatên yekem kirine. A. Elekberov piştî xebatên xwe yên li bajarê Kalbajar û Laçînê baweriyên gel ên kurdan dixwe sê beş. Di beşa yekem de *qala pîrên* koçeran dike. Ev cihê baweriyên (pîr) ji kevirên komî yên li ser goran pêk dihat. Jinan paçik li çixlê darên li derdora van gorên pîran ve girêdidan. Kurdan bawerî pê dianî ku ev yek dê wan ji nepakiyê biparêze.<sup>164</sup> Koçeran bawerî bi hin kaniyên çiya û ziyaretgeha jî dianîn. Derbarê yek ji van ziyaretgehan de A. Elekberov mînakekê ji çiyayê bajarê Laçînê Hoçazê dide. Elekberov diyar dike ku li vî çiyayî bi navê *kaniya Elî* ziyaretgehek hebû. “Koçerên kurd di her koçên xwe de li

<sup>163</sup> Маркс, К; Энгельс, Ф.. Сочинения. Вып. 1, ч.3, г.148.Москва, 1955

<sup>164</sup> Alekberov. A, K voprosu, ob izuçenii kulturi Kurdiv, - “Trudi Azerbaydjan skoqo filala AN SSSR”, vîp. 25, Baku.

vir radiwestiyan û qurban ji bo zîyaretgehê serjêdikirin”.<sup>165</sup> Di heman demê ev koçer dema diçûn serdana xirabeyên ziyaretgehan jî çira pêdixistin.

Elekberov kurdên niştecihbûyî yê herêmê dixê beşa duyem. Elekberov diyar dike ku van kurdan gorên bavikên xwe diheband û bawerî bi gorên pîrozên xwe dianîn. “Mirovan xwarin û şirînayî ji bo van gorên ku weke pîr dihatin hesabandin dikirin nezîr”.<sup>166</sup>

Elekberov *pîrên* ku koçeran û niştecihên herêmê bi hev re bawerî pê dianîn dixê di beşa sêyem. Elekberov ji bo van cihê pîroz jî navên hin dar, kevir û kaniyan dihêjmire.<sup>167</sup> F. Arîstovaya ku di salên 1951an û 1963an de li vê herêmê lêkolîn kiriye vê dabeşkirina Elekberov red dike. Li gor Arîstovayê hem kurdên koçer hem jî kurdên niştecihbûyî diçûn serlêdana van deverên pîroz û bawerî bi wan deverên pîroz dianîn.<sup>168</sup> Arîstova ji bilî vê yekê derbarê baweriyên gel de hinek agahiyan dide. Li gor nêrînen Arîstova di destpêka desthilatdariya Sowyetê de di nava kurdên Azerbaycanê de baweriya hebandina daran hebû. Ev bawerî di nava kurdên di navçeya Kalbajar Axcakendê û gundê Zeylîk û navçeya Zengîlan li gundê Zîlanli û navçeya Laçîn gûndên Qalaca û Bozlu di hate dîtin. Arîstova di bêje ku:

“Paçik li darên pîroz ve dihatin girêdan û ji bo van daran xwarinên taybet di hate birin. Ev dar weke sembolên bereket û sûdwergirtinê dihatin dîtin”.<sup>169</sup>

Arîstova qala cihên kevirên pîroz ên li Laçîn û Qubatliyê hene jî dike. Li gor gotinên wê mislimanên ku diçûn serdana van ziyaretgehan bawer dikirin ku eger zarokeke di dema xwe de rêvencûyî di nava wan keviran re derbas bibûya dê zûtir bi rêve bûçûna. Piştî kurdîstana qafqasyayê dikeve di bin tesîra Komara Sowyetê de hin ji van baweriyên gel bi demê re ji holê radibin. Di Sowyetê de ateîzm pêşketibû loma li dijî olan aciziyek hebû. Ji ber ku sowyetê zordestiya xwe li ser gelan ferz dikir û kurdên vê herêmê jî zedetir bi gelên din re ketin têkiliyê ev bawerî di nava wan de qels bûn. Di heman demê de îdeolojiya Komara Sowyetê li şûna olan ateîzm dipesand û li dijberî baweriyên vî şeklî jî bû. Lê her çend ev pêkûtî hatibin kirin û ji

---

<sup>165</sup> Alekberov, A, r 25

<sup>166</sup> Alekberov, A, r 27

<sup>167</sup> К вопросу, об изуçении культуры Курдов, - “Труды Азербайджанского института истории, языка и литературы АН АССР”, вып. 25

<sup>168</sup> Alekberova, A. К вопросу, об изуçении культуры Курдов, r, 59

<sup>169</sup> Аристова Г. Ф. 1966. r 189

wan baweriyên gelek jî ji holê hatibin rakirin jî niha hin jî wan ji baweriyên hatine parastin û di nava Azerbaycanê de têne dîtin.

Di nava penaberên kurdên Azerbaycanê de têne kirin nîşan dide ku cihên wan deverên pîroz hê jî di hişê wan de hene. Ji bilî baweriyên derbarê ziyaretan de baweriyên gelêrî yên din jî hene.

Hinek ji van baweriyên gelêrî yên din jî ev in;

### 3.2.2. Baweriyên Derbarê Sirûştê de

#### 3.2.2.1. Baran

Di heyamên kevin de salên ku baran nedihat an jî kêr dihat ji bo mirovan dibû sedema xelayê. Mirov ji bo jiyanê giredayî xwezayê bû. Ji bo vê yekê jî derbarê baranê de gelek bawerî di nava wan de peyda bûne.<sup>170</sup> Ev bawerî di nava mirovên li mezopotamya û qafqasyayê de dijiyan pir dihat dîtin<sup>171</sup>. Heta di çavkaniyan de xuya dibe ku li mezopotamya û qafqasyayê bi navê “abrîzegan” cejneke girêdayî avê jî hebû.<sup>172</sup> Li gor salnameya Avestayê jî ev cejn di 30ê tîrê (17-18 Tîrmehê) de dihat pîrozkirin.<sup>173</sup> Di vê cejnê de ji bo hatina baranê simbolîze bike mirovan av ber asîman ve diavêtin û pê avê bi hev dû şil dikirin. Di berhemêke nivîsarê wê nediyar de ku di sedsala 10an de hatiye nivîsîn ji bo vê cejnê ev yek tê gotin: “Mirov ji bo cejna abrîzegan pîroz bikin li dor kaniyan kom dibûn. Stran digotin û direqîsîn pişt re jî daxwazên xwe digirtin”.<sup>174</sup> Ev yek jî diyar dika ku ji heyamên kevin ve baweriyên derbarê avê di nava mirovan de hene. Îro jî her çend ji hin aliyan guherîn çebûbe jî cejnên derbarê avê de di nava gelan de hene. Di nava kurdên Azerbaycanê de jî hin cejnên ji bo avê têne pîrozkirin hene. Ev cejnên derbarê avê de li nav kurdên Azerbaycanê heya salên 90î jî dihatin pîrozkirin. Lê ji ber sedemên ku li jor hatine diyar kirin niha ev pîrozkirina van cejnan nayê dîtin. Derbarê van cejnan de hem ji çavkaniyan nivîskî hem jî kal û pîran ev agahiyên li jêr peyda dibin:

<sup>170</sup> Azerbaycan Milli Ensiklopediyası. 25 cildde. “Azərbaycan” cildi. “Xalq bayramları” məqaləsi, r.141. Bakı, 2007

<sup>171</sup> h.p

<sup>172</sup> h.p

<sup>173</sup> Fərhadova, Nuridə, Azərbaycan xalq mədəniyyəti animasiya xidmətinin əsası kimi, Bakı Avirasiya Unversteti, sivilizasiya-Elmi-nəzəri jurnal, r.221. 02.2016

<sup>174</sup> Hudud al- Alam, *Editör Vladimir Minorskiy*, Luzac, 1937

Derbarê baran û avê de Xidir Nebî balkêş e. Weke ku berê jî hatibû diyarkirin cejna Xidir Nebî mizgîniya hatina biharê bû. Lê di baweriya avê de Xidir Nebî weke Xwedayê avê tê pejirandin.<sup>175</sup> Salên ku baran nedihat mirov ji bo baranê bînin bi hev re kom dibûn. Mirovan hespek bi xwe re dibirin ba çem û bi ava çem ew hesp dişûstin. Di heman de mê de jî ev stran digotin:

Bavê Xidir av bide

An jî nadim hespê te (j.d.r.2.).

Ji vê yekê jî diyar dibe ku kurd ji Xidir Nebî avê dixwazin. Baranxwestina ji Xidir Nebî tê wateya pîroz dîtina Xidir Nebî. Etnografê azerî ku di nava bajarên kurdan Kalbajar û Laçînê lêkolîn kiriye derbarê baweriyên baran anîna di nava kurdan de van agahiyan dide: “Du jinebî axa zûwabûyî ya çemekî cot dikin û bi avê hev dû şîl dikin”.<sup>176</sup> Lê etnografê ermenî M. Abegiyani di berhema<sup>177</sup> xwe de diyar dike ku ev bawerî di nava ermeniyan de tê dîtin. Etnografê ermenî A. Gaziyani ku li nav kurdên Azerbaycanê lêkolîn kiriye di gotara<sup>178</sup> xwe de ev baweriya ku li jor qala wê hatiye kirin weke baweriyeke ermeniyan hesabandiyê. Arîstova jî van gotinên nivîskarên ermeniyan çewt derdixîne û gotinên Elekberov dubare dike û diyar dike ku ev bawerî di nava kurdên Azerbaycanê de tê dîtin.<sup>179</sup> Ji vê yekê jî xuya dibe ku ev bawerî di nav gelê qafqasyayên de baweriyeke berbelav e.

Kurdolog Şamîl Askerov derbarê gelek baweriyên bi vî rengî yê li nava kurdên Azerbaycanê tê dîtin de di berhema xwe de gelek agahiyan dide. Askerov di menzûme xwe ya bi navê Delîdaxin Sedasi/Dengê Delîdaxêde<sup>180</sup> de li ser baweriyên baranê yê di nava kurdan de agahiyan dide. Di nava lêkolînên dawî yê li ser penaberên kurdên Azerbaycanê hatine kirin de jî di darbarê van baweriyên de gelek agahî tene dîtin.

<sup>175</sup> Abdullayev, Behlul & Babayev, Tofiq, Novruz bayramı enisklopediyası, Şərq-Qərb, Bakı 2008

<sup>176</sup> Alekberov, A., K voprosu, ob izuçenii kulturi Kurdov, r 59

<sup>177</sup> Abeqyan M., hemu berheman, c VII, Rəvan, 1975. 76-78; 5. 321-322

<sup>178</sup> Газиян А.С. Устное народно-поэтическое творчество Арцаха.([http://lraber.asj oa.am/ 3579/ 1/1990-7\(27\).pdf](http://lraber.asj oa.am/ 3579/ 1/1990-7(27).pdf)) sə 28-29

<sup>179</sup> Alekberov, A., K voprosu, ob izuçenii kulturi Kurdov, r 60

<sup>180</sup> Əsgərov, Şamil, Dəlidağın sədasi . Gənclik, Bakı, 1973

### 3.2.2.2. Baweriyên Derbarê Girtina Roj û Heyvê de

Di nava kurdên Azerbaycanê de baweriyêke din ku derbarê şiruştê de bû baweriyê derbarê girtina roj û heyvê bû. Di nava kurdên Azerbaycanê de girtina roj û heyvê bi tirs dihate pêşwazikirin. Di wan rojan de ji bo vê tirsê xwe rizgar bi bin mirov diçûn devereke bilind a gund û li firaxên sifir didan û deng derdixistin. Girtina roj an jî heyvê di demeke kin de pêk dihat. Dema roj an jî heyv xuya dikin mirovan bawer dikirin ku sedema vê yekê dengderxistina wan e. Loma bi kirinên xwe şad dibûn. Askerov jî di menzûmeya xwe de vê yekê bi heman şeweyî dubare dike. Di wan rîsteyên xwe de Askerov wisa dinivîse:

*“...Ay tutulsa yetişərdik “dadına”*

*Tez – təlāsik mis qazanda dōyərdik,*

*Ay çıxanda özümüzü öyərdik.”*

Wer:

*“...Eger heyv bihatina girtin em digihiştin alîkariyê*

*Me lêz bi lêz firaxên sifir dixist*

*Dema heyv dihate xuya me pesnê xwe dida.”*<sup>181</sup>

### 3.2.3. Baweriyên Zayendî

Di nava civakê de zayendê zarokan dibû cihê meraqê. Loma mirovan her tim xwestiyê zayendê zarokan bi awayekî hîn bibe. Di nava kurdên Azerbaycanê de ji bo hînbûna zayenda zarokan ev tişt dihatin kirin;

Eger jin kilo bistîne zayenda zaroka wê dê keç be;

Jina ducanî heger roj bi roj reş bibe dê zaroke wê kur be;

Eger zikê jina ducanî jor bikeve zarok dê kur, eger ku jêr bikeve zaroka wê dê keç be (j.d.r. 1) .

Eger piştê jina ducanî biêşe dê kurê wê werê dinyayê.

Eger tenê aliyek biêşe keç wê werê dinyayê. (j.d.r.5)

<sup>181</sup> Əsgərov, Şamil, 1973



Eger jin îsqanekê tije av bike û pişt re jin şîrê xwe bidoşe li ser avê, eger şîr belav bibe zarokê dê keç be lê eger şîr hêla jêre ve xwe berde zarokê wê dê kur bibe. (j.d.r. 10)

Dema anîna zarokan ji bo jinan herî zehmet e. Loma ji bo ku jin kêmtir êşê bikişîne hin bawerî di nava civakê de hebûn. Hin ji wan baweriyên jê ev in:

Dema zarokanî de, jinek li diwarên jora wê xekekê çêdke. Tê bawer kirin bi vê yekê Xizir dê jina zarok tîne biparêze û bibe sedem ku ew kêmtir êşê bikişîne.

Dema zarok tê dinyayê bi ava şor tê şuştin. Piştî zarok di nava çil rojê de serê zarok careke din nayê şuştin. Dema çil rojên zarok diqede bi ayînekî zarok tê şuştin. Di vê ser şuştinê de ji bo Xizir dûa tene kirin û ev gotin tene gotin;

Nexweşiyên te biçin jinên ne bedew re,

Emre te dirêj-dirêj bibe,

Weke çiya û keviran

Bextê te bi zêr bê nivîsin

Ruyê te hertim bikene

Xizir ji bo te av bide. (j.d.r. 7).

Li gor agahiyan tê dîtin ku mirovan gelek baweriyên derbarê jidayîkbûnê parastine. Jinan ev bawerî pejirandine û heya roja îro anîne.

### **3.2.3.1. Qedexeyên li Ser Jinên Ducanî**

Di nava gel de beyî ku zarok were dinyayê ji bo jinên ducanî hin qedexe hebûn. Hin ji van qedexeyan ev in.

Li ser cilên jinên ducanî divê hertim derzî hebin.

Jina ducanî 6 mehan ajalên nebedew nanihêrin.

Jina ducanî nifir nake (j.d.r. 5).

Dema ku tav an jî heyv girtî dibe, jina dûcana canê xwe naxûrîne. Eger ku canê xwe bixûrîne li ser ruyê zarokê lek çedibe. (j.d.r. 8).

Jina dûcanî fêkiyên tirş naxwin. Eger ku fekiyên tirş bixwe zarokê wê haş nabe. (j.d.r. 10)

Eger mumkun be malbatan jina dûcanî ciranan xwe û ji biyaniyên nabêje ku filankes ducanîye. (j.d.r. 1)

Jî bilî van bawerîyan hinek baweriyên di jiyana rojane de tên dîtîn jî hene. Li jêr çend mînak ji van cure bawerîyan dê were dayîn.

### 3.2.4. Baweriyên Gelêrî Yên Din

Hînek baweriyên din jî hene ku weke “baweriyên pûç” jê tên binavkirin. Baweriyên derbarê cismên asîmanî, xweza, sewal û nebat ji wan cure bawerîyan in. Ev bawerî hemî şopa baweriyên kevin di hundirê xwe de dihewînin. Di nava folklorê kurdên Azerbaycanê de jî ev cure bawerî cihê xwe digirin. Li jêr beyî ku were şîrovekirin dê hin mînakên van bawerîyan bêne dayîn. Ev bi zimanê azerî lê li Laçîn û Kalbajar ku wek bajarê kurdan tên dîtîn hatine berhevkirin. Dibe ku ev bawerî di nav gelên din de jî werin dîtîn, lê ji ber ku ji nav kurdên hermê hatine berhevkirin, wek baweriyên kurdên herêmê jî dikarin werin nirxandin.

Di sersalê de divê alîkariya mirovan bê kirin. Dê xwedê zêdetira wan bide te.

Şev bi tenê naçin rezan. Ji ber ku kesên lanetî li wir hene. (j.d. 3)

Ber bi êvarê nayê razan. Ji ber ku xwedê hingê rizq belav dike.

Ber bi êvarê li ber deriya rûnanin. Ji ber ku dema gera cinan in.

Nifirên dayîkê nagihije encame. Ji ber ku şîrê dayî nahêle. (j.d. 6)

Nifirên bavan pêk tên.

Di hundirê malan de alaveke şikestî nahêlin. Ew di malan de bang dikin û rihên nepak tên.

Roja çarşemê serî nayê şuştin.

Dûv yekî re avetina avê ronahiye.

Dema xwê li ser sifrê dirije nebaşî pêk tê. Divê şekir li ser pê werkirin.

Ber êvarê ava germ nayê rijandin. Ji ber ku zarokên cinan dê bişewetin. (j.d. 1)

Ber êvarê mal paqijkirin nabe.

Ber êvarê naçin li binê darên fêkiyan. Ji ber ku belayê were serê wan.

Ber bi êvarê nabe ku were girîn. (j.d.r. 2)

Dema bûrûsk lê dikeve û baran tê binê dara berûyan neyê sekinîn.

Roja çarşemê xalîçeyan çênakin. Ji ber ku kar nameşe.

Roja çarşemê meşk nayê danîn.

Ber êvarê deriyê malan nayê girtin.

Li roja çarşemê ketina avê qedexeye. Ji ber ku di nava avê de perî hene.

Neynûk nîşanî zarokan nadin. Ji ber ku zarok mezin nabe. (j.d. 3)

Jina dûcanî dijûnan nake.

Jina bihelm dema roj an jî heyv tê girtin bedena xwe naxwerîne. Ji ber ku zarok ne rind dibe. (j.d.r.8)

### **3.3. ZANYARIYÊN GELERÎ**

Zanyariyên gelêrî zanînên ku di nav gel de bi awayekî devkî belav bûne û di jiyana rojane ya gel de cihekî girîng digirin in. Di qada lêkolînê de agahiyên di vî warî de hatine berhevkerin, agahiyên derbarê nojdariya gelêrî û falên newrozê de ne.

#### **3.3.1. Nojdariya Gelêrî**

Di serdemên kevnare de mirovan hewl didan ku ji bo nexweşiyên cur bi cur ên di nava civakê de derketine derman bikin. Mirovên ku giredayî xwezayê bûn ji bo vê yekê dîsa berê xwe didan xwezayê. Loma jî gelek nebat weke derman kom kirine û ji ava madenî jî sûdwegirtine. Di heman demê de mirovan ji bo şikestina dest, ling an jî devereke din a bedenê baş bikin teknoloji jî afirandine. Ev lêgerîna gel a ji bo dermankirinê ku weke nojdariya gel tê binavkirin dikare were gorin ku bûye bingeha

nojdariya nûjen jî.<sup>182</sup> Piştî pêş dikeve jî ev zanîna gel di nava civakê de winda nabe û niha jî di nava gelan de mînakên vê nojdariyê tê dîtin.

Di nava kurdên Azerbaycanê de jî ji bo dermankirina nexweşiyên gelek tişt hatine kirin ku wek mînakên nojdariya gel dikarin werin nirxandin. Di nava kurdên Azerbaycanê de nojdarî herî zêde li ser şikestina desta û lingan dihate dîtin. Loma jî di her gundî de herî kêrkesekî/e karê cebariyê dikir dihate dîtin. Di çavkaniyan de xuya dibe ku kare cebariyê ji bav an jî dê derbasî kur an jî keçan dibû û wisa jî domdikir.

Karê cebariyê bi kontrola hestiyên dest pê dikir. Cebar pişt re eger hestî neşkestibûna ew dixist cihê wê. Eger hestî şikestibûna jî ev kar dihate kirin. Devera şikestî dihate rast kirin. Pişt re jî hêkan dermanek taybet dihat amadekirin û ew derman li ser devera şikestî dixistin. Pişt re bi alîkariya depên rast devera hatibû şikestin dihat vegirtin. “Li gor devera ku hatibû şikestin dema başbûnê jî diguherî”. (j.d.r.4)

Di nava kurdên Azerbaycanê herî zêde ji nexweşiya pisikê ditirsyan. Dema bi vê nexweşiyê diketin ev tişt dikirin. “Donê hirçekî dianîn û pişt kesê/a nexweş dixistin. Goştê jîjû didanê û şîrê kerê jî divexwarin”. (j.d.r.2.)

Ji bo nexweşiyên çavan jî hin rêbazên cur bi cur dihate sepandin. Dema nexweşiyek di çavê mirovan de peyda dibû zêdetir ji şîrê jinikekî û ji spîçka hêkê sûd werdigirtin. “Li gor baweriyê eger jina ku şîrê jê dihate xwestin cara yekem zarokeke keç anîbe dê nexweşî zûtir baş bibûna”. (j.d.r.11.)

Di nava kurdên kurdistanê qafqasyayê de baweriyek derbarê peydabûna nexweşiyekê de jî hebû. Li gor vê baweriyê eger mirov sterkên asîmanî bihejmire an jî beqên di nava golekî bikuje dê di destê wan de balûk (pepekok) derketina\* Ji bo dermankirina vê nexweşiyê ji mitolojiyê sûd werdigirtin. Dema heyv careke din nû dibû wan bi alîkariya kinoşikekê/gezik ev balûk paqij dikirin û heyvê dinêhêrîn û daxwaz lê dikirin. Bi vê yekê jî bawer dikirin ku ew balûkên dê ji dest an jî lingên wan biçin (j.d.r.5.).

<sup>182</sup> Axundov İ. A, Tibbin tarix və fəlsəfə ilə əlaqəsi, Monoqrafiya, Mütərcim, Bakı 2014.

\*Li hinek herêmên kurdên tirkîyeyê de jî tê dîtin (N.Keskin).

Yek nexweşiya ku di nav zarokan de dihate dîtin sorik bû. Di nava zaroken de dîtina vê nexweşiyê gelek cara dibû sedema mirinê jî loma kurdên Azerbaycanê ji ji bo vê nexweşiyê derman bikin û pêşiya mirina zaroka bigirin gelek awayê dermankirinê afirandine. Mirovan ji bo dermankirê ji şîrê hesp û keran sûdwerdigirtin. Şîrê ji hesp û keran dihate dotin didan zarokên bi sorikê ketî. Ji ber ku goşt sor e û navê nexweşiyê jî sorik e ji bo zarokên sorika ketî xwarina goşt qedexe bû. Cilên sor li zarokê sorika ketibû dikirin û paçike sor serê/wê/re dihate girêdan. “Mirovan bawer dikirin ku bi vê yekê sorikê ji rengê sor bitirse û ji bedena zarokan dûr bikeve” (j.d.r.6.).

Yek bawerî an jî pratîka din a saxkirina nexweşiyên, rijandina xwînê bû. “Bi vê yekê bawer dikirin ku nexweşî dê ji wan bi dûr bikeve”(j.d.r.12.).

Her çend bijîşkî pêş ketibe jî ji bo nexweşiya bayê kurdên Azerbaycanê hê jî piranî rêbazên kevin bi kar tînin. Ji bo nexweşiyên bayê ji holê rabe an jî nexweş bikare jiyana xwe bidomîne gelek rêbazên cuda têne bi kar anîn. Ji bo mirovê nexweşiya bayê ketî gelek caran postê sewalan dihate bikaranîn. Ji sewalên ku dihatin kevilkirin çerm dihate jêkirin û ew çerm li ser cermê mirov dihate xistin. Bi vê yekê dixwestin mirov di nava cermê sewalan de xwêdan bide. “Di heman demê ji bo vê nexweşiya bayê derman bikin şîlan germ dikirin vedixwarin û pelê kortumekî di devera ku ba lê heyî dipêçandin. Carna jî goştê jîjû û gurbeş (xurbeş) ji bo vê nexweşiyê dihate xwarin. Donê maran û hirçan jî eger bihatina dîtin li devera ba di tê de heyî dixistin” (j.d.r.10).

Di nava kurdên Azerbaycanê de ji bo xwîna ji birînê dihat bisekînînin jî rêbazên cuda bi kar dianîn. Carna ji bo xwînê bisekînînin pembû dihate şewitandin û xweliya pembû li ser birînê dixistin. “An jî gihayê gezgezok (gezgezk) û pûng diperçikandin û li ser birînê dixistin û girêdidan. Gelek caran jî hîngiv li ser birînê dixistin û bi vê yekê dixwestin xwîna diherikî bisekînînin” (j.d.r. 8).

Di nav kurdên Azerbaycanê de taybet jî li herêma Laçîn û Kalbajarê de germav û avên madena pir tên dîtin. Loma gelên vê herêmê ji bo tendûristiyê gelek ji van avan sûd werdigirin. Wek mînak mirov gelek caran ji bo nexweşiyên xwe diçûn li ser germava li Kalbajarê. Bi vê yekê dixwestin ji nexweşiyên weke ba û siniran xwe rizgar bikin. Ji bo nexweşiya gurîbûnê jî gel ji ava gurîbûnê ya li Kalbajar û Laçînê

derdiket sûd werdigirt. Kurdistana Qafqasyayê ji aliyê erdnîgariyê ve devereke pir bilind e. Loma jî kurdan ji gelek nebatên li kurdistana qafqasyayê digiha sûd werdigirtin.

Li gor agahiyên Askerov dide 4 hezarî zêdetir nebat li Kurdistana Qafqasyayê digiha.<sup>183</sup> Ji van agahiyan jî xuya dibe ku Kurdistana Qafqasyayê ji hêla nbatan ve gelek dewlemend bûye.

### 3.3.2. Falên Newrozê

Di şeva dawî ya cejna çarşema axê de keçên ciwan li devereke bi hev dicivin. Ew jî weke ciwanên din heya berbangaya sibê ranazên. Keç ji bo dahatûya xwe bibînin falên cur bi cur vedikin. Wek mînak di vekirina falakê de wisa dikin: Avê dixin di nava teştê de. Keç porê xwe li gustîlkên xwe re dikin û gustîlken xwe ber didin li ser ava di teştê de. Dema gustîlk dizivire li kevê teştê dikeve. Bawerî ew e ku çend cara gustîlk li kevê teştê bikeve dê keç di wî temenî de bizewice (j.d.r.6.). Di vekirina faleke din de wiha dikin: Kîlîtekê asê dikin û datînin di bin çiraya pêkatî. Ji keçikan yek daxwazekî di dilê xwe de digre û dibînin bendê ku kesek bikeve hundirê odê. Kesê tê hundir di gotina xwe ya pêş de çî bêje li gor wê yekê fala vekirî dinirxînin (j.d.r.2.). Ji bilî falên wisa vekirina hin falên din ên cuda jî henê. Wek mînak keç û xort kulorên şorkirî dixwin û radizên. Li gor baweriyê şev di xewnê de kî ji wan re avê bîne dê ji wî/wê kesî re bizewicin. Di faleke din de şeva çarşema axê de kesek daxwazekî hevî dike û diçe ber derê malekî û dixwazê axaftinê di hundir de tê kirin bibihîse. Li gor tiştên dibihîsin derbarê dahatûya xwe de dixwazin agahdar bibin.

---

<sup>183</sup> Esger, S. Şamîl. Kurdên Azerbaycanê, dîroka Laçîn û yên mayin ( *Ev gotar di 21'ê îlona 1996'an de di konferansa Kurd û Bajar (The Kurds and the City) de, li bajarê Sêvresê li Fransayê hatiye pêşkêşkirin.* )

### 3.4. EDEBIYATA GELÊRÎ

Edebiyat gelêrî jî di nava folklore de ciheke sereke digire. Her çend ji ber sedemên ku li jor qala wan hatine kirin îro di nav kurdên vê herêmê de edebiyata gelêrî ya bi kurdî ji hole rabûbe jî dîsa bi riya hin çavkaniyên nivîskî û kesên ku me bi wan re hevpeyvîn kiriye em dikarin hin nimûneyên çîrokên gelêrî, gotinên pêşiya, dûrik û xapînokan li jêr bidin.

#### 3.4.1. Çîrokên Gelêrî

Ev kurte çîrokên ku me li vir dane di sala 1960an de ji hêla zanyarê kurd Çerkez Beko ve li bajarên Laçîn û Kalbajarê hatine tomarkirin. Ev kurte çîrok di sala 1965an de di nava pirtûka bi navê “Zimanê Kurdên Azerbaycanê”<sup>184</sup> ku li Moskowê hatine çapkirin de cih digrin. Ji ber ku ji hêla ziman ve xwedî girîngiyekî ne me li vir ev kurte çîrok û pêkenok tenê latînzê kirin û bi vî awayî me tevî xebatê kirin. Di xebata Bekoyev de ev vegotin tev wek “çîrok” hatine binavkirin, lê li vir li gorî naveroka wan me wek “çîrokên gelêrî” û “pêkonek” ji hev veqetandin.

##### 3.4.1.1.1. Nokere Tacîr

Tacîrek hebûye, pîrr cewahîre xwe hebûye. Ewî dexwazi ademekî bigiri ku cewahîran bidîye kunkirin. Ewî nokerekî degiri, pe debê: ‘Eze rroye sed dînar dirav bidime te, tu van cewahîrîde min kunte’ Nokerî rrazî debi. Ewî teye mala tacîr. Ewî debîni, ku le dîfare mala tacîr sazê heye. Ew le saz meze dekî. Tacîrî debe: ‘Tu çi pîrr mezeyî sêz dekî, tu dekayî ku çalmîşkî?’ Nokerî debê: ‘Ezî dekam çalmîşkîm, ezî çê ban dekimê’. Tacîrî debê: ‘Hilîn wî sazi, çalmîşke’. Nokerî we rroye tay êvare çalmîş dekî, ban dekî, tacîrekî kwa dedîyi. Êvar ku debi nokerî heqe xwe dexwazi. Tacîr debe: ‘Axir te cawahirade min kun nekiriye, ku ez heqî te bidim?’ Noker debe: ‘Ezî kunehkar ninim, te ez şugulandime, çir te gotîye min. ew şugulekî kirîye’. Elace tacîrî debizdi ewî dirave noker dedîyi, nokerî tere.

---

<sup>184</sup> Bnr. Бакаев, Ч.Х, 1965

### 3.4.1.2. Maral, Qirrik, Çeçel

Le olkekî mêşekî pirr gir hebûye. Le wî mêşa maraleke peve qirrikeke yaşamîş debûn. Vayde peve hev pirr çe bune, tû vextan pev nedeçûne. Hemêşe qirrik le mêşe je sûbêda ta êvare le xwarine degerîya. Marale tu tirs nedezanî, de mêşêda deçerîya. Rroyeke rroyan maral be şebûyin de mêşêda delîst, le vê vexta çeçelekî ew dî. Çeçele dî, ku marale pirr koke. We je dile xweda derbaz kir, ku goştî marale bixu. Je feke çeçele av deçû. We zanî, ku eger vedû marale kevi, ewe nekeynîyî (nikay bigiri). Çeçele fikir kir, ku peve maral bibe dost. Çeçel be marale go: ‘Maralê ezîz, were em bibine dost’. Maral debê: ‘Axî ezî ten nas nakime, ez çûman bibime dostî t'e?’ Çeçel debe: ‘Çip debi, ezeke qet kesî nas nakim. Min ku tu le vî mêşa dîyî ez pirr şa bûm. Ez dewazim, ku ez hermêşe le rrev tehim, peve te bigerim’. Marala be kelege çeçele înan kir. Êvar ku bû maral çeçel peve xwe bire mal. Qirrike ku çeçel le rrev marale dî, be marale got: ‘Va kîye, peve te hatîye çi?’ Maral got: ‘Ezî huro peve vî çeçele bûme dost, bila vay ele rrev mebi, ezî dexwazim, ku tuye peve wî bibîye dost’. Qirrike got: ‘Çe dibi, ezekî peve çeçela debime dost, emma ezî be wî pirr înan nakim, vaye paşe zerere le mexe’. De paş van gepana herseyê peve hev bûne dost.

Rroyeke qirrik firiya çuye gerîyîne. Çeçel peve maral ele mal man. Çeçel be marale go: ‘Ez le nezîqîye vira şûne gennimne heşin dezanim, were ez te bibim, tu le we biçêr’. Maral be şabûyîn razî bu. Çeçel ew bire wedere. Marale dî, ku çeçele ew nexepandîye, le vira ginnimne çe heşînî heye. Maral je rroyade hemeşe dehat le we deçerî. Rroyeke xwedîye zemîye hat dî, ku zemîye wî heywanî çerîyaye. Ew zû rrevîya mal, tela xwe hilanî, hat de zemîyeda veqirt. Subetrêne maral tezedan hate çerîyayîne. Maral le we kete tele. We pirr can kir, beşer nekir, ku bifilti. Care marale dî, ku çeçeli le rrev wîye, ew ew pirr şa bû, ku çeçele wî bifiltîni. Çeçel be marala got: ‘Marala ezîz, tuyê be xwe çe dezani, ku va telayayê je rrivîye çekirine. Rroyde bazare mine son xwariye ku eze tu goştî nexûme, huroye bazare, sube tem te defiltinîm. Çeçele wer go, çû de paş kolekeda veşûrî. We le wa fikir kir: ‘Ez li vira leçavkim, xwedîyî zemîye ku hat, ewe marale bikujî, eze goştî marale bixume’. Şev dadekevi. Qirrike je çerîyne vedeçerî. Ewî de debîni, ku doste xwe maral tunune’ Qirrik defiri tere, ku marale bibîni. Ewî te zemîye, debîni, ku marale ketîye tele. Qirrike je marale pirs dekî: ‘Marala ezîz, va çi şugule hatîye sere te, le doste te çeçel kanin?’ Maralê debe: ‘Je wîda gep meke, te rrast deqot, ku je wî dost nabi’.



Qirrike debe: ‘Vexte gepkirine nini, were em fikireke bikin, ku tu je tele bifilti’. Maral razî debi. Qirrike debe: ‘Ezê herim le şunake qirag, veşurume. Te dî ku xwedî zemîye tey, tu xwe bide ser mirine. Ewe wer bizane, ku tuyî heram buyî. Ewe tele je peyî te vekî. Eze le we berk deng dime. Tu le we rrabe, berk birev’. Qirrike hawaha go, çu veşurî. Marale pir leçav kir, dî, ku xwedî zemîyede de destda degenegew ewî tey. Marale hure xwe tijî kir be ba, daye ser mirine. Xwedî zemîye hat, dî, ku maral de teleda heram buye. Ewî tele xwe je peye marale vedekî. Ve vaxta qirrike berk deng dedi. Marale zû radebi, be çap pan derevi. Xwdî zemî zû degenegew xwe hilteyni, de dû maral tavêji. Degenegew dûz teri le sere çeqe dekevi. Çeqel le we demiri. Qirrike peve maral be şabûyîn terine mala xwe.

### **3.4.1.3. Temir**

Merkek hebûye, nave xwe Rreşît bûye. Pîrr dewlet, pezê xwe hebûye. Lakkekî xwe nav Temir hebûye. Temiri le heşt salî bûye. Ewî royek be bavve xwe debe: ‘Huro eze herim berxan biçêrînim’ Bav debê: ‘Tuyî zaroyî, şugule te nine berx çêrandine’. Temirî deqîrî, debê: ‘Nabi ku nabi, gerek huro ez herime berxan çêrandine’. Bavve xweyî rrazî debi. We rroye Têmîrî terîye berx çêrandine. Le çolle kerguyekê tey tew le berxan debi, peve berxan deçeri. Êvar ku dadekevi Têmîrî berxan perez dekî, Kergûye derevi. Têmîrî wer dezani, ku va berx bû, revî. Ewî vedû kergûye dekevi. Kergûye pîrr derevi virda-weda, emma Têmîrî dest je kergûye nakişîni. Ewî kergûye tew le berxan dekî. Ewî kergûye êvare peve berxan tenyî mal, banî bavve xwe dekî, debê: ‘Bavvo vê berxê me huro ez pîrr dame revandin’. Bavvî be Têmîr nabê, ku va kergûye. Bavvî be xwe debê: ‘Va lakkî minî çiqest berk derevi, ku kergûye peve berxan anîye mal’. Bavvê xweyî fikir dekî, ku axirîyê vî zaroye bidîye wî. De paş vê fikira Reşidî çurtana juneye Têmîr vederdexi. De paş ve şugula camhate be Têmîr Têmîr nabên, Têmîr leng debên.

### **3.4.1.4. Dakka Oge**

Merikeke jina xwe beraynîye demiri, jê keçikeki xwe pîrr rind demîni. Navî wî Sone bû, navî bava wî Alo bû. Alo dîsan zevcî. Navî jina Alo teze Gulperî bû. je Gulperî keçikeki reşik bû, navî xwe danîn Şaperî. Ban herdu keçikana gir bûn (mezin bûn), kîyandine dewheşt-dewnehe salan. Lakkek navî xwe Sefo aşig debîye Sone.

Sefo êlçi deşîniye mala bave Sone. Îde deben: ‘Emî hatine, ku Sone je Sefora hilqirin’. Dak bavê Sone razî debin, ku Sone bidine Sefo. Sefoyî tedarike bûye dekî. Rûyeke îde terin, ku bûke werînin. Gulperi je ber Sonave kinceke bûke le keçîka xwe dekî, le şûnê Sone dedîye Sefo. Ku bu debiri, Sefo teye le paşperî. Ew debîni, ku eva ku paşperîye Sone nini, Şaperîye. Sefo pîrr pêşîman debe, destî Şaperîye nadi, debe: ‘Dile min Sone dexwest, je ber Soneve Dakka te te daye mer. Çir debi bila bibi, eze Sone hilgirim’. Wî were kir. Naha Sefo pewe Sone pîrr şad be rre terin.

### 3.4.1.5. Zergere be temah

Le şimale Hindistane zergerekî pîrr e dewlet hebûye. Rroyeke rroyan va zerqaraje Hindistane terîye olkekî dîn alvêre. Le wî olkeyî pîrr degeri, paşe teye şehere Malbere. Nave zergar Şabo bûye. Şaboyî le vir terîye mal pireke. Le heyate ve pîrike je der hêykeleke jinan hebûye.. Le orte îniye ve hêykela leleke be qîmet hebûye. Şabo kul ele debîni çavede xweyde alav-alav deşewitin. Ewî geşe dedîye xwe, debê: ‘Gerek ez we lele bitizim’. Şabo nedezanî, ku adem destî xwe le we hêykele texi hêykele be baskede xwe ademan degiri. Şev ku dadekevi Şeboyê, pîrike îde rradekevin. Paşe Şeboyî rradîbi, be tîzi terîye rrev hêykele, deste xwe ku dirêje vedekîye lele îniye hêykele, hêykel be baskêde xwe Şabo berk degiri, samîş dekî. Şaboyî je tirsanan berk deng dedi. Be denge Şabo pîrike je xeve be xwe dehesey, rradebe ve der deri dekevi, debe: ‘Lakkî mini, te şogoleke çe nekirîye, tu çîman we jîne bêçare tazi dekî? Eger ku tu dexwazi, ku ew te bedri, çi tişti te heye, gerek tu bidîye min, paşe ewe te berdi’. Alaca Şaboyê debizdi. Çiqas ku dirave xwe, zere xwe hebûye, ewî safkî deîye pîrike. De paş we hêykele Şabo bedre. Şaboyî be zû je heyate pîrike derevi, ew je wî şeheri werdekevi, tere. Ewî pîrr kasib debi, pars dekî. xizane xwe be xwedî dekî. Exîrê temahkeranê waha debi.

### 3.4.1.6. Negele Dizan

Cara dizekî peve hevalede xwe terîye mala merîyekî be dewlet dizîye. Xwedî malî dege peyde van dizana depîzi je xeve radîbi. Ewî hêdşkanî jîna xweyê radekî debe: ‘Ezexwe bidime ser xevê, tu wer berk min banke, ku ew diz dengî te bipîzin.’ Tu je min pîrske, bibê: ‘Meriko, te weqestane dewlet çir vedest xwe existîye? Çiqest ku ez bibêm, ku ezî nabêm, tu dêşe min neke’. Jinike nala kum erik goti, dekî.

Merikî debe: ‘Jinike, dêşe minke, ez vê swala nikam bibêm, ezî detirsim, ezî detirsim, ku ademine dîn bipîzin’ . Jinike pirr leb er merik degeri, ku ew bibe. Merikî debê: Va devletê xwe minî be dizîye vedest xwe existîye. Mine melek dezanî vexte ku ez deçûme male merîyede be dewlet dizîye, min le rrev deri wa dego: ‘Şole-şole’. Kumin wa dege, ez xwe be xwe veser xênî deketim, paş min je rrojineda xwe tavite mal. Min de malda her tişt peref dekir dego: ‘Şole-şole’, min dedî, ku ez je mal vederketim. Vexte kumin degot: ‘Şole-şole’ qet kesî ez nedetîfê. Wahayê ez be dewlet bûm’. Van geppîde merik dizan pîst. Je dizan yekî be havaleda xwe go: ‘Ezeke herim je rrojineda xwe bavêjime mal, her tişti peref kim, bibêm’ ‘Şole-şole’, vederkevime’. Van dizana xelî le çav kirin, dîn, ku xwedî mal rraketîye. Je dizan yek çû je rrojineda xwe avite mal. Wî her tişt peref kir, paşe çiqest ku ‘Şole-şole’ go, dî ku ewî de maldaye. Xwedîmal rrabû ve diza girt, pirr tê pinan, paşe be wî go: ‘Min umre xweyî rizandîye’, va dewlata peref kirîye, ku tu weri bitizi? Tay tu kîbûyîne xwe nebbê, ez te bernadim, eze te bikujim’. Diz go: ‘Ez ew ademî vêagilime, ku zimane te şîrîn ez kirime vê tela’.

#### **3.4.1.7. Meymûn-i dûlger**

Meymunekî debîni, ku dûlgerekî nale ku adem le hesp sawar debi, le ustûneke niştîye, ewî deqelêşi. Dûlger ustûn be çîvan deqelaşt. Ewî çîvan de ustûneda deheli, terîye nanxwarine. Meymûnî tey, nala dûlger le ustun sewar debi. Paşîye mêymuneyî dekevîye nava qeliştine ustûne. Ewê ceng dekî, ku çîva pêşîya xwe vederxi. Le vî vexta carê çîvî vederdekevi, paşîya mêymûneyî de qeliştine ustuneda demîni. Mêymune je xwe teri. Dûlgerî je mal tey, debîni, ku mêymunê mîrîye. Lomane ku merîyde debên: “Je mêymûne dulger nabi”

#### **3.4.1.8. Diz**

Merîkekî be dewleti hebûyi. Dizîde dekevini mala wî. Ewîde tişte wî çê peref dekin, je mal verdekevin. Merike dewletlî heft-heyşt sêvan dekîye nav desmaleke, be dû dizan dekevi. Ewî şev le rre dekeyînye dizan. Dizîde je wî pirs dekin: ‘Tu terîye ku?’ Merike dewletlî debe: ‘Ezî sevde cenete je patşerra debim’. Dizide fikir dekin ku sêvan je wî bidizin. Îde debên: ‘Merik, rrabe em rrakevin, emî rrahat bûne’.

Îde rradekevin. Dizîde be şev rradebin, sêvêde vî morike hilteynin, derevin, emma tişte ku dizîyînî demînî le vira. Xwedîye van tiştanayî tişte xwe peref dekî, debîye mala xwe.

### 3.4.2. Pêkenok

Ev cure vegotinên gelêrî di pirtûka Bekoyev de di bin navê “çîrok” de derbas dibe. Lê li gorî naveroka wan di vir de me di bin navê “pêkenok” de bicîh kir.

#### 3.4.2.1. Merike Kasib

Merikeki kasib hebûye, nave wî Tadaş bûye. Le mala Tedêş to rûzîye xwe tunnebye. Rroyeke Tadaşî debîni, ku je rojine cirane xweda tusîkîyî hiltey. Tadaşî banî jine xwe – Zîbe dekî. Ewî debe: ‘Jinike tu dezani, ku emî birçîne. Je rrojine cirane meda tuskîyî hiltey. (veder-dekevi), ewîde tişteki xwarine deberjin. Were eze je derevînda peve te pevçime, tuê be giriyaîn bireve male cirane, ezeke de dû te be rrevîyayîn werme wira. Em herduyekede le male wan qureg bixun. Vanîde were dekin. Ku, dekevinî mala cirane xwe, îde debînin, ku vana xaşîleke kirîye. Ciranîde de ferakeda xaşîle dedîna vana. Vanîde dest pe xwarine dekin. Tadaşî be Zîba debe: ‘Jinike, te care ez wa dax kirime, careê we dax kirime’. Ewî wer debê, be peçîye xwe le ser xaşîle du ciziqan dekşîni, ku rûne orte xaşîle terefê wîda bikşî. Zîba debîni, ku xeşîle teref xwe ve rrun ma, ewekê be peçîya xwe xeşîle tew leh ev dekî, debe: ‘Tadaş, dey meke, şugulî dunyayeyî hawaha tewliheve’ De paş vê şugula vanayde xaşîle dexun. Ku radebin ede herin, Tadaşî debe: ‘Jinike, min wer dezani, ku ezî pir bîcim, hema tuye je min bîc bûyi’.

#### 3.4.2.2. Mole

Le tiyakî molekî nav Nesredîn hebu. Le tiyakî molekî nav Nesredîn hebûye. Be wî Mamo mole degotibûne. Mole kereke xwe pîrr çe hebuye. Rroyeke wî ker kiribu xenî, derîye veynandibû. Je ciranede mole meriyekî tey, be mole debe: ‘Mamo mole, kere xwe bide, deni minî heye, ez no bibim êş’. Moleyî debe: ‘Min kere xweye

berdaye çolle, le bira tunini (nine)’. Le lê vexta, cere kerê de towleda dezûrey. Cirane Xweyî debê: ‘Mamo mole, le ew çike, ku de tewleda dezûrey?, te go, kû ker tunine?’ Mole be wî debe: ‘ Tu merîyekî çeçest bêagiliyî, ku tuyî be min moleyî înan nakî, be kere înan deki’.

### 3.4.3. Gotinên pêşiyên

Gotinên pêşiya jî yek cure jî edebiyata gelerî ye. Hinek mînakên ku div ê xebatê de hatine berhevkerin ev in:

Ce bifikir, paşê gepke (J.d.r.5).

Hatin ji mêvan rêkirin ji mêvandar (j.d.r. 1).

Kesên ji mêvana hez bike sifra wan vala namîne (j.d.r. 1).

Mala bê mêvan weke aşê bê ave (j.d.r. 9).

Mêrîyî têr je birçiyên xeberî xwe nabi (J.d.r.9).

Mêvan bihara malê ye (j.d.r. 9).

Pirxwarina meri le hindik xwarine deheli. (J.d.6)

Rizqê mêvan berî mêvan tê. (j.d.r. 9).

Yek yeke, du du komeke (J.d.r.1).

Zikî têr xeberî xwe tunni je zikî birçî (J.d.r.2).

### 3.4.4. Bayati <sup>185</sup>

Her wisa di qadê hinek mînakên durikan jî hatine berhevkerin. Li nav kurdên Azerbaycanê de ji vê cureyê re dibêjin “bayati”. Lê di kurmanciya jorîn de “dûrik” jî tê gotin. Li vir wek ku di qadê de tê binavkerin peyva “bayati” hatiye bikaranîn.

Elê me malmîrate,

---

<sup>185</sup> Gülgez nene, Bayatılar, Şirvanşir. 2001 (Amadekar, Şamîl Esgerov). Tenê ya dawî ne ya Esgerov e, jêderka wê cuda ye.

Li dil agirşewate,  
Tûne war û malê wî,  
Ez bibê m hemwelate

\*\*\*

Kurdistan çî, warê min,  
Buy eli dil arê min.  
Ez ji war dûr ketime,  
Pir girane barê min.

\*\*\*

Ciranê me har bûne,  
Bona kurdan mar bûne,  
Em revîne, dijminan  
Li çiyên me war bûne.

\*\*\*

Qeçene me zerîye,  
Her yêk mîna perîye,  
Niha çac bi hestirin,  
Elê wan sed kerîye.

\*\*\*

Mebên li me kar maye,  
Li dilê me ar maye.  
Bona kurdan çend salin,  
Tenê ah û zar maye

\*\*\*

Em nizanin bîr çîye,  
Rohan çîye, tîr çîye,  
Zikê mîran ter nabe,  
Çavanê wan birçîye

\*\*\*

Keçî, keçî wer meke,  
Dile min şan-şan meke,  
Tuye mine, ez teye,  
Ozge xiyal a meke. (J.d.r.2)

### 3.4.5. Xapînok<sup>186</sup>

Le meşede darereş,  
Bivir bibe, bi qelêş  
Çitraz, beno, yeke qebot\*,  
Je tibilge\*\*yê mele bike  
Hem beber bû, hem dirêj (J.d.r.2.).

## 3.5. ŞANOYÊ GEL (ETNO-TEATÎR)

Yek jî beşa folklorê ya kevin şanoya gel, nişana ramanên arkaîk û nijadî ya serdemên berê ye.<sup>187</sup> Lîstikên gelêrî ji bo hînbûna folklorê gelan agahiyan dide û lîstik nişana bilêvkirina çanda gelan e. Temenê wê jî bi qasê temenê wî gelî ye. Ev lîstik li gor demê û cih têne guhertin. Lê kevneşopîya gel di nava xwe de dihevwîne.

Alavên lîstikên şanoyî dîmenek ji ramana gel e ku prensîbên estetîk ên şaristaniya folklorê bi riyên cuda yên menzûm û forman didin xuyakirin. Loma hînbûna şanoya gelêrî (etno-teatir) a kurdan ji bo hînbûna folklorê kurdan ciheke girîng digire. Şano her çiqasî wek hêmaneke rojavayî were dîtin û di nav şaristaniyên Yewnana Kevnar û hin şaristaniyên Ewropî de xuya bike jî, li rojhilat jî şano xwedî dîrokeke kevin e. Wek mînak ayînên sumerî, şanoya kukla ya welatên wek çin û

---

<sup>186</sup> Jî vê cureyê bi azerî “yaniltmaç” dibêjin. Ev mînak min jî bavê xwe bi kurdî bi vî awayî girt. Wî jî nizanîbû bê bi kurdî çî navî li vê cureyê dikan. Loma me jî wek “xapînok” wergerand (N.E).

\* Navên dara

\*\* Devî

<sup>187</sup> Talıbzadê, Aydın, Şerq teatır tarixi, Bakı 2008

derdora wê dikarin werin dayin.<sup>188</sup> Her weha di nav kurdên Qafqasyayê de jî mînakê şanoya gelêrî tèn dîtin.<sup>189</sup>

Bingeha Etno-teatirê girêdayî kirin, şahî, dawet adet û toreyên gel e. Di heman demê de ramanên wan kesan ve jî giredayiye. Her gelî çewa ku bawerî û nêrînên xwe yên olî parastibin wisa jî ev şano parastine û anîne roja me ya îroyîn. Di nava folklorê kurdên Azerbaycanê de jî şano cihê xwe girtiye û pir caran di dawet û cejnan de mînakên ji vê şanoyê tèn lîstîn. Ji van şanoyan, şanoya “Di navbera Xalîçe de”, şanoya “Xezal” û “keftar” mînakên herî berbelav in.

Ev şanoyên qala wan tene kirin di gelek çavkaniyên ku di derheqê dîroka folklorê azarbeycanê hatine nivîsîn de weke hêmanên bingeha şanoya azarbeycanê hatine nasandin.<sup>190</sup> Di qada navnetewî de jî ev şano wek “nimûneyên folklorê Azerbaycan” tèn pêşkêşkirin. Wek mînak şanoya “Xezal” di sala 1986an de weke numuneya folklorê azarbeycanê li Fransayê hatiye pêşkêşkirin lê lîstikvan kurd bûn (J.d.r.-**foto.8**).

Şanoyên ku li bajarê Kalbajarê tèn lîstin şanoya *xezal* û şanoya *Di navbera xalîçeyê* de ne ku di heman demê weke nimûneyên bingehîn ên şanoya kuklayê jî tèn pejirandin. Akademîsyen M. Arîf destnîşan dike ku şanoya kovî û *navbera xalîçe* di bajarê Kalbajarê gundê Axcakentê de tèn lîstin bi xwerû şanoya kuklayê Azarbeycanê ye.<sup>191</sup> Ev şano ji bo şahî û kêfê tèn lîstin. Profesore Î. Rehîmlî jî dinivîse ku lîstikên mîna Navbera Xalîçeyê wisa kiriye ku şanoya nûjen a kuklayê were asta îroyîn. Şanoya kuklayê jî lîstikên mîna “Şah Selîm”, “Çavreş” “Lîstika Kovî”, “Keftar” “Pehlewanê Keçel” û h.w.d pêk tèn. Ev şanoyên din ên ku nivîskar qala wan dike jî di eslê xwe de ji folklorê kurdên Azerbaycanê ne.<sup>192</sup>

Kurdên Azerbaycanê pir girîngiyê didin şanoyên gelêrî û di cejnan, şahiyên, dawetan û gelek civatên xwe de bi berfirehî cih dane van şanoyan. Di sala 1938an de

---

<sup>188</sup> h.p

<sup>189</sup> Ji bo vê mijarê bnr. Şîrînov, Nofel, Etno teatir di nava folklorê Kurdên Azerbaycanê de, <http://www.kurdistan-post.eu/ku/etno-teatir-di-nava-folklorê-kurdên-azerbaycanê-de-nofel-sirinov>; 10.04.2016,

<sup>190</sup> Rêhimli Î. ‘Azərbaycan teatr tarixi’, Bakı, Çarşoğlu, r, 62,63. 2005.

<sup>191</sup> Arif, M. ‘Azərbaycan xalq teatri.’ Ədəbiyyat məcmüəsi, Bakı, 1946. r, 8

<sup>192</sup> -Аристова Г. Ф. 1966.

- Əsgərov, Şamil, Dağların hikməti, Bakı 1987



di belgesela bi navê “Vi Kurdistanê/Li Kurdistanê”<sup>193</sup> ku qala Kurdistanê Qafqasyayê dike de jî ev her du şano cih girtine, her wisa F.Arîstovayê jî di berhema xwe de destnîşan kiriye ku ev şano yên ku qala wan têne kiran mînakên şanoyên kurdan in.<sup>194</sup> Kurdologê Azarbeycanê Şamîlê Selîm di sala 1980an de ji bo ku folklorê kurdan a gelêrî were parastin li bajarê Azarbeycanê Kalbajarê mûzeyeke pir mezin ava dike. Di hola şeşan a vê muzeyê de bi tevahî li ser modelan şanoyên gelêrî têne pêşkeşkirin. Lê ev muzeya dîrokî ya kevin di sala 1993an de piştî bajarê Kalbajarê dikeve bin kontrola dewleta Ermenîstanê de, hatiye rûxandin. Vê yeke jî rewşa folklorê kurdan a hatibû jibîrkirin xirabtir kir.<sup>195</sup>

Dê li jêr bi riya çend mînakên vê folklorê qala etno-teatira di nava kurdên Azerbaycanê de heye were kiran.

### 3.5.1. Şanoya di Navbera Xalîçe de

“Ev lîstik di dewaten de li hemberî zavê û bûkê dihat pêşkeşkirin û dixwest fikra hezkirinê bide ciwanên din ên ber zewacê ne”(j.d.r.2) Hin kesên navdar ên ku di sadsala 20an de ev lîstik pêşkeşkirî ev in: Memedali Milî (ji eşîra milî), Mehralî, Suleyman, Cemîl in. Lê niha tenê yek kes vê lîstikê pêşkeş dike. Ew jî ji bajarê Kalbajarê Silêmanê Mehralîoglu ye ku 70 salî ye.\*

Şano bi yek kesî û ligel dengê zirnê an jî tenbûrê tê pêşkeşkirin. Derdora wî tê girtin û dest û lingekî pêşkeşvan bi kuklaya jinekî û du mêran tê girêdan (**Foto.9**). Nîşandina yekem de Xecê (kuklaya jin) bi destgirtiyê xwe re tê cem hev û bi tevgeran (bêdeng) hezkirina xwe ya li ser hev nîşan didin. Piştî demekê destgirtiyê Xecê ji bo karekî wir diçe. Piştê kesê din (kuklayê duyem) dixwaze bi zorê Xecê xwe re bibe. Destgirtiyê Xecê tê û kuklayê kesê ku dixwaze Xecê birevîne bi xencera xwe dikuje. Xecê direvîne û diçe. Şano bi dawî dibe.

<sup>193</sup> Kürdüstanda, Bakı Küno studiyasının buraxılışı, № 7, 1938, <https://www.youtube.com/watch?v=8bG2ABDTaoU>, 12.06.2016

<sup>194</sup> Аристова Г. Ф. 1966.

<sup>195</sup> Əsgərov, Şamil “Şahid Muzey Şəhid Muzey” Bakı, 1997

\* bnr; Foto.8

### 3.5.2. Şanoya Xezal

Şanoyeke din jî şanoya xezal an jî şanoya kovî ye. Şanoya Xezal bi vî awayî tê lîstin. Lîstikvan kincekî sor ê bi kovî xwe dike. Di bin dengê mûzîka Urfanî\* ya nerm û hêdî de hin tevgerên cuda tê kirin (**Foto.10**). Di nava van tevgeran de têkoşîna giyaneweyan ya ji bo domandina jiyana xwe wek peyamên sereke tê dayîn. Ji hêla derwêşan jî çîroka vê lîstikê tê vegotin. Şivanekî ciwan evîndarê keça axayê gund dibe. Ew ciwan bi salan ji hev hez dikin. Rojeke ji rojan şivan ji xwere çilîkeke xezalê digre. Ji bo ku xwedî bike xezal dide destgirtiya xwe. Destgirtiya wî çêlikek heft birayan e. Rojên xwe bi vê xezalê re derbas dike. Raksê hînê vê xezalê dike. Di dawetan de di destpêka cejna newrozê de xezal derdikeve û direqise. Sal derbas dibin. Hem xezal mezin dibe hem jî ciwan digîhîjin temenê zewacê. Lê axa keca xwe nade şivên. Dûjînan lê dike û dibêje tu şivane belangaz, pepûk û feqîr î. Keça xwe bi axayê gundekî din re nîşan dike. Rojek ji rojan dawet dest pê dike. Keç li mehîne siwar dibe û ber bi gundê axê ve tê rêkirin. Ji bo Xecê gundê axê beriya şeva gerdekê bi rengê sor hewreşîm tê amadekirin. Dawet dest pê dike. Dema dibe şev diyar dibe ku Xecê miriye. Xecê bi hesrata şivan dimire. Ev agahî li belavî hemî herêmê dibe. Ji sehera sibê dema ku şivan vê yekê hayîdar dibe ew jî jiyana xwe dest dide. Dema mirana êşbar ya van ciwanan ji hêla rûspiyên herêmê ve tê bihîstin ew dixwazin kecik û şivan ba hev werin veşartin. Mirov wan ciwanan bi rondikên xwe vedişêrin. Ji bo mirina wan şîne dikin. Rojek piştî mirina wan dema gundî cardin tîni li ser tirba wan dibînin ku ew xezala roja dawetê wînda bûbû jî di nava tîrbên wan de miriye. Ev agahî jî dever bi dever belav dibe. Hevalên şivên ji bo ev evîn herdem jîndar bimîne ji hewreşîmê xezalê yê sor kincekî mîna xezalê didûrin. “Di dawetan de ciwanek vî kincî xwe dike û di bin mûzîka nerm û hêdî ya urfanî de di dawet, newroz û cejnan de direqise” (j.d.r.10).

---

\* Muzîkekî gelerî yê

### 3.5.3. Şanoya Keftar

Ev mînakên şanoya gel ên ku li jor qala wan hatin kirin bêhtir li ser teswîra jiyana ehlaqî bû. Lê ev şanoya ku li jêr dê qala were kirin ji gelek aliyan ve ji wan cuda ye. Derbarê vê şanoya gel de cara yekem kurdolog T. F. Arîstova di berhema xwe ya etnografîk “Kurdên Pêşqafqasyayê” de agahî dane.<sup>196</sup> Nivîskar taybet qala salên 1940î dike û diyar dike ku di wê serdemê de di nava kurdan de mînakên şanoya gel pir dihate dîtin. T.M. Arîstova diyar dike ku ev lîstika şanoya gel di nava kurdan de heye lê bes derbarê herêma tomarkirina vê şanoyê de agahiyan nade. Kurdolog Şamîl Askerov di pîrtûka xwe ya bi navê “*Daxlarin Hîkmeti/Hikmeta Çiyan*” de destnîşan dike ku ev mînaka şanoya gel li Azerbaycanê bajarê Kalbajarê li gundê Orûclû û Agcakendê de cara yekem hatiye tomarkirin. Û pişt re jî navên hin kesên ku vê lîstikê dileyzin tomar dike û van agahiyan dide. “Lîstika Keftar” taybet li Kalbajarê gundên Orûclû û Axcakendê dihat lîstin. Di cejnên de di bin dengê mûzîkeke rîtim giran de dihate lîstin. Di gunde Orûclû ev lîstik bêhtir ji hêla Bekîr û Cabbar ve dihate lîstin.<sup>197</sup> Di vê şanoyê de ew bûyera ku tê teswîr kirin şerê Keftarekî û egîdekiye. Di vê lîstikê de peyama tê dayîn ku ji bo leheng li dijî keftar serbikeve divê di serî de aqlê xwe bide xebitandin.

Beriya şanoyê ev amadehî dihatine kirin. Mirovekî dixin şûna keftarekî. Depêkî erzînga wî ve girêdidan û yekî jî jor ve. Çi dema ku keftar devê xwe vedikir û digirt hingê dep hevdikeytin û deng ji wan dihat. Cil jî wî dikirin. Devê wî mîna devê ejderekî çedikirin. Dikete şeklek wîsa ku dema zarok û jin çav bi wî diketin pir ditirsîyan.

Ev şano ji du beşan pêk dihat. Di beşa yekem de dema egîd li hemberî keftar şer dike serkeftinê bi dest naxe. Pişt re dest bi hîlê dike. Di beşa duyem de ji bo ku egîd gel ji wî keftarî rizgar bike dest bi hîleyekî wîsa dike. Kefenekî li xwe dike û li ser riya keftare xwe dirêj dike. Keftare ku derdikeve li ser dikê bi dîtina zîlamê li ser riya xwe kêfxweş dibe û direqise û vê kêfxweşiya xwe nîşan dide. Pişt re bi aramî nêzî wî dibe û wî ber bi dîwarê dikê ve dibe (Di ramana mîstîk ya gel de baweriyek heye ku keftar bi serê xwe zîlam dikûje û pişt re goştî wî dixwe). Keftar tê, egîd bi bejnê ve wî dîwer ve dadleqîne, keftar xwe paş ve dikişîne. Devê xwe hev dixwe tê da

<sup>196</sup> Аристова Г. Ф. 1966., r, 187

<sup>197</sup> Esger, Şamîl, “Daxlarin Hikmeti”, Baki, 1987, r. 30

ku serê xwe zilam bixe û bikuje. Dema dixwaze bi serê xwe egîd bikuje hingê egîd li ser aliyekî diqulûpe. Serê keftar li dîwêr dikeve. Keftar carekî diçe û te. Lîstik heya keftar dimire dom dike. Dema ev lîstik tê pêşkeşkirin lîstikvan tevgerên cuda dikin û bala temaşevanan dikişînin li ser xwe. Keftar dawîya dawî serê xwe dîwêr dixê û dimire. Pişt re egîd piyê xwe datîne li ser keftarê mirî û bi çepikên temaşevanan lîstik diqede.

Ev lîstika ku bi awayekî kurt hate teswîr kirin di esle xwe de dibe ku ji ramanekê mîtolojîk hatibe. Ev lîstika ku ji teswîrên mîtolojîk ên kevin xwedî dîrokeke dirêj e. Di Yewnana Kevnar û Mezopotamyayê de mîtosên vî rengî tene dîtin.<sup>198</sup> Wek mînak di mîtolojiya Yewnanan de di lehengiyên Heraklîs de çelengiya Heraklîs û şerê wî yê li hemberî “Şêrê Nêmêy” bi vî lîstikê re pir dişibin hevdu. Di dîrokê de û di mîtolojiya Yewnanan de efsaneyekî bi vî rengî heye.<sup>199</sup> Lê di nava kurdên Azerbaycanê de bi awayekî şanoyî dîtina vî lîstikê çiyê matmayînê ye. Lê zanyarê mîtolojiyê A. F. Losêv derbarê vî yekê de wisa dibêje:

“Di ramana mîtolojiyê de nîşan û heyberên subjektîf û objektîf û diyardeyên wê di nava demekê û warekî de girtî namîne, di her derê hevgirtin û hevşibandinek tê dîtin”<sup>200</sup>.

Ev hevgirtinek bê guman li vir jî derdikeve holê. Ji ber ku şaristaniya Mezopotamyayê bandoreke mezin li ser şaristaniya Yewnanê çekiri û kurdên Azerbaycanê parçeyek ji vî şaristaniyê ye. Loma dibe ku tîkiliya her du lîstikan bi hev re hebe. Di heman demê de di mîtolojî û berhemên hunerî yên Asûriyan de jî tîkoşîneke bi vî rengî di navbera hin giyaneweyan de tê dîtin.<sup>201</sup> Dîtina tiştên wisa nîşan dide ku tîkiliyên kurdên Azerbaycanê bi kurdên herêmên din re hene, ji ber ku heman hêmanên folklorê li wan herêmên kurdan ên din jî tînen dîtin.

Ji van agahiyan tê dîtin ku “Şanoya Gel” di nava kurdên Azerbaycanê mînakeke baş ji bo folklorê gelêrî nîşan dide.

<sup>198</sup> Мифы народов мира, Главный редактор С. А. ТОКАРЕВ, Москва, 2008

<sup>199</sup> Antik ədəbiyyat antologiyası, cild I, amadekar, Ə. Sultanlı, werger M. M. Rzaquluzadə Avrasiya Press, Bakı 2006

<sup>200</sup> Losêv, A.F Mîfoloqîya- Filofofskaya ênsiklopedîya, Moskva, 1964. r, 458

<sup>201</sup> Jeremy Black; Anthony Green. Mezopotomya Mîtolojisi Sozlüğü: Tanrılar, İfritler, Semboller, Aram, 2003. r, 23-100

### 3.5.4. Mînaka Pêşkeşkirina Şanoyekê di Çarşema Axê de

Gelek karakterên newrozê jî hene ku bêy wan newroz nabe. Kose, Keçel û Bizin ji wan karakteran in. Ev karakter di cewhera xwe de pakî û nepakiyê simbolîze dikin.<sup>202</sup> Kesên em bi wan re axivîn jî diyar bû ku ev karakter bi demê re ji cewhera xwe dûr ketine û ketine formeke nûjen. Bi demê re cil û bergên ku karakter xwe dikin guherîne û li gorî demê li ser şanoyê hin tiştên din jî hatine zêdekirin. Di nava gelên din de jî ev karakter tene dîtin. Her çend di nava kurdan bêhtir were dîtin jî dîsa jî ev yek nayê wê wateyê ku gelên din ev karakter ji kurdan standine.

Lîstokên ku di cejna çarşema Axê de tê lîstin ji wan a herî navdar lîstoka Kose ye. Em dikarin bi çend hevokan vê lîstokê wisa ravebikin.

#### 3.5.4.1. Şanoya Kose

Kesên vê lîstokê dileyzin ji bo neyên naskirin kincên cuda li xwe dikin. Kose rûyê bi rejî boyax dike. Ji mûyên dûvê hespan rûhekî ji xwe re çêdike. Ji çermê mihan kincekî taybet li xwe dike. Tûrikeke vala diavêje li ser milên xwe. Di nava taxan û malan de digere. Alîkarê wî yê ku postê bizinan li xwe kirî jî bi wî re digere. Gotinên cuda cuda ên xweş dibêje û ji xwediyên malan para cejnê dixwaze. Bizin jî di standina para cejnê de alîkariya wî dike. Di dawiya vê lîstoka ku di nava her taxê û li ber her malekê tê lîstin de bizin qilonçê xwe di Kose re ra dike û wî dikuje. Piştî demeke kin di ser re derbas dibe careke din Kose zindî dibe. Piştî van agahiyan mirov dikare bibêje ku têkiliyek di navbera vê pîrozbahiyê û pîrozbahiyên kevnare de hebin. Di baweriyên kevnare de jî ev yek tê wateya jiyana piştî mirinê ku mirov careke din zindî dibin.<sup>203</sup> Ev lîstok di heman demê de dişibe mîtolojiya Sûmeriyana a Dumuzîn.<sup>204</sup> Ji ber ku di vê bûyerê de jî dumuzîn di demsala payîzê de dimire û di demsala biharê de careke din zindî dibe. Ji bilî vê jî di mîtolojiyê de Dumuzîn di karakterê şivanekî de ye. Li vir jî Kose tê li hemberî şîvên û bizina alîkar jî tê li

<sup>202</sup> İlham Rehimli, 2005, r.19-20,444

<sup>203</sup> Rızayev, Nesir, Əcdadların izi ilə, Bakı-1992

<sup>204</sup> -Fantalov, A. Şumeriskie mifi o podzemnom tsarstve. <http://mythology.webhost.ru>. 23.04.2016; -Hüseynov, İlqar; Nigar Əfəndiyeva, Qədim dünya mədəniyyəti. Bakı 2009. r 66,122, 132

hemberî pezê wî. Divê were gotin sembola dumuzîn di gelek mîtolojiyan de dihat li hemberî bizineki. Di mîtolojiya Yewnanan de jî ev yek tê xuya. Di mîtolojiya wan de jî sembola Dîyonîs jî bizin e.<sup>205</sup> Ev yek girêdana di navbera dumuzîn û dîyonîs jî de heye jî bi me dide xuyakirin. Loma em dikarin bêjin ku bingeha vê lîstokê digihîje hezar salî. Lî gor hin zanyarên cîhanê baweriya dîyonîs (kose-bizin) ji mezopotamyayê ber bi Fînîkyayê û ji wir jî ber bi Yewnanîstanê dîsa ji mezopotamyayê ber bi Anatolyayê û Qafqasyayê ve belavbûye.<sup>206</sup>

### 3.6. LÎSTOKÊN GELÊRÎ

Mirov ji bo ku demên xwe yên vala baş derbas bike lîstokan dileyzin. V. D. Ponamaryov deme qala lîstoka dike, diyar dike ku “lîstok di nava mirovan de têkiliyên çandî ava dike û potansiyele kesayetî, civakî û medenî derdixîne pêş”.<sup>207</sup> Di nava folklorê de lîstok weke lîstokên mezinan û weke lîstokên zarokan dibin du beş. Li vir dê ji bo lîstokên mezinan lîstoka *heft hûner* û ji bo lîstokên zarokan jî lîstokên *dara darê* û *golî golî* werin rave kirin.

Lîstok bi vî awayî di nava folklorê Kurdên Azerbaycanê de ciheke berfireh digre. Her çend kurdên vê herêmê belavî gelek deveran bûbin jî lîstokên jiyana xwe ji bîr nekirine. Her çend hinek wan ji holê rabûbin jî di nava çavkaniyan nivîskî de be jî hatine parastin. Di nava van lîstokan de *heft huner*, *dara çilik*, *dara darê*, *heval kî te bir*, *kimik revandin*, *lêdana li xelekê*, *avêtina çalê*, *golî golî* herî ber bi çav in.

<sup>205</sup> Крамер, С. Н. История начинается в Шумере, 2. Наука, Москва, 1991

<sup>206</sup> İnanna, Alov, Keçêlîn Toyunun Mûqêdêslîyî, www.meydan.tv, 19.03.2014

<sup>207</sup> Понамарев, В.Д., Формирование культуры игры в праздничных отдыха (Канд.диссертация), Санкт-Петербург.г.16

### 3.6.1. Lîstokên Mezinan

**Heft Huner:** Derbarê vê lîstoka pir kevin de yekem agahî ji hêla kurdolog Şamîl Askerov ve tê dayîn.<sup>208</sup> Ev lîstoka ku ji lîstokên folklorê kurdî ye li gundê Axçakendê ya giredayî Kalbajarê hatiya tomarkirin. Li gor agahiyan ev lîstok di cejna newrozê û çarşema dawî de dihate lîstin. Ev lîstok ji bilî lîstokên din bi beşdariya pir kesan dihate lîstin. Gelek mirov tevî temaşekirina lîstokê jî dibûn. Loma ev lîstok weke şahiyekî dihate dîtin.

Lîstok ji hêla kalemêr û kalejinekî ve dihate birêvebirin. Beyî ku lîstok were lîstin kes û alavên ku di lîstokên de cih bigirin dihatin diyarkirin. Divê heft şivan, heft perî (keç), heft siwarî, heft pehlewana, heft kesên bezê, heft nêçirvan û heft bûk di lîstokê de cih bigirtana. Amadehiyên lîstokê çend roj berê dihate kirin û xelatên ji bo kesên serbikeve jî dihatin diyarkirin. Kesên tevî lîstokên dibûn û erkên wan ev bûn:

**Heft Şivan:** Di serî de heft şivanê ku di destê wan de heft kopal heyî derdikevin qada lîstokê. Şivanek derdikeve pêş û kopalê di destê xwe de bilind dike. Şeş şivanên din jî ji bo kopalê li destê wî de bikeve xwar yek bi yek bi hemî hêza xwe li wî kopalê dixin. Eger kopal di dest de biketina xwar dor dihat yekî din. Kopalê di destê kîjanî de piştî darbeyên şeş kesê din neketina li xwarê ew kes di vê beşa lîstokê de serkeftî dibû. Piştî şeş şivanê serkeftî ji hêla rêvebirên lîstokê ve dihate xelat kirin. Gelek caran weke perû kulav, pêlav an jî gore dihate dayîn. Ev beşa lîstokê dawî dibe û kalemêr û kalejina ku lîstokê bi rê ve dibin. Ji bo şivanan stranên dixwînin \*

*Çoban hey!*

*Qoy dillênsin qarğî ney.*

*Yarın baxır qıyqacı,*

*Möhkəm saxla ağacı.*

*Ağac əlindən çıxmasın,*

*Yarın məlul baxmasın.*

**Wergera wê:**

<sup>208</sup> Əsgərov, Şamil, Dağların hikməti, Bakı 1987, r.73

\*Askerov ji ber ku berhema xwe bi zimanê azerî nivîsandiyê ev stran jî bi azerî dane. Li vir dê wergera wan bê dayîn

Şivano loo  
Bihêle bila bilûra te deng bide  
Yara te, li te dimeyzê ne  
Baş biparêze wî kopalî  
Bila kopalê te di destê te nekeve  
Bila yara te bi xemgînî te meyze neke.

**Heft Perî:** Piştî ku şivan diçin heft perî tèn qada lîstokê. Pê heft sîxan û heft rengan dest bi çêkirina goreyan dikin. Kalejin ji bo hêze bide periyan stranan dibêje.

*Deyiklin baxır sənə,  
Qız, zirək tərşənsənə.  
Dilində nəğmə oxu,  
Əlində corab toxu.*

**Wergera wê:**

Destgirtiya te te dimeyzêne  
Keç zû bike  
Straneke bêje  
Gora xwe jî zû çêke

Piştî dema wan dawî dibe perî dev ji çêkirina goreyan berdidin. Kalejin li goreyan dimeyzênin. Kîjan keçikê gora xwe herî bedew û spehî çêkiribe kalejin diyariya dide wê. Carna diyarî digihije çend keçan jî.

**Heft Siwarî:** Piştî ku keç ji qadê vedikêşin heft siwarî têne qada lîstokê. Kalemêr ji bo wan dest bi gotina stranan dike:

*Çapar hey!  
Heç kimdən etmə giley.  
Köhlənə qamçı çalma,  
Yoldaşdan geri qalma.  
Erkəyi yerdən götür,  
Yar görsün atın ötür.*

**Wergera wê:**

Siwar hey  
Ti kesî neke gazî  
Şelaqa li hespê xwe nexe



Ji hevalan paş nemîne  
Beran ji erdê hilîne  
Bila yar bibîne.

Piştî ku stran bi dawî dibe ji bo dîlanê zirneya reş lê dixê. Siwari hespên xwe dibezînin û ji bo yek ji wan heft beranên ku li ser riya wan hatine dayîn li ser piştê hespê rakin tédikoşin. Ji wan heft siwariya kîjan zûtirîn beranekî rake û bigihîje qada lîstokê ew di lîstokê de serdikeve û perûyên xwe distîne.

**Heft Pehlewan:** Ji bo vê beşê gomek\* hatiye amadekirin. Di nava vê gomê de heft ga û heft gamêş hatine bicihkirin. Heft ciwanên ku bi xwe bawerî weke pehlewanaan dikevin hundirê wê gomê. Divê her yek ji wan herî kêr heft ga an jî gamêşî erdê bixê. Kalemêrê ku lîstokê bi rê ve dibe ji bo pehlewanaan wêrek bike dest bi gotina stiran dixe:

*Îgid hey!*

*Boyun qatla peydêrpey.*

*Gözlêr sêni gözlêyir,*

*Yarın sêni izlêyir.*

**Wergera wê:**

Egîdooo

Pê de pê de sitûyan bitewîne

Çavên bedewa li te ye

Evîna te li te dinêre

Piştî stran bi dawî dibe pehlewan yek yek dikevin hundirê gomê. Ji bo sitûyê dewaran bitewînin tédikoşin. Kîjan ji wan ser bikeve perûyên xwe werdigre.

**Heft Kesên Bezê:** Heft kesên ji bo bezê tên qada lîstikê. Li deverêke dûrî wan heft komikên kayê tê bicihkirin. Gelek asteng li ber riya wan têne dayîn. Divê ev bezvan xwe bigihînin van komên kayê û an wan bişewitînin an jî wan komên kayê belav bikin. Kalemêrê dîsa ji bo bezvanan\* stran dibêje:

*Qaçar hey!*

---

\* gom-axur

\* bervanan

*Îgid qanad açar hey.  
Yüyür bir-bir bəndi aş,  
Yolda bürə, nə də çaş.  
Dağıt, od vur topaya,  
El çağırsa yet haya.*

**Wergera wê:**

Hey kesê revê  
Egîd baskê xwe vedike hey  
Bireve û yek bi yek astengan derbas bike  
Ne bitehîse ne jî rê derkeve  
Belav bike, agir berde koman  
Mirov bang bike xwe bigihîne wan

Bi nîşana kalemêr bezvan direvin. Astengên ber xwe derbas dikin. Di dawiyê de kîjan bezwan zûtirîn karê xwe bianîna cih ew dihate perû kirin.

